

Paulo Coelho

SÎMYAGER



Werger: Zeynel Abidin

VRA / roman

Institut kurde de Paris

Paulo Coelho * Simyager

Institut kurde de Paris

in
Navê eslî: O Alquimista
Sîmyager-Paulo Coelho
Çapa Duyemîn - Îlon/2003 - Berlin

©Mafê parastinê yê Nivîskar û Werger e.
Werger
Zeynel Abidîn Han

Eora Verlag

ISBN: 3-937716-03-3

Institut kurde de Paris

Paulo Coelho

SÎMYAGER

ROMAN

Kurdiya wê:
Zeynel Abidin

INSTITUT KURDE DE PARIS

Bibliothèque

Reçu le 12/12/2018.

EVRA

Ji bo Sîmyager J.

yê ku razên Kevirê Felsefê dizane û wî bi kar tîne...

Institut kurde de Paris

Gava ku di rêya xwe de diçûn, Îsa ket nava gundekî. Jineke bi navê Marta ew hilda mala xwe.

Yek ji xwengeke wê ya bi navê Meryem hebû, ew jî li ber binê lingên Rabbî rûdinişt û guhdida peyvên wî.

Lê Marta, ji ber pîrbûna kar û barên xwe xweşaş kiribû; çû cem Îsayî û got:

- Ya Rab, ma qey ne tiştek e, xwenga min di xizmetê de min bi tenê dihêle? Ka jê re bêje bila alîkariya min bike.

Lê Rabbî bersiv da wê û got:

- Marta Marta, tu ji bo gelek tiştan li berxwe dikevi û telaş dikî; lê pêdiviya tiştekî heye û Meryemê ew para ku wê ti car jê neyê standin, hîlbijardiye.

ÎNCÎL, LÛKA, X, 38-42

Institut kurde de Paris

Peyvopêş

SÎMYAGER, PIRTÛKA KU KARWANIYEKÎ EW ANÎ-bû, girt destê xwe. Bergê pirtûkê tunebû, lê dîsa jî wî fêmkir ku nivîskarê pirtûkê kî ye: Nivîskar, Oscar Wilde bû. Gava rûpêlên pirtûkê werdigerand, rastê çirokekê, behsa Narkîssosê dike, hat.

Sîmyagerî efsana Narkîssosê ya vî xortê bedew, ku ew ji bo temaşekirina bedewbûna xwe her roj diçû perava golekê, dizanibû. Ev xort ew qasî evîndarê şiklê xwe bûye ku, rojek bê hemdê xwe ketiye golê û tê de xweniqiye. Li cihê ew ketiye, çiçekek vekiriye; navê vê çiçegê jî nêrgîz hatiye dayîn.

Lê Oscar Wildeyî, çiroka ku wî bi xwe nivîsiye, bi vî awayî xilas nedikir.

Oscar Wildeyî wisa dinivîst; Xwedajinên Oreas ên daristanan hatîne ber perava gola bi ava şîrîn û dîtine, ku ew bûye kewanozeke hêsrên bi êş.

- Bo çi digrî? gotine û pirsîne Oreas`an.

- Ji bo Narkîssosê digrîm, golê gotiye.

Li ser vê yekê;

- Ma çi heye mirov di vê de şaş bimîne, gotine Xwedajinên daristanê. Em di van daristanan de beyhûde li peyî wî digeriyan û disekinîn, lê bes te karîbû ji nêzik ve bedewbûna wî bibînî.

- Narkîssos xortekî xweşik bû? golê gotiye û ji wan pirsîyar kiriye.

Oreas`an heyirîne:

- Ma kî dikare vê yekê ji te baştir bizanibe? gotine û lê vegerandine. Ew her roj dihat û li peravên te dinihêrî?

Gol, lezekê bê deng maye. Piştî wisa qisekiriye:

- Ji bo Narkîssosî digrîm, min qet bedewbûna wî ji seh nekiribû. Ji bo Narkîssosî digrîm, ji ber ku gava ew li ser avên min xwar dibû, min di kûranîhên çavên wî de şewqa bedewbûna xwe didît.

- Eve çîrokeke pir xweş, Sîmyagerî got.

*

Institut kurde de Paris

Beşa Yekemîn

NAVÊ XORTÎ SANTIAGO BÛ. GAVA KU BI PEZÊN xwe hat ber dêra kevn û terikandî, roj hema hema diçû ava. Baniya dêrê ji mêj de rûxiyabû û li wî cihî, ku di dema xwe de eşyayên ayînê hatibûn danîn, dareke firawinhêcîra terikî bilind bûbû.

Xortî biryar da, li vê derê şeva xwe bike. Hemû miyên xwe di deriyê hevdaketî re xiste hindur. Çend texte jî danîn ber derî, ku bila pez di şevê de dernekevin û neçin. Di vê herêma de gur mur tunebûn, lê wî, carek jî bo dîtîna miyeke firar, sibetirê hemû roj mecbûrê lêgerîna bûbû.

Kulavê xwe li erdê raxist û xwe li ser dirêj kir, pirtûka xwe ya xwend û xilaskirî, wek balîfek danî binê serê xwe. Berî ku di xew re biçe; difikirî, da ew divê pirtûkên hin qalintir bixwîne: Hem xwendina wan dirêjtir dikişandin û hem jî di şevan de dibûn balîfên bi rihettir.

Gava hişiyarbû, hawîldor hê jî tarî bû. Li jor nihêrî, ji navbera baniyên nûv nûvî hilşiyayî, stêrkên helkirî dihatin dîtîn.

"Xwezî hinek dîsa biniviyama," got di hindurê xwe de. Wî dîsa xewna xwe ya berî heftiyek dîtibû, dîsa bêyî bidawîbûna xewna xwe, hişiyar bûbû.

Rabû ser xwe, firtek jî şeravê vexwar. Piştî çoyê xwe girt destê xwe û dest bi hişiyarkirina miyên xwe yên xewreçûyî kir. Sehkir, piraniya heywanan eynî mîna wî jî

nişka ve ji xewê hişiyar dibûn. Mîna hêzeke sirî, jiyana wî bi jiyana miyên, ku ev du sal in di peyî avê û xwarinê de bi wî re li hemû welat digerin û disekinin, girêdabû. "Wisa hînê min bûne ku, sistema min a demjimêrî jî dizanin," got xwe bi xwe û bi dengê nîzim. Hinek ponijî û piştî wisa fikirî: "Belkî jî, bileksê vê gotinê rast e." Belkî jî ew bi xwe hînê sistema heywanan bûbû.

Lê dîsa jî hinek mî hebûn, hişiyarbûna wan dereng dibû. Bi dengkirina navê wan û bi darê xwe ve, wî yek bi yek ew hişiyar kirin. Wî herdem bawer dikir, miyên wî hemû gotinên wî fêhmî dikin. Ji ber vê hindê jî, hin beşên pirtûkên ku ew pê tesîr bûye, jî miyên xwe re dixwend û car caran jî, ji wan re behsa tenêbûna şivanekî li nav geliyan digere, an jî, behsa şahiya jiyane dikir; car caran jî, ji wan re behsa nûhatiyên bajarên ku wî tê de geriyaye dikir û ev yek jî, êdî jê re bûbû xuy.

Lê, ji berî rojekê heta niha, behsa çî tişteki nekiribû, ji bilî ew keçika ciwan a li wî bajarî, ku ew ê incax di çar rojan de xwe bigihînine wê. Qîza tûcarekî bû, ya behsa wê kirî. Sala çûyî, bes carekê hatibû vê derê. Tûcar xwedî mexazekî qûmaşê bû; ji ber ku di derbarê malên sitendî de neyê xapandin, wî dixwest bila mî li ber derê mexazê wî bîne birin. Hevalekî wî behsa vî mexazeyî kiribû jê re, şivan jî miyên xwe biribû wê derê.

*

"DIXWEZIM HINEKÎ HÊRÎ BIFROŞIM," GOTIBÛ ŞIVAN, jî tûcar re.

Dikan qerebalix bû, kar pir bû; ji ber vê yekê tûcarî ji şivan re got, bila heta esrê li benda wî bisekine. Li ser vê, şivan jî çû li ser peyarê ber firoşgehê rûnişt, ji heqîba xwe pirtûkek derxist.

- Min nedizanîbû, şivan dikarin pirtûk bixwînin, got dengê jineke li ber serê wî.

Bi keziyên xwe yên reş û dirêj, bi çavên xwe yên, ku bi rengê diyar û nediyarkirî fatîhên Maxrîbî yên kevin tînin bîra mirov, ji serî heta neynûkan qîzeke Endûlîsî bû, kesa diaxifi.

- Pez ji pirtûkan zêdetir mirov perwerde dikan, got şivanê gênc.

Ji du saet zêdetir sohbet kirin. Keça Endûlîsî gote wî, ku ew qîza tûcarî ye, di derbarê jiyana gundîtiyê de, ku her rojên wê mîna hev in, qisekir. Şivanî, ji gelîyên Endûlîsî, ji nûhatiyên bajarên ku wî serdana wan kiriye behis kir. Ji ber ku niha mecbûrê axaftina ya bi miyên xwe re nîn e, şivan gelek dilşa bû.

- Hûn çawa fêrê xwendinê bûn? keçikê jê pirsî.

- Mîna her kesek, got û bersivand şivan. Li dibistanê.

- Baş e, lê madem hûn xwendinê dikanin, bo çi şivantî dikan?

Xort ji ber ku vê pirsîyarê nebersivîne, xwe da kherbûnê. Wî bawer dikir, keçik ji bersiva wî çi tiştekî

tênegîhûje. Ji ber vê jî, berdewama behsa çîrokên rêwîtiyê kir. Çavên biçûk û Maxrîbî yên keçikê, ji ber meraq û heyîrînî terikî dibûn, vedibûn û carna jî piçûcîk dibûn. Bi derbasbûna demê, şivan di hindurê xwe de daxwez dikir, xwezî dem qet derbas nebûya, karên bavê keçikê qet xilas nebûna û ji wî bixwestiba, bila sê rojan dîsa li benda wî bisekine. Wî seh dikir, tiştên heta niha hûsnekirî ketin ser dilê wî. Dixwest, li cîhekî bi cih bibe û heta bê dûmahî li wê derê bijî. Li cem vê keçîka ciwan a bi zulifreş, bê guman, roj li hev nedişiviyan.

Lê di dawiyê de tûcar hat û jê re got, bila hêriyên çar miyan biqûsîne. Piştî dayîna deynê xwe, jê xwest, bila sala dihêt jî serdana dikana wî bike.

NIHA JI BO KU EW XWE BIGÎHÎNE VÎ BAJARÎ, DI pêşiya şivanî de çar roj hebûn. Ji ber heyecanê, dilê wî di hindurê wî de bi cîh nedibû, lê qisaweteke tarî jî dilê wî dorpêç kiribû: Belkî keçikê ew ji bîr kiribû. Ji bo ku hêrî bifroşin, gelek şivan serdana wê derê dikirin.

- Pir jî ne girîng e, got gava bi miyên xwe re qisedikir. Ez jî di cîhên cûda de keçikên cûda dinasim.

Lê ji kûranîhên dilê xwe de dizanîbû, ew ne di wê rewşê de bû, ku bibêje "pir jî ne girîng e." Wî dizanîbû; eynî wek deryager û firoşgeran, şivan jî dikarin rojek li serdana bajarekî bikin û li wê derê yekê bibînin û bi saya wê kesê jî dawî li gera xwe ya beredayî ya li rûyê erdê binin.

*

GAVA KU TAVÊN ROJÊ DEST BI BILINDBÛNA JI berbangê dikirin, şivan pezên xwe ber bi rojhilatê dimeşand. "Ti car xwe bi pêwîstiya biryardanekê nabînin," got xwe bi xwe. "Belkî jî, ji ber vê yekê daîm li cem min disekinin." Mî, ji bilî av û xwarinê çî pêdiviyek hîs nedikirin. Wek şivanê wan, wî baştirin cîhên çêrandinê yên Endûlîsî dizanîbû û ji ber vê yekê jî dostaniya wan pê re xirab nedibû. Rojên Xwedayî, di navbera rojhilatî û rojavabûnê de derbas bibûna û bi saetên dirêj dirêj bikişandibana jî, di umrên xwe yên kinîk de yek pirtûkek nexwendibana û zimanê şivanî, ku behsa pêhatiyên li gundan dike qet fêr nekribana jî... Bi xwarin û avê ve çavtêr dibûn û ev yek têra wan dikir. Li gel vê yekê hêriyên xwe, hevaltiyên xwe û carna jî goştên xwe bi comerdî pêşkêş dikirin.

"Rojek jî rojan, eger ez bibûma cinawirekî û min yek bi yek ew bikuştana, incax piştî ku min ew hemû qetilkirin, ew ê hişiyar bibûna," xortî di hindurê xwe de got. "Ji ber ku bi min bawer dîkin û êdî bi hestên xwe yên navînî tevnagerin. Ev yek wisa ye, ji ber ku ez wan dibim cîhê çêrinê."

Xortî, dest bi heyirîna bi ramanên xwe kir û êdî miyên wî li ber çavên wî pir ecêb xuya dibûn. Dêra ku di hindurê wê de dara firawinhêcîrê bilind bûbû, belkî jî bi cin û perî bû. Belkî jî, ji bo vê yekê, wî eynî xewnan didîtin û hêrseke mezin hîs dikir li hember miyên xwe

yên ku wan ew daîm mîna dostên xwe dihesibandin. Ji şerava xwe ya ji şêvê de mayî hinek vexwar û xwe li kulavê xwe ve pêça. Wî dizanîbû, piştî çend saetan, bi berejorbûna rojê germeke xirab wê dest pê bike û ji rûyê vê jî, ew nekaribe miyên xwe li çolê bigerîne. Havînê, di van saetan de hemû Îspanya di xew re diçû. Germê, heta şev diket berdewam dikir, lê di vê demê de ew mecbûr bû, kulavê xwe bi xwe re bigerîne. Li gel her tiştî, dema ku ji vî barî gilî û gazine dikir, bê guman, dihat bîra wî, bi saya vî barî, wî, sermaya hişk a sibe zû qet hîs nedikir.

“Em divê daîm amadebin ji bo dijdêrketina guherînên hewa yê ji nişka ve çêdibin,” digot û difikirî di wê demê de; giraniya kulavê xwe bi minetî qebûl dikir.

Sedemeke hebûna kulavê jî hebû, eynî wek hikmeta laşê xortî. Bi aveyekî ew der a fe, ev der a min got û du salan li hemû deştên Endûlîsî geriya û êdî hemû bajarên herêmê jiber kiribû; tiştî ku wateyekê dide jiyana wî, ger û lêger bû.

Niyeta wî hebû, ji keçikê re şîrove bike, da şivanekî basît bo çi fêrê xwendinê dibe: Heta hîjde saliya xwe çûbû dibistana kêşetiye. Dê û bavê wî dixwestin, kurê wan bila bibe dîndarekî. Ji bo malbateke gundî û feqîr, ku wek miyên wî, bes ji bo av û xwarinê dixebitin, ev daxwez avzêya rûmetê bû. Latîni, Îspanî û diyanetî xwendibû. Lê ji zarotiya xwe û pê de, xeyala naskirina cîhanê kiribû, tişteki wiha girîngtir bû ji fêrbûna Xwedayî, an jî, ji fêrbûna gunehên mirovan. Êvarekê, dema diçû serdana malbata xwe bike, hemû cesareta xwe topkir û ji bavê xwe re got, “ez naxwezim bibim kêşê.” Dixwest rêwîti bike.

- Kurê min, hemû mirovên dûnyayê ji vî gundî hatin û derbasbûn çûn. Hatîn ku li vê derê tiştên nû bigerin, lê qet neguherîn. Ji bo şatoyê bibînin, derdikevin ser girdeyan û biryar didin, ku paşeroj ji îro baştir e. Rengê porên wan vekirî dibe, tarî dibe, ne xem e; hemû ji li mirovên gundê me dişivin.

- Lê ez şatoyên welatên ku ev mirovan ji wê derê hatin, nizamim, lawî got û lê bersivand.

- Ev mirovna, gava ku jin û zeviyên me dibînin, dibêjin em daîm dixwezin li vê derê bijîn, bavê wî got û berdewam kir.

Li ser vê yekê, lawî ji got:

- Ez ji dixwezim jin û axên cîhî, ku ew ji wir hatine binasim. Ji ber ku qet yek li vê derê, bi me re namînin.

- Lê bêrikên van bi pere tijî ne, bavê wî got. Li van deran, li cem me, bes şivan dikarin welatên din bibînin.

- Wê çaxê ez ê ji dibim şivan.

Li ser vê yekê, bavê wî qet tiştek negot. Sibetirê, keseyek da kurê xwe, ku tê de sê lîrayên zêr ên Îspanya kevin hebû.

- Min rojekê ev di zeviyê de dîtibûn. Min niyet hebû, di merasîma qebûlbûna kêşetiya te de evna li dêrê bibexşînim. Here, ji xwe re birekê bistîne û heta tu fêrbibî, ku şatoyên herî baş yên me ne, jinên herî baş ji jinên me ne, li cîhanê bigere û bifitile.

Û mêrikî, lawê xwe pîrozand. Lawî, di çavên bavê xwe de ji daxweza gera cîhanê dît. Ji bo ku her şev xew bike, bixwe û vexwe li heman cîhî mabû û bi salan tekoşîna rizgarbûna ji vê daxwezê dabû, lê hîna ji ev xwestek wisa bi jiyande mabû...

BERBANG SORBÛ, PAŞÊ ROJ XÛYABÛ. XORTÎ AXIF-
tina xwe û bavê xwe anî bîra xwe û xwe dilşa hîskir; hê
di niha de wî gelek şato û jin nas kiribûn (lê ji van jinan
qet yekê jî nedikarî avê li destê jina, ku ew ê piştî du
rojan wê bibîne, birijîne). Kulavekî wî, pirtûkeke wî ya bi
yeke din re bikaribe biguherîne, yek jî, miyên wî hebûn.
Li gel van, tiştê girîngtirîn jî, her roj xeyala mezin a
sedema hebûna xwe dida jiyandin: Digeriya. Eger rojek ji
deştên Endûlisî bêzar bibûya, dikaribû miyên xwe
bifroşe û ew bi xwe jî bibe deryagerekî. Roja ku jî
deryayê bêzar bû, wê çaxê jî êdî wî gelek bajar, gelek jin
binasibûna û gelek avzêyên dilşahiye bi xwe re
jiyandibûna.

"Ji bo lêgerîna Xwedayî, ez çawa dikarim herim
dibistana kêşetiyê?" got xwe bi xwe û li roja dihilatî
nihêrî. Eger ev tişt bibûya daxilî derfetan, rêyekê li ber
xwe dixist û dest bi rêwîtiyeke din dikir. Çend caran jî vê
derê derbas bûbû, lê qet carek jî rastê ev dêra xirabe
nebûbû. Dûnya mezin bû, dawîya wê nedihat. Ji bo
demeke kin bibe jî, eger îzîn bidîyaba miyên xwe, ku ew
rêberiya wî bikin, di dawiyê de wî tiştên gelek balkêş
keşif kiribûna. "Pirsgirêk ev e, ew her roj diçin cihekî nû,
lê qet vê yekê seh nakin. Tênağîhîjin, ku mexelên wan
diguhêre, mewsîm li hevûdu naşivin. Ji ber ku jî xeynî
xwarin û avê çî qisaweteke wan nîn e."

"Belkî jî, ji bo her kesek ev tişt wisa ye," got û fikirî xwe bi xwe şivanî. "Ji roja nasîna qîza tûcarî û vir de, min ti jînek nefikirî, lê ji bo min jî ev tişt wisa ye belkî."

Li asîmanê nihêrî. An gor hesaba wî, berî firawinê ew ê li Tarîfayê bibûya. Li wê derê, dikaribû pirtûka xwe bi pirtûkeke qalintir biguherîne, şûşa xwe bi şeravê ve tijî bike, por û rîşê xwe traş bike; berî ku here cem keçikê, divê xwe bi xweşikî amade kiriba. Dibe ku şivanekî ku miyên wî ji wî zêdetir, berî wî xwe bigîhîne dikanê û bibe talibê keçikê, lê wî qet nedixwest vê ihtîmalê bihîne bîra jî.

"Ihtîmala pêkanîna xewnekê, jiyanê dike tişteki ecêb," got di dilê xwe de, paşê li rewşa tavê nihêrî û gavên xwe lezand. Hatibû bîra wî; li Tarîfayê, pîrejinekê, ku xewnan dixwîne, dijiya. Ev xewna ku wî berî niha carek dîtibû, îşev jî dîtibû.

*

PÎREJINÊ, GÊNC GIRT Û BIR XURFEYEKE LI PIŞT xaniyê, perdeyeke pîlastîk a rengareng, xurfe ji hewşê vediqetand. Di xurfê de maseyek, teswîr a Dilê Pîroz (*) a Îsayî û du jî kursî hebûn.

Pîrejin rûnişt, ji xortî re got, bila ew jî rûne. Piştî herdu destên wî xiste nav destên xwe û bi hêdika dest bi dûayê kir.

Tiştên ku wê digotin, li dûayên Mirtibî dişiviyan. Heta niha di gera xwe de rastê gelek Mirtiban hatibû. Ev mirovna jî digeriyan, lê eleqa wan bi miyan re tunebû. Eger mirov li gotinan binihêre, karê Mirtibek, bi roj û bi şev xapandina mirovan bû. Dihat gotin, ew bi şeytan re peyman çêdikin; zarokan direvînin, vedişêrin û wana wek koleyan bi kar tinin. Şivanê gênc di zarotiya xwe de daîm ditirsiya, ku ew ji aliyê Mirtiban bihête revandin. Gava pîrejinê ji destên xortî pêgirt, ev tîrsa wî ket bîra wî.

“Lê di vê derê de teswîra Dilê Pîroz a Îsayî heye,” wî xwe bi xwe fikirî, gava ku xwest ji tîrsên xwe rizgar bibe. Nedixwest, destên wî biricifin û pîrejinê jî, ev rewşa wî ya bi qisawet seh bike. Bi bêdengî, dûayê Bavê Me yê Xweda xwend.

(*) Rimza evîna Xwedayî ya Îsayî

- Ecêb... got pîrejin, bêyî ku çavên xwe ji destên xortî vekîşîne. Û dîsa hişbû.

Xortî seh dikir, hêy diçe ew bi hêrs dibe. Lê nekarî bibe manî û ricifîna destên xwe bide sekinandin û pîrejinê rewşa wî sehkîr. Wî ji nişka ve destê xwe ji destên pîrejinê kişand.

- Ez nehatim vê derê, li fala destan bidim mêzekirin, got. Bi hatina xwe ya vê malê, poşman bûbû. Lezekê fikirî, eger ew niha rabe û perê jinkê bidê wê û bêyî ku tişteki ji devê wê bibihîse, biçê, dê pir baştir bibe. Lê mixabin, wî ser hevdu ev xewnan dîtûbûn û gelo ew dihatin çi menayê, hînbûna vê yekê, ji bo wî gelek girîng bû.

- Tu hati, di derbarê xewnên xwe de agahdarî bistîni, pîrejinê got, li ser vê yekê. Lê xewin bi zimanê Xwedayî qisedikin. Eger Xweda bi zimanê cihanê qisebike, ez dikarim vê yekê bixwînim. Lê gava wî bi zimanê rûhê te biaxîfe, bes tu dikarî vê yekê fêhm bikî. Dîsa jî, tu ê perê heqê şîrovekirinê bidîyê min.

"Dîsa dalewêreyeke din," genci xwe bi xwe got. Li gel her tiştî, biryar da; ew ê xeteriyê bigre ber çavê xwe. Şivanekî, daîm bi xeteriya gur an jî xelayê ve rû bi rû ye; lê tiştî ku pişeya şivantiyê balkêştir û xweşîktir dike jî ev e.

- Min eynî xewin du caran ser hevdu dîtî. Bi miyên xwe ve di cîhekî çêrandinê de bûm. Piştî demekê, zarokek xuyabû û bi miyan re dest bi listikê kir. Xweşa min naçê, eger mirov bi miyên min re bilîzin; ew jî mirovên nenas pir ditirsîn. Lê ji zarokên ku bi wan re dilîzin, natirsîn. Nizanim bo çi? Tişteki ecêb e, ku heywan salên mirovan bizanibin.

- Gotinê bîne ser xewna xwe, got pîrejinê. Tencera min li ser agir e. Jixwe perê te ji ne gelek in, tu nikarî hemû dema min bistinî.

- Zarok demekê bi miyan re dilîze, şivanî got û axaftina xwe berdewam kir, hinek bi ecizî. Û yekser ji destê min digre û min dibe Pîramîdên Misrê.

Demekê hişbû, wî dixwest fêmbike, ma gelo ev jinik dizane Pîramîdên Misrê çi ne. Lê jinik bêdengiya wî xirab nekir.

- Piştî li ber Pîramîdên Misrê (ji bo ku pîrejin pir baş fêmbike, wî ev bêjeyan yek bi yek digotin) zarok ji min re dibêje, "Eger tu werî vê derê, tu ê xezîneyeke veşartî bibinî. Lê dema zarok cihê xezîne rayê min bide, ez hişiyar dibim. Ev du caran çêbû."

Pîrejin lezekê hişbû. Paşê, destên xortî girt, bi balkêşî lê nihêrî.

- Êdî ez ji te pere naxwezim, got di dawiyê de. Lê eger tu xezîne bibinî, divê ji dehan yek bidî min.

Xortî dest bi kenê kir. Ji ber şabûnê dikeniya.

Bi vê yekê ve, bi saya xewnên xezîne, perên xwe yên hindik ên di bîrika xwe de mayî ji xerc nekirî bûbû! Ev pîrejin, yeqîn Mirtibekê bû. Mirtib hinek ecêb in.

- Baş e, lê hûn vê xewnê çawa şîrove dikin? xortî jê pirsî.

- Divê tu berî sund bixwî. Tu ê sund bixwî, li gel ev tiştên ku ez ê bêjime te, tu ê ji dehan yek ji wê xezîne bidî min.

Xort sund xwar. Pîrejin, jê daxwez kir, bila ew bêtî ku çavên xwe ji teswîra Dilê Pîrozî ya Îsayî vekîşîne, dubare bike.

- Ev, xewneke di Zimanê Cihanê de ye, got piştire. Ez dikarim vê yekê şîrove bikim, lê ev, şîroveyeke pir dijwar e. Ji bo vê, hêjayê para min a ku tu bidî min e ev.

- Şîroveya min wiha ye: Tu divê biçî Pîramîdên Misrê. Ev çi tişt in, ez nizanîm, lê madem zarokekî ew şanî daye, bi rastî ev tişt hene. Tu ê li wê derê xezîneyekê bibînî û dewlemend bibî.

Xort, berî şaşmayî bû, paşê bi hêrs ket. Ji bo tişteki ew qas hindik, pêwîst nebû ew bihata cem vê jinka cazû. Lê, hat bîra wî, ew mecbûr nîn e perê bidê.

- Eger ev be, ev yek hêjayê windakirina wextê nîn e, got.

- De here lo! Min gotibû te, şîrovekîrîna vê xewnê gelek dijwar e. Tiştên basît, tiştên herî ser derfetê ne, û bes zana dikarin ev tiştîna fêhm bikin. Ji ber ku ez ne zana me, divê ez tiştên din bizanîm. Bo nimûne, lê nihêrîna destan, yanê falbêjî.

- Baş e, ez ê çawa biçim Misrê?

- Ez bi tenê xewnan şîrove dikim. Hêza min a ez bi pêk bînim, tune. Ji ber vê jî, ez mecbûr im bi dayînen keçikên xwe bijîm.

- Lê eger ez xwe negihînim Misrê?

- Eh, wê çaxê tu jî tişteki nadî min. Ji xwe ev rewş jî dê ne cara yekemîn be.

Û pîrejinê qet tişteki tevî van gotinên xwe nekir. Ji xortî xwest ku bila biçe. Ji ber ku bi wî re gelek dema xwe windakiribû.

*

ŞIVAN BI XEYAL ŞIKESTINEKÊ VE JI CEM PÎREJINÊ
 veqetiya; biryar dabû, êdî ti car baweriya xwe bi xewnan
 nehîne. Di vê navberê de hat bîra wî, gelek karê wî
 hebûn. Berî çû zikê xwe têr kir, pirtûka xwe bi pirtûkeke
 qalintir guherand û ji bo şerava xwe ya teze kirî, bi rehetî
 vexwe, çû meydana qezayê û li ser textek rûnişt. Rojeke
 germ bû, lê şerav bi sirê xwe yê ku hişê mirov pê nagre,
 hindurê wî hênik kir. Miyên wî li axila ser destê
 destpêka bajarê bûn û bi xwediyê vê axilê ve teze
 dostaniyek çekiribûn. Di van deran de gelek hevalên wî
 hebûn- û ev yek ji diyar dikir, ew ji bo çi ji gerê ew qas
 hezdike. Bêyî ku mirov hemû roj pê re mecbûrê mayîne
 be, mirov dikare herdem dostên nû bi dest bixe. Mîna li
 dibistana kêşetiyê, eger mirov daîm eynî kesan bibîne,
 êdî wana wek parçeyek ji jiyana xwe dihesibîne. Baş e, lê
 ev kesan ji, ji ber vê yekê, xwe radigîhîn ku jiyana me
 biguherînin. Gava em mîna xwestekên wan neyên dîtîn,
 bihna wan teng dibe. Ji ber ku begê min, her kesek bi
 yeqînî ji xwe bawer e, ew dizane divê em çawa bijîn.

Lê çi heye ku, ti kesek dîsa bi yeqînî nizane, da ew
 jiyana xwe divê çawa bijî. Eynî mîna wê cazûyê, hêza wê
 naşê xewnan vegerîne rastiye, lê dîsa ji xwe radigîhîne
 şrovekirina xewnan.

Berî ku miyên xwe têxe pêşiya xwe û biçê li nav mêrg û mexelan, li benda nizimbûna rojê rawestiya. Wî ê piştî sê rojan qîza tûcarî bidîtiba.

Dest bi xwendina pirtûka ji kêşeyê Tarîfayê girtibû, kir. Pirtûkeke qalind bû, hê di rûpelên destpêkê de behsa merasîma cinazeyekê dikir. Ji bilî wê, navê lehengan ji pir bi tevlihev bûn. "Eger ez rojek pirtûkekê binivîsinim," got xwe bi xwe, ji ber ku xwendewan mecbûr nebin navên lehengan bi yekser fêrbibin, "min ê yek bi yek ew pêşkêş kiribana."

Gava bi xwendinê ve ponijî (cinaze li berfê dihate gorandin û ev yek jî, di binê vê roja qelandî de hesteke hênikiyê dida mirov û ji ber vê jî xwendin xweşa wî diçû), pîremêrekî hat û li cem wî rûnişt û dest bi axaftinê kir:

- Ev mirov çi dikin? got û pirsî, bi şanîdana mirovên ku li meydanê derbas dibin û diçin.

- Dixebitin, şivanî got û bersiva wî da, bi rewşeke sar û mîna ku di nav pirtûka xwe de ponijiye û çûye. Elesas, wî xeyalek dikir, di xeyala xwe de wî li ber keça tûcarî, hêriyên miyên xwe dibirin û qîzik jî bi çavên xwe şahidî dikir, ku ev şivan çi kesekî yeman e. Berî niha jî, bi dehan car wî ev sehne xeyal kiribû. Gawa wî dest pê bikira û bigota, divê mî, ji paş ber bi pêş bihête birin, keçikê çawa ji xwe bibihuriya û guh bidayê ser; ev sehne jî daîm di ber çavên şivanî de bû. Ji alîkî ve hêriya miyan dibirî û ji alîkî ve jî çîrokên xweşik û balkêş ên ku ew ê ji keçikê re bêje, dianî bîra xwe. Evna bi piranî çîrokên ku wî di pirtûkan de xwendibû bûn, lê mîna ku wî ev jiyane, diaxifi. Ji ber ku keçikê xwendin nedizaniyê, wê ti car rastiya meselê tenegehîştiba.

Lê pîremêrî dîsa ji li berxwe da. Got, ez tî û westiyayî me û ji wî firtek şerav xwest. Xortî, şûşa şeravê da wî, difikirî, ku bi vî awayî belkî ew pêsîra wî berdide.

Lê pîremêrî yeqîn dixwest, bi wî re galegalî bike. Ji şivan pîrsî, ev pirtûka di destê wî de, tiştêkî çawa ye. Xort, ji hindurê xwe derbas dikir, niha gotineke nebaş ji mêrikî re bêje û paşe rabe biçe û cîhê rûniştina xwe biguherîne, lê bavê wî hîne wî kiribû, ji bo kesên pîr rêz diviya. Li ser vê yekê, pirtûka xwe ya ku wî ew dixwend dirêjê pîremêrî kir. Ji ber du sedeman wî ev tişt kiribû. Ya yekem, wî nedikaribû navê pirtûk baş bibêje; ya dûyem jî, eger pîremêr xwendin nezanibe, ji bo ku biçûk nekeve, wî ê bi xwe cîhê xwe biguherîba.

- Himm! got pîremêrî, mîna ku ev yek tiştêkî pir tuhaf e, wisa bi balkêşî lê vedikola. Pirtûkeke girîng e, lê bihna mirov pir teng dike.

Şivan şaşmayî bû. Nexwe pîrmêrî jî xwendin dizanibû û wî ev pirtûk xwendibû. Wek wî gotî, eger ev pirtûk wisa bihin tengdar be, ji bo guhertina vê pirtûkê ya ji nû ve, hîna dema wî hebû.

- Pirtûkekê, ku mîna yên din behsa eynî tiştî dike, got pîremêrî û axaftina xwe berdewam kir. Ew behis dike, mirov ji şansê hîlbijardina çarenûsên xwe mehrûm e. Di dawiyê de jî, ew dibêje, baweriya xwe bi mezintirîn derewa cîhanê re tinin.

- Baş e, ma mezintirîn derewa cîhanê çi ye? got û pîrsî xort, di nav halekî xweşaşkirî de.

- Çi ye? Di demeke jiyana xwe de em seytera jiyana xwe ji destê xwe winda dikin û di dawiya vê yekê de jî, seytera jiyana me dikeve destê çarenûsiyê. Mezintirîn dirûtiya cîhanê ev e.

- Ji bo min wisa nebû, şivanî got. Dixwestin ez bibim kêşe, lê ez bi xwe bûm şivan.

- W ha baştir e, pîremêrî got. Ji ber ku tu ji gerê hezdikî.

“Ramanên min dixwîne,” got û ji dilê xwe derbas kir Santiago.

Di vê demê de, pîremêrî bêyî ku wisa bi gûhlêdêrî be, rûpelên pirtûkê werdigerandin. Şivanî sehkir, cilên vî kesî gelek ecêb bûn. Li yekî Ereba dişiviya, lê ev yek di van deveran de e ne tiştekî ew qas balkêş bû. Afrika, bes yek û du saet dûrê Tarîfayê bû. Gelek caran, ji bo ku kirin û firotin bikin, Ereba dihatin bajêr; li rojê çend caran bi tevgerên tuhaf, dûa dikirin.

- Hûn ji kû derê ne? xortî pirsîyar kir.

- Ji gelek deveran.

- Kes nikare ji gelek deveran be, gêncî got. Ez wekî şivanekî, dikarim li gelek deveran biminim. Lê eslê min ji cîhekî ye: Bajarekî, ku şatoyeke wî ya pir kevin heye. Ez li wê derê welidîme.

- Baş e, em bêjin ku ez jî li Salemê(*) welidîme.

Şivan nedizaniya, Salem li kû derê ye, lê ji bo ku ji ber nezaniya xwe biçûk nekeve, qet pirsîyarek jî nedikir. Demekê li meydanê mêze kir. Mirov diçûn û dihatin, mîna ku karên wan di ser serê wan re diavêt, wisa xuya dibûn.

- Cîhekî çawa ye Salem, got û pirsîyar kir di dawiyê de, ji bo ku pê sertayekê bigre.

- Mîna her demê, her çawa ye, dîsa wisa.

(*) Bajare, ku di Tewratê de derbas dibe. (Tekvîn XIV, 18) (Wer.)

Ya rastî ev bersiv ne sertayekê bû. Lê kêmترین wî dizanîbû, Salem ne di Endûlisê de ye. Eger ev bajar li Endûlisê bûya, yeqîn wî ew naskiriba.

- Baş e, hûn li Salemê çi dikin?

- Li Salemê ez çi dikim? Pîremêrî cara yekem bû, bi dengêkî bilind kenîya. Ez Keyserê Salemê me, çi pirsîyar!

Mirov çiqas tiştên pir ecêb dibêjin. Carîna, jiyana bi pez re baştir e, mî qisenakin, ji xeynî lêgerîna xwarinê û avê çi tişteki nakin. Lê pirtûk, eger hûn guhê xwe bidine ser, pirtûk gelek çîrokên ecêb dibêjin ji we re. Lê gava bi mirovan re diaxîfî, rewş diguhere, tiştên ew qas tuhaf dibêjin ku, mirov nizane dê çawa axaftinê bide berdewamkirin.

- Navê min Melkîsedek(**), got pîremêrî. Çend miyên te hene?

- Qasî têra xwe, got şivan û bersiv da wî. Lê Pîremêrî dişa jî, dixwest di derbarê jiyana wî de hin tiştên zêdetir hînbe.

- Wê çaxê, pîrsgirêkeke me heye. Gava tu bifikirî, qasî têra xwe miyên te hene, ez nikarim alîkariya te bikim.

Xort di hindurê xwe de hêrsbûnek hîskir. Qet alîkariyek jî nedixwest. Yê şerav dixweze, axaftinê dixweze û bi pirtûka wî re eleqeder dibe, pîremêr bi xwe bû.

- Pirtûka min li min vegerînin, got. Divê ez herim cem miyên xwe û bi rê kevîm.

(**) Keyserê Salemê (Tewrat, Tekvîn XIV, 18); Rahîbê Xwedayî Evra, Abramê (Biraîm Pexember) pîrozand. (Wer.)

- Ji deh miyan yek bide min, pîremêrî ji wî re got. Wê çaxê, ez ê fêrê te bikim, da ji bo ku tu xwe bigîhîni xezîna veşartî, divê tu çî bikî?

Xort, li ser vê yekê xewna xwe anî bîra xwe û yekser her tişt bi vekirî derket holê. Pîrejîné jê pere nexwestibû, wî pîremêrî jî (belkî jî mêrê wê bû) li hember agahiyekê, ku bi rastiyê ve qet eleqa xwe nîn e, hîn pirtir pere jê bigirtiba. Ev jî yeqîn Mirtibekî bû.

Lê, xortî hê devê xwe venekiribû, pîremêr xwarê erdê bû û qirçeke zirav hilda destê xwe û bi vê, li ser qûmên meydane hin tiştan dest bi nivîsinê kir. Gava pîremêr xwarê erdê bûbû, tişteki li ber singê wî biriqî, ew qas biriqî ku, çavên xortî qet tişteki nedîtî bûn. Lê, pîremêrî, bi leziyekê ku ji umrê wî nayê bawerkirin, singê xwe bi harmaniya xwe ve girt. Qerîmîna çavên xortî derbas bû û tiştên pîremêrî dest bi nivîsinê kiriye, bi vekirî dît.

Li ser qûmên meydana bajarê biçûk, navên dê û bavê xwe xwend. Çîroka jiyana xwe ya heta wê demê, listikên çaxa zarotiya xwe, şevên sar ên dibistana kêşayetiye xwend: Tiştên, heta niha wî nekariye ji kesek re bêje, dixwend. Ji bo nêçîra teyrên qeracê, çawa tîfîngê bavê xwe bi dizîka girtibû, an jî ew ceribandînen cînsî yên ku bi tenê serê xwe kiribû, wî hemû ev tiştina xwendin.

- Ez Keyserê Salemê me, pîremêrî ji wî re gotibû.

- Keyserekî bo çî bi şivanekî re biaxife, xortî pirsîyar kir; bi qisawet bûbû, heta jê tê, behîtibû.

- Gelek sedemên vê hene. Lê em bêjin, sedema vê ya herî girîng ew e; tu xwediyê ew hêz î, ku tu dikarî bi wê, Menkiba Şexsî(*) ya xwe pêk binî.

Xort nedizaniyê, peyva "Menkiba Şexsî" tê çî wateyê.

- Ew tiştî ku daim tu dixwezî wî pêk binî, ew e. Em hemû jî, gava em gênc in, em dizanin, Menkiba me ya Şexsî çi ye.

- Di vê pêvajoya jiyane de her tişt aşîkar e, vekirî ye, her tişt mûmkûn e, û mirov natirse ji xeyalkirinê, ji daxwezkirina tiştên ku di jiyana xwe de dixwest wan pêk bîne. Lê bi derbasbûna demê ve, hêzeke sirî dest pê dike û dixweze îspat bike ku pêkanîna Menkîba Şexsî ne mûmkûn e.

Ji bo şivanê gênc, menayeke girîng a gotinên vî pîremêrî tunebû. Lê ev "hêzên sirî" çi ne? dixwest vê yekê fêrbibe. Eger wî ji qîza tûcarî re behsa vê yekê bikira, devê qîzkê dê bihûstek vekirî bibûya.

Ew hêz in, ku bi te bi neyînî xuya dibin, lê di rastiya xwe de, evna fêrê te dîkin, ku tu ê Menkiba xwe ya Şexsî çawa pêk binî. Evna bîr û îradeya te amade dîkin, ji ber ku di cîhanê de rastiyeke mezin heye. Tu kî dibî bibe, çi dikî bike, gava ku tu bi hemû dilê xwe tiştêkî bixwezî, di Rûhê Gerdûnê de ev daxwez çêdibe. Ev yek, erka te ya taybet a li ser rûyê erdê ye.

- Mirov bes bixweze rêwîti bike? An jî bi qîza tûcarekî qumaşfiroş re bizewice? An jî bixweze li xezînan bigere? Rûhê Cîhanê bi dilşahiya mirovan re xwe xwedî dike. An jî bi nedilşahiyan ve, bi xwestekê ve, bi hesûdiyê ve. Pêkanîna Menkiba xwe ya Şexsî, berpirsiyariya yegane û rastî ya mirovan e. Her tişt yek û tek tişt e. Û gava te tiştêk xwest, hemû Gerdûn ji bo pêkanîna xwesteka te hevkarî dike.

(*) Menkibe: Çîroka jiyana û kiryarên muazam ên kesên oldar, an jî kesayetên dirokî. Bi vê bêjeyê, referansa çarenûsê tê kirin. (Wer.)

Li meydanê û li kesên ku diçûn û tîn temaşê kirin, bi vî awayî, hinekî bêdeng man. Bêdengî, bi vî pîremêrî ve xirab bû.

- Tu ji bo çi şivantî dikî?

- Ji ber ku gera cîhanê xweşa min diçe.

Mêrekî li guşeyek meydanê di sêyara xwe ya sor de lazûtên qelandî difiro, pîremêrî ew şanîda û got:

- Di zarokbûna xwe de wî jî dixwest rêwîti bike. Lê wî kirîna vê sêyarê hîlbijart ji xwe re, ku pê lazûtên qelandî bifroşe û bi salan pere liserhev bike. Gava pîr bû, ji bo mehekê ew ê biçe Afrikayê. Wî ti car têngîhişt, ji bo pêkarîna tiştên xeyalkirî, her dem derfet hene.

“Wî dikarîbû şivantiyê jî hîlbijêre,” xort fikirî. Wî ev fikra xwe bi dengê bilind dubare kir.

- Helbet wî ev jî hizir kir, pîremêrî got. Lê firoşgerên lazûtên qelandî ji şivanan girîngtir in. Baniyeke firoşgerên lazûtên qelandî heye, ku serê xwe têxin, lê şivan di qesra stêran de dinivin. Mirov dixwezî qîza xwe ji şivanan zêdetir, bi firoşgerên lazûtên qelandî re bizewîcin.

Şivanî ku qîza tûcarî difikirî, di ser dilê xwe de janek hîskir. Bê guman niha di bajarê mala bavê keçikê de firoşgereki lazûtên qelandî hebû.

- Di dawiyê de ji bo mirovan, fikrên wan ên di derbarê şivanan û firoşgerên lazûtên qelandî de, ji Menkiba Şexsî ya wan girîngtir dibe.

Pîremêrî, rûpelên pirtûkê wergerand, cîhekî bi kêfxweşî xwend. Şivan hinek rawestîya, paşê, mîna ku berî hindê pîremêrî jî wisa kiribû, ket nav gotinê:

- Hûn bo çi evna dibêjine min?

- Ji ber ku tu hewil didî, ji bo Menkiba xwe ya Şexsî bijî. Û ew maye, tu wê biterikî.

- Baş e, gelo hûn daîm di van rewşan de derdikevin meydane?

- Her daîm ne wiha ye, lê her daîm min xwe ji kirina tişteki paş venekişand. Carîna wek ramanêke baş, rêyêke çareseriyê hatim xuyakirin. Carîna jî, di lezeke pir nazîk de min bi şikleki wisa hereket kir, ku meselê hêsanîr bikim. Tiştên wek wiha, lê piraniya mirovan qet tişteke seh nekin.

Wî digot, berî heftiyekê ew mecbûr maye ji madengerekî re mîna kevireki xuya bibe. Meriveki, ji bo lêgerîna zimrûdê, her tiştên xwe terikandibû. Ji bo parçeyek zûmrûd, pênc salan li perava çemekî xebitiye, nehsed û not û neh hezar û nehsed û not û neh kevir şikandiye. Tam jî di vê demê de bêzar bûye, fikiriye ku êdî vê lêgerînê biterikîne. Lê were binihêre, ku ji bo dîtîna zimrûda xwe, kevireki, bes kevireki mabûye. Madenger, ji ber ku li ser Merkîba Şexsî ya xwe behis girtiye, pîremêrî jî biryar daye, ku tevî karê wî mîrîki bibe. Pîremêr bûye kevireki û ketiye ber lingê wî madengerê. Ji ber kerb û jana xebata pênc salan, madenger bi hêrsekê ve kevir girtiye û avêtiye ber bi dûrahiyan. Mîrîki, wisa bi hêzeke mezin avêtiye ku, kevir çûye li kevirî din ketiye û parçe parçe bûye û zimrûda bedewtirîn a cîhanê derketiyê holê.

- Mirovan, sedemên jiyanê pir zû fêrdibin, pîremêrî got, bi êşekê, ku di çavên wî de diyar dibû. Belkî jî, dîsa ji ber eynî sedemê, radestê binketînê dibin. Lê, halê dînyayê wisa ye eve.

Xort, anî bîra xwe, ev axaftin ji ber rûyê xezîna veşartî dest pêkiribû.

- Lehî, xezîneyan ji binê axê derxîne û dîsa lehî wan dixê binê axê, pîremêrî got. Eger tu dixwezî di derbarê

xezîna xwe de tiştên zêdetir hînbibî, divê tu ji dehan yek ji miyên xwe bidî min.

- Ji dehan yek a xezîne têra te nake?

- Bi waedkirina tiştî ku hûna te ew bi dest nexistiye, dest bi karê xwe bikî û herî, tu ê xwesteka bidesxistina xezîne winda bikî.

Şivan, li ser vê yekê, jê re got, wî soz daye pîrejinê, parek ji dehan a xezîne dê bide wê.

- Mirtip qurnaz in, got û hindurê xwe kişand pîremêrî. Lê çi dibe bila bibe, ev tişteki baş e ji bo ku mirov fêrbibe, da bedela her tişteki heye di jîyanê de. Jixwe tiştî ku Şervanên Ronahiyê dixwezîn bi mirovan bidin fêrkirin, ev e.

Pirtûka wî lê vegerand.

- Tu ê sibê, ji dehan yek ji miyên xwe bo min binî. Tu ê xezîne çawa bibînî, ez ê bêjîme te. De haydê, êvar baş!

Piştî, li kuncikek meydanê, ji ber çavan windabû.

*

GÊNC DICERIBAND, KU PIRTÛKÊ JI NÛ VE BIXWÎ-ne, lê nedikarî bala xwe li ser wê tîrbike. Ji ber ku wî dizanîbû pîremêr rast dibêje, bi hêrs û bê hizûr bû. Çû firoşgerê lazûtên qelandî dît û jê torbeyek lazûtên qelandî kirî. Tiştên wî pîremêrî gotibû, neqlê vî mêrikî bikira an bédeng bibûya? Difikirî, lê nedikarî biryarekê bide. “Carîna mirov karê xwe di bûyera xwe de bihêle, qet nelivîne, baştir e,” xort fikirî, lê wî, ev fikra xwe ji mêrikî re negot. Eger pê re qisekiriba, wî firoşgerê hanê, bi rojan serê xwe biêşandiba: Her tiştî wisa bihêle, an nehêle? Lê gelek ji hinê sêyara xwe ya biçûk bûbû.

Wî dikarîbû, mêrik ji şikenceya bêbiryariya wî ya ku ew bûbû sedem, rizgar bike. Li bajêr, dest bi gerê kir, heta sitrîngehê (lîmanê) dirêj bû. Di sitrîngehê de avahiyeke biçûk hebû, mirov ji quleke wek pencera avahiyê, bilêt dikirin. Pêzanî ku welatê Misrê li Afrîkayê ye.

- Daxweza we? karmendê sitrîngehê jê pirsî.

- Belkî sibê, genci got, gava ku ji wir dûrket. Dikarîbû miyeke xwe bifroşe û pê derbasê perava hember a tengavê bibe. Vê ramana wî ew dibizdand.

- Eve ji te re xeyalperestekî dîsa, got karmendê li wir ji hevalê xwe re, gava xort dûr diket. Perê xwe yê bilêtê ji tune.

Xortî, li ber cîhê firotina bilêtan, miyên xwe fikirîbû û tirsîyabû, ku here cem wan. Di nava du salan de, wî di

derbarê xwedikirina miyan de her tişt fêrbûbû. Xwedikirina miyan, qusandina hêriyên wan û parastina wan a ji guran, wî hemû tişt fêrbûbûn. Wî hemû mêrg û merayên xweşik ên Endûlisiî dinasîbû. Bûhayên kirîn û firotin ên her miyekê baş pê dizanîbû.

Biryar da, ji rêya dirêjtirîn biçe axila hevalê xwe. Şatoyeke vî bajarî hebû; canê wî dixwest, rabe hilkişe kelê û li ser sûran de rûne. Ji dihar dikaribû Afrîkayê bibîne. Yekî, zemanekê, jê re gotibû, Maxrîbiyên, ku demeke dirêj Îspanya dagir kiribûn, ji vê derê hatine. Ji maxrîbiyan xûy fikir. Wan Mirtiban anîbûn.

Meydana ku wî bi pîremêrî re galgalî kiribû, ew jî tê de, ji jor beşeke mezin a bajarê jî dikaribû bihata dîtin.

“Nelet li wê demê bê, ku ez rastê vî pîremêrî hatim,” xortî xwe bi xwe difikirî. Ew çûbû, bes ji bo jinekê bibîne û xewnên xwe pê bide şîrovekirin. Çi pîrejin, çi jî pîremêr, ti car guh nedan şivantiya wî. Evna mirovên bitenê mayî bûn, di jiyanê de ji bo çi tiştêkî baweriya wan nemabû û nedikarîn têbigîhjin, ku şivan jî, bi hîsiyatî ve girêdayî miyên xwe dibin. Wî miyên xwe pir baş dinasîn. Kîjan kulek e, kîjan piştî du mehan dê berx bidê, kîjan tenbel e, hemû dizanîbû. Qusandin û serjêkirina wan jî dizanîbû. Eger biryara çûyîné bidiyaba, miyên wî dê êş bikişandibana.

Ba derket. Wî ev bayê hanê nasdikir. Ji vê bayê re digotin bayê Rojhilatê û birrên bê îman, bi vî bayî ve hatibûn. Berî ku were Tarîfayê, wî nedizani, ew qas nêzikî Afrîkayê hatiye. Ev yek xeteriyeke pir mezin bû: Maxrîbiyan dikaribûn careke din welat dagîr bikin.

Rojhilatî, hişktir dest bi bagerîné kir. “Ez di navbera miyên xwe û xezîné de mam,” got di hindurê xwe de. Ew mecbûr bû biryar bide, mecbûr bû di navebara tiştên

xwedîbûyî û daxwezkirî de hîlbijardinekê bike. Ji aliye din, qîza wî tûcarî jî hebû, lê qîzik bi qasî miyan girîng nebû, ji ber ku qîzik girêdayî wî nebû. Tiştêkî bi yeqîn hebû: Eger sibetirê keçikê ew nedîtiba, wê ev tişt qet seh nekiriba jî. Ji bo keçikê hemû roj mîna hev bûn û gava hemû roj mîna hev dibin, hingî roj di asîmanê de tevgeriyabe, mirov di jiyanên xwe de ew qas bê hay dibin, ku tiştên baş ên derdikevin ber wan jî nabînin.

“Min, dê û bavê xwe û şatoya wî bajarî, ku ez tê de hatim dûnyayê terikandin. Ew jî hînê vî tiştî bûn, ez jî bûm. Eger mî jî hînê tunebûna min bibin, ew ê baş bikin,” şivanî xwe bi xwe got.

Ji jor li meydana nîhêrî. Firoşger firotina lazûtên xwe yên qelandî berdewam dikir. Keç û xortek hatin û li cîhî ku berî lezekê, wî, bi wî pîremêrî ve li wê derê diaxifîn, rûnîştin û dest bi lihevmaçînê kirin.

“Firoşgerê lazûtên qelandî,” got bi milmilandinekê ve, lê neşiya gotina xwe biqedîne. Ji ber ku bayê Rojhilatî hişktir dest bi bagerînê kiribû, bayê di rûyê xwe de hîs kir. Bê guman vî bayî, Maxribiyan jî bi xwe re dianî, lê bêhna saharan û jinên bi pêçe jî bi xwe re heta van deran difûrand. Xeyal û xwîdanên mirovan jî bi xwe re dihanî, ku ew mirov, rojekê, ketibûn peyî Nezanînê û derketibûn lêgerîna zêr û serenc û Pîramîdên Misrê. Şivanê xort, hesûdiya azadbûna bayê kir û têgîhişt, ew jî rojek bikaribe mîna wî be. Ji bilî xwe, çi tiştêk tunebû, ku jê re astengî bike.

Miyên wî, qîza tûcarî, merayên Endûlîsî jî bilî menzîlên Menkîba Şexsî ya wî, hîç tiştêkî nebûn.

*

SIBETIRÊ, DEMA NÎVROYÊ, XORT RABÛ ÇÛ CEM WÎ
pîremêrî. Wî şeş mî bi xwe re anîbûn.

- Ez gelek şaşmayî bûm, got ji pîremêrî re. Hevalê
min bi yekser pezên min kirin. Ji min re got, ku min di
hemû jiyana xwe de, xeyala şivanbûnê kiribû; nîşana
çêyî!

- Hertim wisa dibe, pîremêrî got û bersiv da. Em ji vê
re dibêjin Pîrensîba Lûtfê. Gava tu, cara ewil kaxiz bilîzî,
yeqîn serdikevî. Şansê ecemitiyê.

- Baş e, bo çi wiha dibe?

- Ji ber ku jiyana dixweze tu Menkiba xwe ya Şexsî
bijî.

Paşê dest bi lênihêrîna şeş miyan kir û sehkir,
mîyekê dikule. Şivanê gênc gote wî, ku ev ne tiştêkî
giring e, ji ber ku ev mî, baqiltirîn mî bûye di nav wan de
û pir jî hêrî didiyê.

- Xezîne li kû derê ye? xortî pirsîyar kir.

- Li Misrê ye, li rex Pîramîdan.

- Şivan veciniqî. Pîrejinê jî eynî tişt gotibû jê re û
serde jî, ji wî pere nesitandibû.

- Ji ber ku tu xwe bigihîni xezînê, divê tu pir rind
bala xwe bidî îşaretan. Xwedayî, ew rêya ku mirov divê
lê bişopînin, li rûyê erdê bi xet kiriye, nivîsiye. Tiştî tu
bikî, ew nivîsên ji bo te hatine nivîsandin, bes bixwî.

Berî ku xort dest bi axaftinê bike, di navbeyna wî û
pîremêrî de perwaneyek bi hewa bû. Bapîrê wî hat bîra

wî; Di zarotiya xwe de kalkê wî jê re gotibû, perwane elameta şansê ne. Eynî mîna bihokên circir, kuliyên kes, fatfatokên gewr û piçûcîk û yonceyên çarpel.

- Rast e, pîremêrî got; wî, ramanên şivanê gênc dixwend. Mîna ku bapîrê te fêrê te kiriye. Evna hemû elamet in.

Paşê harmaniya xwe ya ku xwe bi wê pêçaye, vekir. Xort, ji tiştî ku berî niha dîtî, gelek bi tesîr bûbû; ew bîriqîna ku çavên wî qerimandibûn hat bîra wî. Li ser singê pîremêrî de singbereke(*) terikî hebû; singber jî zêra somê hatibû çêkirin û bi kevirên qiymet jî hatibû xemilandin.

Keyserekî heqîqî bû pîremêr. Ji ber ku rastê hêrişên rêbiran neye, wiha xwe diziyabû.

- Bigre! got, yekî sipî û yekî reş, du kevirên ku orta singbera xwe de çikiyayî, derxist. Navê yekî Urîm(**), navê yekî jî Tummîm e. Yê sipî tê wateya "erê", yê reş jî tê wateya "na".

(*) Di bend'a 28. ya Beşa bi navê "Derketin" a Tewratê, ku bi hevoka, "Û tu, ji bo ku ji min re kehîntiyê bikin, ji nav Kurên Îsrail, Harûnê birayê xwe û wî bixwe û kurên wî, Harûn û kurên wî Nedab û Abihû, Eleazar û Îtamarê jî li cem xwe bîne," ve dest pê dike de de; wek eswabên, ku divê têne çêkirin (singber û efot û entari û êşligê bi nexş, egal û şûtik) tê qebûlîkirin. Bi "singber" a ku di tekstê de derbas dibe de, ev singbera di Tewratê de derbas dibe, tê bi mena kirin. (Wer.)

(**) Urîm û Tummîm: Du kevirên, di singbera rahîbê mezin de ne û rimza îradeya Xwedayî temsîl dikin. "Û tu ê Urîm û Tummîmî têxî nav singbera ferweriyê(hukmê) û gava ku ketin ber Rabbê, ew ê li ser dilê Harûnê de bin û Harûn, li ber Rabbê, ferweriya Kurên Îsrailî daîm li ser dilê xwe bigerîne. (Tewrat, Derketin, 29 : 30) (Wer.)

Gava ku tu di şîrovekirina nîşanan de bi ser neketî, ew alîkariya te dîkin. Lê tu daîm pirsîyarên heyînî bike.

- Lê eger mûmkûn e, biryarên xwe dîsa bi xwe bide. Xezîne li rex Pîramîdan de disekine, tu vê yekê dizanî jixwe. Tu mecbûr mayî, ku şeş miyan bidî min, ji ber ku min di biryardana te de alîkariya te kir.

Xortî, herdu kevirên xwe xist nav heqîba xwe, êdî wî biryarên xwe, dê bixwe bîdiyaba.

- Ji bîr dernexîne, her tişt yek û tek tişt e. Zimanê sîmbolan ji bîr neke. Bi taybetî, ji bîr neke, ku divê tu heta dawî peyî Menkîba xwe ya Şexsî biçî.

- Lê niha ez dixwezim du çîrokên biçûk bêjime te.

Tûcarekî lawê xwe şandiye cem zanayê herî mezin, ku bila ew Sirê Dilşahiye hînbe. Gênc, di çolekê de çil roj meşiyaye û di dawiyê de xwe gîhandiye şatoyeke cîwan a li ser girdeyekê. Ew zanayê behsêkirî li vê derê jiyayibûye.

Lehengê me, yê ku ji wî wetrê, ew ê niha rastê ewliayekî bê; di hewşê de bi rewşeke ecêb hatiye pêşwazî kirin. Tûcar dikevin hindur û derdikevin, mirovan di kuncikekê de sohbet dikin, orkestrayekê, mûzîkên xweşik lêdixe; maseyek ji heye û li ser wê de xwarinên lezzîz ên ku ji çar aliyên cîhanê anîne, tijî tijî ye. Zanayî yek bi yek bi van mirovan re diaxifibûye. Gêncê me jî, ji ber ku dor were wî, mecbûr maye, du saet li hêviya wî bisekine.

Zana bi balkêşî guh daye ser axaftina lawikê, ku sedema ziyareta wî çî ye; lê zana jî, ji wî re gotiye, ji bo şarîdana Sirê Dilşahiye dema wî tune. Gotiye wî, bila here li qesrê ji xwe re bigere û piştî du saetan dîsa were cem wî.

"Lê rîcayê min hebe ji we," zanayî gotiye, piştî kevçiyek daye destê wî gencî û du dilop ji rûnê zeytûnê xistiye navê.

Xort dest bi hilkişîn û piyabûna ji derincên qesrê kiriye, çavên xwe ji kevçî veneqetandiye. Piştî du saetan hatiye derketiye hizûra zanayî.

"Baş e, gotiye zana, lê we xaliçeyên Acêm ên li salona xwarinê dît an ne? Lê we, baxçeyê, ku Serbaxçewan ev deh sal in ji bo afirandina wî ew qas dixebite, dît? Parşûmenên min ên xweşik ên li pirtûkxana min bala we kişandin an ne?"

Xort, bi şerm, mecbûrê îhtîrafkirinê bûye, ku wî çî tişteke nedîtiye. Ji ber ku wî hemû bala xwe daye ser du dilop rûnê, ku ew nerijin, li tiştên din diqet nekiriye.

“Wê çaxê biçê, newazeyên cîhana min binase,” zanayî gotiye wî. “Bêyî ku tu mala wî kesî, ku tu tê de dijî, bibinî, nikarî baweriya xwe pê binî.”

Hindurê gêncî bi rihet bûye, kevçî girtiye û dest bi gera qesrê kiriye. Ev car bala xwe daye ser eserên hûnerî yên li dîwaran hatine dardakirin û li esreşan hatine xemilandin. Li baxçeyan, çiyayên li wê deverê, li xweşîkbûna çîçegan, zerafeta eserên hûnerî yên di cîhên xwe de pir cîwan xuya dibin, mêzekiriye. Gava vegeriyaye cem zanayî, ew tiştên ku wî dîtî, hemû jê re gotiye.

“Baş e, ew du dilop rûnên ku min emaneta te kiribû, li kû ne?” zanayî jê pirsîyar kiriye.

Xort li kevçî mêzekiriye û dîtiye, ku rûnê nav kevçî hemû rijiyaye.

Li ser vê yekê, “Baş e,” gotiye zanayê mezin, “bes şîretek heye, ku ez bidime te: Sirê Dilşahiye, dîtîna hemû newazeyên cîhanê ye, lê, bêyî jibîrkirina di dilop rûnê di kevçiyê de.”

Şivanî devê xwe venekir û qet qisenekir. Mena çîroka keyserê pîr baş fêhm kiribû. Şivanekî dikare ji gerê hezbike, lê ew miyên xwe ti car jî bîr nake.

Pîremêrî, li xort nihêrî û paşê, bi destên xwe yên vekirî, li ser serê gêncî hin îşaretên ecêb kir.

Paşê miyên xwe xist pêşîya xwe û jî wir dûrket.

*

DI TAXA JOR A BAJARÊ BIÇÛK TARÎFA`YÊ DE kelayeke kevin a ku Maxrîbiyan ew çêkirine, heye; kesek eger li ser sûrên vê kelê rûne, li jêr, yek meydanek, yek firoşgerê lazûtên qelandî û yek ji parçeki Afrikayê dikare bibîne.

Keyserê Salem, Melkîsedek wê êvarê çû li sûrên kelê rûnişt û di rûyê xwe de, bayê bi navê Rojhilatî hîskir. Miyên ku ji ber guherîna xwediyên xwe û ji ber tevliheviyê hinek eciz bûbûn, hinek di aliyê pêş de dilivîyan û disekinîn. Hemû xwestekên wan bi tenê xwarin û vexwarin bû.

Melkîsedek li gemya biçûk a ku ji lîmanê dûr dikeve û diçe, mêzekir. Wî ti car ew şivan nedîtiba êdî, mîna ku piştî pêdana bacê aşir, êdî ti car nedîtina wî ya Abramê(*) bû ev yek. Lê taybetiya karê wî ji ev bû.

(*) "Û Abram (Brahîm B.Î.), piştî ku Kederlaomer û keyserên li cem wî kuşt û vegeriya, di Bihura Şavê de Keyserê Sodomê derket pêşwaziya wî (ev Bihura Keyserê ye). Û Keyserê Salem Melkîsedek nan û şerav derxist û ew, kahîne Xwedayî Taâla bû. Û wî ew pîrozand û got: Ji layê Xwedayî ku ew xwediyê ard û asîmanê ye, Abram pîroz be; ew Xwedayî Taâla, ku wî dijminên te teslimê destê te kir, bila pîroz be. Û ji her tiştî ji wî re dehaniyek da. Û Keyserê Sodomê ji Abramê re got: Canên hebûnan bide min û mal û mewdan ji bigre ji xwe re. Û abram ji Keyserê Sodomê re got: Min destê xwe rakir li Xwedayî Taâla, li RABBÎ û jê re sund xwar, ku ez ê ti car, çi tayek, çi bendên çarixan û çi ji tiştêki ku aîdê te ye negrim, tâ ku tu nebêji min Abram dewlemend kir. Ji bilî xwarinên gencan û ji bilî para Aner, Eşkol û Mamre, ku wan bi min re çûn, bila ya min nebin; evna bila para xwe bistînin. (Tevrat, Tekvîn. XIV, 17-23) (Wer.)

Daxwezên xwedayan nîn e, ji ber ku Menkibeya Şexsî ya xwedayan nîn e. Lê dîsa jî, Keyserê Salem ji kûranîhên dilê xwe daxweza serkeftina wî xortî kir.

"Çi heyîf! Di demeke kin de ew ê navê min ji bir bike," got di hindurê xwe de. "Divê min navê xwe bi wî, bi çend caran bida dubarekirin. Gava wî behsa min kirî, divê bigota, ku ew Keyserê Salem Melkîsedek e."

Paşê serê xwe rakir berbi asîmanê, ji ramanên xwe fêdî kiribû: Dizanim: Valayê valayan.(*). Mîna te gotî, Xwedayê min. Lê carna, keyserekî pîremêr jî dikare pêwîstiya xurura ya bi xwe re, hîsbike.

*

(*) Tewrat, Waêz, I: 2. (Wer.)

"EV AFRÎKA ÇI WELATEKÎ ECÊB E," GOT XWE BI xwe û fikirî.

Gava di sûkên teng ên bajarê de digeriya, wî gelek qehwexane dîtîn û çû li qehweyeke mîna wan rûnişt. Mirovan, pîpoyên terikî yên dev bi dev digerin, dikişandin. Wî di nav çend saetan de mîrên ku dest bi destên hevûdu de digerin, jinên rûpêçayî, olemîrên ku li ser bircên bilind de sitranan dibêjin û yek ji mirovên li der û dora van de dicivin, li çoka dikevin û eniya xwe li erdê dixin, dîtîbûn.

"Taeta bêîmanîyan," got xwe bi xwe. Gava ew zarok bû, di dêra gundê xwe de wî, pêkera Ewliya SANTIAGO Matamoros ê ku li hespekî kûmet sîwar bûye, didît: Şûrê xwe kişandiye û di binê lingên wî de mirovên, ku li mirovên vê derê dişivin hebûn. Xwe bi tenê û bi qisawet hîsdikir, bo çi? Awirên xirab û reş ên van bêîmanîyan hebûn.

Di ser de jî, di nava telaşa destpêkirina rêwîtiyê de detayeke zirav ji bîr kiribû. Ev ziravî, tiştêkî wisa bû, ku dikaribû demeke dirêj wî ji xezîna xwe dûr bidaba sekinandin: Di vî welatî de her kes Erebi diaxift.

(*) Yaqûbê Mezin (Saint Jaques le Majeur), yek ji donzde Hewariyên Îsaya ye. Bi "Masîvan" hatiye bi navkirin û bixwe jî, birayê Yuhannayê nivîskarê ji çar Încilan yekê ye. Ji aliyê Keyser Hîredos bi şûr ve hate kuştin. (Încil, Karê Resûlan, 12:2). Cihê vî Hewariyê di Îspanyê de gelek girîng e. (Wer.)

Xwediyê qehwê nêzikî bû; xort dît ku ji bo maseyek li kêlekê, vexwarinek tê anîn, wî jî bi îşareteke tiliyê ve, ji wê vexwarinê xwest. Tiştî ku wî îşaret kirî, çay bû, çaya tahl. Lê wî dixwest niha şerav vexwariba.

Lê niha nikaribû ku bi tiştên wisa xwe tengezar bike, dem ew dem nebû. Ji bilî xezîna xwe, divê wî çî tiştek nefikirîba. Ji firotina miyên xwe sermayeke mezin bi dest xistibû û wî dizanîbû, hêzeke bi sirî ya perê heye. Piştî demeke kin, belkî jî di nav çend rojan de wî dê xwe bigîhandiba Pîramîdan. Pîremêrî ku singê wî bi zêrên birqîn birqîn tijî xemilandiye, pêdivî nedidît, ji bo bi destxistina şeş miyan derewan bike.

Keyserê pîr, ji wî re behsa rimzan kiribû. Gava ji tengavê derbas dibû, rimzan difikirî. Belê, wî dizanîbû, pîremêr behsa çî tiştan dike: Di dema ku wî li çolên Endûlîsî derbaskirî de li asîmanî û li erdê, fêrê xwendina îşaretên ku divê bêne şopandin, bûbû. Hebûna filan teyrî, îşaret dike ku di nêzîkan de marekî heye; sinc û ber jî îşareta hebûna avê bû. Wî ev tişt fêrbûbûn. Mî, ev tiştna fêrê wî kiribûn.

"Xwedayî eger miyan ew qas bi rindî bi rê ve biribe, wî dikaribû însanek jî bi rê ve bibe." fikirî û sehkir, hindurê wî rihet bû. Çay tahiltir hat.

- Tu kî yî? pirsîyareke bi zimanê Îspanî bîhîst.

Ji nişka ve heta jê tê, xwe bi qudret hîskir. Gava wî rimzan difikirî, yekî derketibû ber wî.

- Tu çawa dikarî bi zimanê Îspanî biaxîfî? got û ji wî pirsî.

Yê li ber wî gencekî bû û cilên wek Ewrûpayî li xwe kiribû, lê rengê giwîna wî, dianî bîra mirov ku ev kes jî vî bajarî ye. Hema hema di bejn û umrê wî de bû.

- Li vê derê hema hema her kes bi zimanê Îspanî diaxife. Em bes qasî du saetan dûrê Îspanyayê ne.

- Rûne. Ji min tiştêkî vexwe. Ji bo min jî şerav bixweze. Ji vê çayê nifret dikim.

- Di vî welatî de şerav nîn e. Ji aliyê dîn ve hatiye qedexe kirin.

Xortî, li ser vê yekê, ji wî re got ku ew divê here Pîramîdan. Ew mabû, jê re behsa xezînê bikira, lê paşê fikirî ku ev yek tiştêkî xelet e. Lawikê Ereb, ji bo ku wî bibe wê derê, dikarîbû pareke ji xezînê bixweze. Pêşniyazên pîremêrî yên di derbarê tiştên ku hîna mirov lê xwedî nebûye de, anî bîra xwe.

- Eger mûmkûn be, ez dixwezim tu min bibî wê derê. Ez heqê rêberiya te didim. Ma agahdariyeke te ya li ser çûna wê derê heye an na?

Wî sehkir, xwediyê qehwê di nêzikî wan de ye û guh dide sar wan. Li ser vê yekê hinek eciz bû. Lê ew rastê rêberekî hatibû û nedixwest vê derfetê ji destê xwe birevine.

- Divê em ji Çola Saharê ya terikî derbasbin, got lawikê Ereb. Ji bo vê yekê jî pere divên. Berî her tiştî ez dixwezim fêrbim, bi têra xwe perê te hene an na?

Xort, bi vê pirsîyarê ve hinek heyirî. Lê baweriya wî bi pîremêrî dihat û pîremêrî jî, jê re gotibû, eger hûn bi rastî bixwezin tiştêkî bikin, wê çaxê di gerdûnê de her tişt jî bo serkeftina we dê hevkarî bikin.

Perê xwe ji bêrika xwe derxist û rayê hevalê xwe yê nû da. Patronê qehwê ji cihekî nêzîktir li wan mêze dikir. Herdu mêr di navbera xwe de bi Erebî hin tiştina qisekirin. Patron wisa xuyadibû, ku pir bi hêrs bûbû.

- Em ji vê derê herin, got xortê Ereb. Patron naxweze em li vê derê bimînin.

Xort xwe piçek rihet hîs kir. Ji bo ku deynê xwe bide, rabû piya, lê patron ji milê wî pêgirt û ew rakir û jê re dest bi kişandina xîtabeteke bê navber kir. Xort, belê gelek bi quwet bû, lê di welatekî xerîb de bû. Hevalê wî yê nû, patronê qehwê bi alîkî ve temda û xort derxiste derve.

- Çav berdaye perê te, got. Tanca ne mîna cîhên din ên Afrîkayê ye. Ev der sitrîngeh e û sitrîngehan jî hêlîna dizan e.

Nexwe dikarîbu li vî hevalê nû bi bawer be, ji ber ku wî di demeke wî ya teng de alîkariya wî kiribû. Pere ji bêrikên xwe derxist û jimart. Yê din:

- Sibê em dikarin xwe bigîhînin Pîramîdan, got, dema ku perê xwe dijimart. Lê divê ez du hêştiran bikirim.

Li sûkên tengenik ên Tancayê, bi hev re dest bi çûnê kirin. Di her kuncik û bûcaxan de pêşangehên tiştên firotinê hebûn. Di dawiyê de hatin meydana mezin a cîhê bazarê. Bi hezaran mirov bazarî dikirin, dikirin û difrotin; sebze û xaliçeyan, pîpoyên cûrbe cûrbe li kêleka hev hatibûn pêşanîdan. Xortî, çavên xwe ji ser hevalê xwe yê nû qet venediqetand. Ji bîr nedikir ku hemû perê wî li cem wî bû. Ji hizra xwe derbaskir, niha perê xwe dîsa jê bixweze, lê ev yek jî dê bibûya tevgereke nebaş. Edet û kevneşopiyên vî welatê xerîb, ku ew niha li ser axên wî de digere, nedizanîbû.

- Bila çavên min li ser wî bin, ev bes e, xwe bi xwe fikirî. Ew bixwe ji wî zexmtir bû.

Di nava van eşyayên tevlihev û qiyametî de, çavên wî ji nişka ve li şûrekî pir cîwan ket; heta niha tiştêkî wisa nedîbû. Kewdanka şûrê ji zîvê bû, li destiyê jî

kevirên pir bi qiymet hatibûn çikandin. Biryara xwe da, di vegera rêya Misrê de ew ê wî şûrî bikire.

- Ji firoşger, fiyeta şûrê pirsiyarke, got ji hevalê xwe re. Lê gava ku wî ev sîleh temaşe dikir, sehkir ku ew, qasî lezeke pir kin ponijiye.

Mîna ku ji xaft ra qefesa singê wî teng bûye, dilê wî tengezar bû. Ji ber ku dizanîbû, çi tişt li benda wî ye, tirsîya ku li kêleka xwe binihêre. Çavên wî li ser şûrê cîwan lezek wisa mam, paşê hemû cesareta xwe komkir û serê xwe li wî vegevand.

Di der û dora wî de meydana bazarê hebû, yên tîn û diçîn, yên diqêrin, digazin, xalîçe, findiq, marûlên gongil ên li kêleka sîniyên baxir; li sûk, mêrên ku dest bi dest girtî, jinên serbipêç, bêhna xweşik ên xwarinên cûrbe cûr...

Dixwest bawer bike, ev windakirina wan a hevûdu tişteki tesadûfî ye. Bi hêviyekê ku yê din niha dê vegere, di cîhê xwe de dest bi bendemayînê kir. Piştî demekê, meriveki hilkişîya li ser wan bircên malûm û dest bi sitranê kir, li ser vê yekê jî, yên li wê derê ne, çokê xwe danin û eniya xwe li erdê dan û wan jî dest bi sitrînê kirin. Piştî jî, mîna hêlîna mûriyên serkar, beraqên xwe hilşandin û bi rê ketin.

Roj jî êdî diçû ava. Mêrikê gênc, tî ku ew li paş xaniyên sipî yên li hawîldora meydane hatine avakirin, windabû çû, li rojê nihêrî. Fikirî, gava ev eynî roja ku vê sibê derdiket, ew bi xwe di kişwereke din de bû, li wê derê şivantî dikir, şeş mîyên wî hebûn û wî û qîzekê dê hevûdu bidîtana. Vê sibê, gava ew li çolê digeriya, wî dizanîbû ev tişta dê werin serê wî.

Lê niha roj diçû ava û ew di welateki din de bû. Êdî yekî xerîb bû di welateki xerîb de, ku wî zimanên

mirovên li wê derê dijîn, qet fêm ji nedikir. Ew êdî ne şivanekî bû û niha qet tişteki wî tunebû; perê wî yê ku pê bikaribe vegere welatê xwe û ji nû ve dest bi her tiştî bike, ew jî tunebû.

"Hemû ev tişta di binê hilatin û avaçûna eynî rojê de çebûn," got xwe bi xwe. Difikirî, di jiyane de hîna ku mirov hîn nebûye, di demeke çav vekirin û girtin de rewş diguherin; paşê jî gunê wî xwe bi xwe hat.

Fêdî dikir ku bigrî. Li ber miyên xwe ti car negiriyabû. Lê, meydana bazarê vik vala bû û ew jî, gelek dûrê ji welatê xwe bû.

Giriya. Ji ber ku Xweda ne edil e, ji ber ku ew, mirovên ku li xewnên xwe bawer dikin bi vî awayî bi ceza dike, giriya. "Ez dema li cem miyên xwe bûm, dilşa bûm û min ev dilşabûna xwe bi kesên din re parve dikir. Kesên ku diditin ez tîm, bi dilxweşî pêşwaziya min dikirin. Niha bi keder im û bi jan im. Ez ê çi bikim? Ji ber ku mirovekî li min xiyane kir, ez ê serttir bim û li kesî bawer nekim. Ji ber ku min xezîna xwe nedît, ez ê ji kesên ku xezîna xwe dîtine, nifret bikim. Û lewra ez qasî ku hemû cîhanê nikarim hembêz bikim, biçûk im; tiştê biçûk û kêr, ku ez xwediyê wî me, ez ê ji bo parastina wî tiştî bixebitim.."

Heqîba xwe vekir, tê de hela çi heye; parçeyek kilora ji dema şîva gemiyê de mayî hebû belkî. Lê ji bilî pirtûka terikî, kulavê û ew her du kevîrên ku pîremêr dabûyê, çi tişteki nedît.

Gava wî ev kevîr dît, di hindurê xwe de teseliyek hest kir. Şêş miyên xwe, bi van herdu kevîrên, ku ji singbereke zêrîn hatibûn derxistin, tirampe kiribû. Dikaribû evna bifrota û pê bilêta vegeerê bikiriya. "Ji vê û pê ve, ez ê bêtir qurnaz bim," got xwe bi xwe, her du

kevir ji heqîbê derxist û xiste bêrika xwe. Ev der sitrîngehek e û lawîkê Erebb, bi tenê tişteki rast gotibû: Di sitrîngehekê de daîm birrek diz hene.

Hewildanên bê hêvî yên patronê qehwê hat bîra wî û teze teze her tişt dihat fêmkirin. Wî dixwest bêje, bila bi vî mêrî bawer nebe. "Ez ji mîna her kesî me: Li rastiyên cîhanê, ne mîna ku ew wisa ne, mîna ku ez dixwezim dinihêrim."

Lezekê li kevirên xwe mêzekir. Bi hêdîka mizda, bi germayiyê ve, rûberên nerm û şiqitî yên keviran, li serê tiliyên xwe de hesiya. Ev kevir xezîna wî bûn. Mizdana wan hinek wî bi rihettir kir. Bi yekser ew pîremêr hate bîra wî.

"Eger tu bi rastî tişteki bixwezî," pîremêr gotibû ji wî re, "ji bo serkeftina te hemû gerdûn hevkarî dike."

Xortî dixwest ku bizane, da ev yek rast e an na... Di meydanake vik û vala de bû, çi bêrika wî de qurîşek, çi ji miyên wî yên ku şevê li ber wan bisekine, hebû. Lê ev kevirna îbat dikirin, ew li rastê keyserekî hatiye. Ew rastê keyserekî hatibû, haya keyserê ji Menkîba Şexsî ya wî, kiriyara wî ya bi sîleha bavê xwe û yekemîn ceribandina wî ya cînsî hebû.

"Kevir, ji bo kahîni bi kêr tên. Navên wan Urîm û Tummîm."

Kevirên xwe dîsa xiste hindurê heqîba xwe û biryar da, ku ew ê ceribandinekê bike. Wî pîremêrî jê re gotibû, ev kevirna, gava tu xwesteka xwe bi zelalî bizanî, bi kêrê te tên, ji ber vê jî divê mirov ji wan, pirsîyarên vekirî û zelalkirî bike.

Li ser vê yekê, pirsîyarkir, pîrozandina pîremêrî li ser wî hê jî carî ye an na?

Ji keviran yek derxist. Kevirê derketî "Erê" bû.

- Ez ê xezîna xwe bibînim an na? xort pirsîyar kir.

Destê xwe xist heqîba xwe, xwest ji keviran yek bigre. Lê kevir ji qulê heqîbê ketin erdê. Wî qet seh nekiribû, ku li heqîb qulekê heye. Ji bo ku Urîm û Tummîmî ji erdê bigre û têxe heqîbê, xwarê erdê bû. Lê gava wî ew dîtî, hevokeke din hate bîra wî:

"Fêrê birêzbûna li gel rimzan û şopandina wan bibe," gotibû keyserê pîr.

Îşaretek. Xort, dest bi kenîna xwe bi xwe kir. Paşê kevirên li erdê girt û xist heqîba xwe. Niyeta wî ya dirûtina qulê tunebû. Kevir, eger çi wext canê wan bixwesta, dikarîbûn bikevin. Ji bo ku ew ji çarenûsa xwe nereve, ew fêrbûbû, da hîn tiştan ji divê nehatibana pirsîyar kirin.

"Ez sozê didim, ez ê biryarên xwe, bi xwe bidim," got di hindurê xwe de.

Lê kevir, gotibûne wî, ku ew pîremêr dê daîm li cem wî be, bersîva wan ew gelek bi bawer kiribû. Ji nû ve ber bi bazara vik vala nihêrî, ew bêhêvîtiya lezeke berî êdî neket dilê wî. Êdî cîhaneke xerîb nebû ev der. Cîhaneke Nû bû...

Bi rastî, ya ku bi tevayî wî dixwest jî, ev yek bû. Avakirina cîhanên nû. Eger wî ti car xwe negîhandiba Pîramîdan jî, ew ji niha de, ji hemû şivanên ku wî ew nasdikirin, zêdetir çûbû cîhên dûr.

"Ax, xwezî bizanîbana, bi vapûrê ve, di rêya du saet wî alî de çi qas guherînên mezin çêbûne..."

Cîhana nû, wek meydana bazareke vik û vala li hember wî disekinî, lê gava ev der civil civil bû, dîsa dîtîbû û wî, ti car ji bîr jî nekirba. Şûr kete bîra wî; ew ponijîn û temaşakirina wî ya li şûrê, çawa bi bûhabûneke mezin lê rûnîştîbû, lê di jiyana xwe de ji heta niha tişteki

wisa nedîtîbû. Dixwezî wek qurbenê dizekî, dixwezî wek serencevanekî, ku li peyî xezînê ketiye bibe, bi yekser têgihîşt, ew dikare li dûnyayê binihêre.

“Ez serencevanekî (serûwenkarekî) me û ketime peyî xezîneyekê,” got û fikirî, berî ku ji ber westan û bêzarbûnê, bi halekî qediyayî bi xew re biçe.

*

Institut kurde de Paris

GAVA WÎ SEHKIR, YEKÎ PÎLÊN WÎ DIHEJÎNE, hişiyarbû, li navenda bazarê, ku niha dest bi jindebûnê kiriye, niviyabû.

Bi lêgerîna miyên xwe, li hawîldora xwe mêzekir û wê çaxê fêmkir, ku ew di cîhaneke din de ye. Qet ji vê yekê xemgîn nebû, bilekîs xwe bi dilşahi hîskir. Êdî mecbûrê ketina peyî av û xwarinê nebû û dikaribû dest bi lêgerîna xezînê bike. Di bêrika xwe de metelîkek ji tunebû, lê baweriya wî ya bi jiyanê, pir bi hêzbû. Berî şevêkê, mîna lehengên li pirtûkên, ku wî ew xwendibûn, rêya serencevaniyê ji xwe hîlbijardibû.

Bêyî ku ecele bike, dest bi gera bazarê kir. Firoşgeran dest bi avakirina baragehên xwe kiribûn; alikariya avakirina baregeha yekî şekirfiroşî kir. Di rûyê vî mêrikî de gîrnijînekê, ku li rûyê kesên din naşive, dît. Dilê wî bi şahî tijî bû, ji jiyanê re vekirbû, ji bo destpêkirina rojeke dijwar amade bû. Gîrnijîna vî mêrikî, ew pîremêr, ew keyserê pîr ê ku demeke berî wî ew naskiribû, anî bîra wî. Eve gîrnijîneke wisa bû. "Ev tûcar şîrinayî îmal dike ne ji bo na ku rêwîti bike an jî bi qîza tûcarekî re bizewice. Na, ew şîrinayî berhem dike, ji ber ku ew vî karî hezdike," got di hindurê xwe de. Sehkir, ev mêrik dikare kiriyara wî pîremêrî jî bike. Bi yek nihêrinê ve mirov fêmbike, ew kes nêzîk an jî dûrê Menkiba Şexsî ya

xwe ye. "Tişteki hêsan e, lê ez hê jî, gelek dûrê vê têngîhiştinê me."

Dema baregeh hat avakirin û xilasbû, firoşger, şîrînayiya ewil ya amadekirî, pêşkêşê vî gencî kir. Gencî bi hezeke mezin şîrînayî xwar, sipasî li wî kir û bi rê ket. Hinek dûrketibû, ku hat bîra wî; yên baregeh avakiribûn, ew du kes bûn, yekî jî wan Erebi, yê din jî Îspanî qisedikir.

Dîsa jî ev herdu kesan pir baş hevûdu fêm kiribûn.

"Zimanekî heye ji bêjeyan wêdetir." got xwe bi xwe. "Berî niha tecrûbeyeke min a bi miyên min re çêbûbûn, niha jî, eynî tiştî bi însanan re çêdikim."

Waye ew tiştên wisa nû û cûda fêrdibûn. Berî niha jî, wî ev tiştîna jiyabûn, lê dîsa jî nû bûn, ji ber ku ew berî niha jî rastê van tiştan hatibû lê, bi hebûna wan hayîdar nebû. Ji ber ku ew hîne van tiştan bûbû, wisa bûbû. "Eger ez di fêrbûna wî zimanî de, ku pêdiviya wî bi bêjeyan nîn e, serkeftî bim, ez ê di têngîhiştina dûnyayê de jî serkeftî bim.

"Her tişt, tişteki tek û eynî ye," gotibû pîremêrî.

Biryar da, di navbera kolanên teng ên Tancayê de ew ê bi bêqisawetî bigere; Incax bi vî awayî dikaribû rimzan têbigîhîje. Ev yek, bê guman sebreke mezin dixwest, lê sebir, fazîleta yekemûn e, ku şivan fêrê dibin.

Careke din têngîhişt; wî, dersên ku ji miyên xwe hînbûye, di cîhaneke xerîb de dixiste jiyanê û diceriband.

"Her tişt, tişteki tek û eynî ye," pîremêrî gotibû.

BÎLÛRFIROŞ BALA XWE DA SER DERKETINA ROJÊ Û ew hesta bêzarî ya ku ew her sibe hîsdike, dîsa hîskir. Hema hema ev sî sal in, ew di eynî cîhê xwe de bû, li firoşgeha serê dawîya rêya qiyamê, ku mûşterî, belkî salê carê dihatin û lê serdanek dikirin. Niha ji bo guhertina tiştekî jî, êdî gelek dereng bû. Di jiyana xwe de bes fêrê tiştekî bûbû; bes kirîn û firotina bîlûriyê. Ew di dema xwe de pir bi nav û d eng bû, gelek mirov ev firoşgeh nasdikirin: Tûcarên Erebb, erdnîgarzanên Frensî û Îngîlîzî, leşkerên Alman, yanê ew kesên, ku daîm bêrikên wan bi pere tijî tijî ne. Di wan deman de bîlûrfiroşî, efsaneyeke mezin bû û xwediyê dikanê daîm xeyal dikir, ku ew ê rojek dewlemend bibe û gava ew pîr bû, ew ê bibe xwediyê jinên bedew.

Paşê hêdî hêdî dem derbas bû û bajar guherî. Bajarê Septê qasî Tanca dewlemend bû û naveroka ticaretê jî pê re guherî. Cînar mala xwe bar kirin û koçê cîhên cûda kirin û piştî demekê, li ser wê qiyamê, ji bilî çend dikanên bi tenê, çi tiştekî nema. Ji bo çend dikanên bê qiymet, êdî ti kesek nedigirt ber çavên xwe, bèn û li vê qiyamê hîlbikişin.

Lê, şansê hîlbijardina Tûcarê Bîlûriyê tunebû. Sî salên jiyana xwe, bi kirîn û firotina eşyayên krîstal jiyabû; ji bo hêlguhertineke nû ya ji bo jiyana xwe êdî pir dereng bû.

Ji sibê de li kesên, ku li sûkê tîn û diçin dinihêrî, gelek kêrînsan hatibûn û ji wir derbas bûbûn. Ev yek bi salan e, wisa ye; wî êdî xuyên van kesên ji vê sûkê derbas dibin ji baş dizanîbû.

Berî çend deqe ji wexta firawinê, gencê xerîb hat û li ber camekanê rawestiya. Kincên wî mîna her kesek bûn, lê çavên bi tecrûbe yên Tûcarê Bîlûriyê, yekser biryar da, ku di bêrika wî gencî de pere tune. Li gel her tiştî, dîsa biryar da, ew vegere dikanê xwe û heta, ev gencê xerîb ji wê derê biçe, ew ê çend deqe biraweste.

*

Institut kurde de Paris

LI SER TABLEYEKE LI BER DERÎ DARDAKIRÎ HATIBÛ
nivisandin, ku di dikanê de gelek zimanên biyanî dihête
axaftin. Xortî lê nihêrî, yekî ji paş dezgehê derdikeve.

- Eger hûn bixwezin, ez dikarim van wazoyan temîz
bikim. Kes di nav vê gemariyê de wan nakire.

Tûcar, bêtî gotinekê, mêze rûyê xortî kir.

- Li gel vê yekê jî, hûn dikarin, qasî ku ez pê têr bim,
hinek pere bidine min, baş e?

Mêrik nedixîfî. Xortî têtîşt, ku divê ew bi xwe
biryar bide. Di heqîba wî de kulavê wî hebû û ew jî li
çolê hewce nedikir. Kulavê xwe derxist û dest bi
temîziya wazoyan kir. Di nava niv saetê de hemû
krîstalên li ber wîtrînê, hatibûn temîz kirin. Di vê
navberê de du mûşterî hatin û gelek bilûriye kirin.

Gava paxijkirina her tişt xilasbû, ji xwediyê firoşgehê
hinek pere xwest, ku pê ji xwe re xwarin bikire.

- De em herin xwarinê, Tûcarê Bilûriyê gote wî.

Li derî tabeleyek dardakir û pêk ve çûn nandaneke
(aşxaneyeke) biçûk a li ber binê qiyamê. Di nandanê de
bes maseyek hebû û çûn ber wê rûniştin, tûcarî, bi
tebesûmekê ve dest bi axaftinê kir:

- Ya rastî, pêwîst nebû, ku te tiştêk paxij kiriba.
Zagona Qur`anê difermîne, divê mirov birçiyar têr bike.

Xortî jê pirsîyar kir:

- Madem wisa ye, bo çi we îzîn da ku ez vî tiştî
bikim?

- Ji ber ku krîstal bi qirêj bûn. Mîna min û te jî, divê me, ramanên xirab ên li nav serê xwe, paxij kiribana.

Gava xwarinên wan xilas bû, Tûcar vegeriya xortî:

- Min dixwest, tu di karê min de bixebitî. Dema te krîstalan temîz dikir, du mûşterî hatin dikanê. Ev îşareta başî ye.

Şivan fikirî, "her kes bi roj û bi şev behsa îşaretan dikin." "Lê bi yeqînî behsa çî dikin, ew jî nizanin. Eynî rewşa min a ku min bi salan bi miyên xwe re, bi zimanekî bêpeyîv diaxifî û min ev yek qet seh nedikir."

- Tu ê bi min re bixebitî an na? got Tûcarê Bîlûriyê û pirsîyara xwe dûbare kir.

- Ji bo dema mayî ya ji vê rojê, dikarim bixebitim. Heta sibê hemû krîstalên li dikanê dikarim temîz bikim. Hûn jî li gel vê xebata min, heqê rêya ji wir heta Misrê bidine min."

Pîremêr ji nişka ve dest bi kenîne kir.

- Tu krîstalên dikanê, bo salekî jî temîz bikî, ji tiştên firotî komîsyoneke mezin bi dest bixî jî, ji bo çûna Misrê divê tu gelek perê bi deyin peyda bikî. Di navbera Tanca û Pîramîdan de sahareke bi hezaran kîlometir heye.

Li ser vê yekê bêdegiyeke wisa çêbû, ku mirov digot qeyê hemû bajar ketiye nav xewa piştî nûvro. Qeyê êdî bazar mazar nemabû, gengeşiyên di navbeyna firoşgeran qediyabû, mirovên li ser serê bircan de sitranan dibêjin, ji holê winda bûbûn çûbûn, şûrên çeleng ên ku destiya wan bi taybet, firiyabûn û li ber hewa bûbûn. Hêvî û serence, keyserên pîremêr û Menkibeyên Şexsî tûne bûbûn êdî. Çi pîramîd hebûn, çî jî xezîne. Ruhê xortî ketibû nava bêdegiyeke bê hidût, ji ber vê yekê jî, ji wî wetrê hemû cîhan jî bê ziman mabû. Çi dert, çî êş û çî jî şikestina xeyalan... Bi tenê nihêrîneke vik û vala ya ji ber

derê biçûk a nadana biçûk der bas dibe diçe û yek ji ew daxweza mirina bê serî û bê dawî, ew xwesteka ku mirov pê dibîne, di eynî demê de her tişt heta dawî xilas dibe.

Tûcar behîtî bêhîtî li xortî mêzekir. Şahî û dilgeşiya ku wî di sibê de der û dora xwe de dîtîbû, qeyê di seniyekê de firyaye û çûye.

- Perê, ku tu pê bikaribî vegerî welatê xwe, didime te kurê min, got Tûcarê Bîlûriyê.

Xort bê deng ma. Paşê rabû ser xwe, cil û bergên xwe serrast kir û heqîba xwe hilda ser milê xwe.

- Ez ê bi we re bixebitim, got. Û piştî bêdengiyeke dirêj, ji bo ku gotinên xwe tevav bike, lê zêde kir:

- Ji bo çend miyan bikirim, min pere divên.

Beşa Dûyemîn

XORT, EV NÊZÎKÎ MEHEK E, LI CEM TÛCARÊ BÎLÛ-riyê dixebitî. Lê ev karê hanê, ne ew kar bû, ku bi tevayî wî dilşa bike. Tûcar, ji sibê heta êvarê li paş dezgê disekinî, dilibliband û bi sedan car jê re dûbare dikir; bila pir diqet bike û krîstalan neşkêne.

Xort, dişa ji xebata xwe ya li wê derê berdewam dikir. Ji ber ku mêrik yekî dirdire bû belkî, lê yekî bê edelet nebû; Ji her tiştên firotî komîsyoneke gumrah diket destê firoşger û di niha de dest bi zêdekirina perên xwe kiribû. Vê sibê hesap kiribû: Eger ew her roj eynî bi vî rengî bixebite, ji bo sitandina çend miyan, ew ê mecbûr bimîne, ku salek bi tevayî kar bike.

- Ji bo krîstalan ez dixwezim lewhayeke pêşangehê çêbikim, got ji patronê xwe re. Mirov dikare li derve lewhayekê dayne; ev yek ji tâ ji binê qiyamê heta vê derê bala her kesên, ku ji wir derbas dibin, dikişîne.

- Heta niha min tişteki wisa nekiribû, Tûcarî got û ew bersivand. Gava mirov ji wir derbas dibin, dibe ku li lewhê bikevin û krîstalan bişkênin.

- Gava min miyên xwe li gelî digerand, marekî jehrîn dikaribû ji wan yek bikûşt. Lê ev xeterî, parçeyek ji jiyana şivan û miyan e.

Tûcar, di vê navberê de çû cem mûşteriyekî xwe. Wî dixwest sê parçe tiştan bistîne. Êdî ji her demê zêdetir tişt dihatin firotin, qeyê ew demên kevin dişa vegeiriyabûn,

mîna ew demên ku ev kûçeya hanê, yek ji kûçeyên Tanca yên herî cazîb û bi bereket bû.

Gava mûşterî çû, Tûcarî ji xort re got:

- Kesên tîn û derbas dibin, roj bi roj zêde dibin. Di vê sayê de em baştir dikarin bijîn, tu jî dê di demeke kin de xwe bigîhîni miyên xwe. Ma ji bo çi mirov divê tiştên zêde bixweze ji jiyanê?

- Ji ber ku divê em îşaretan bişopînin, xortî ji Tûcar re got û bersiv da wî. Bêyî ramankirin qisekiribû. Paşê xort li ser vê axaftina xwe ya bi wî re, poşman bû, ji ber ku Tûcar di jiyana xwe de ti car bi kêyserekî re derfeta hevnasînê nedîtibû.

- Ji vê yekê re "Qaîdê Lûtûf" tê gotin, gotibû keyserê pîr. Şansê ecemitiyê. Ji ber ku jiyana dixweze tu Menkibeya Şexsî ya xwe bijî.

Bi vê yekê ve, Tûcar pîr baş fêhm dikir, ku xort dixweze çi bêje. Niha li dikanê, hazirbûna xortî jî îşaretekê bû. Ji ber ku dem diçû û kase bi perê ve tîji dibû, Tûcar dilxweş dibû, ku wî ev xortê Îspanî girtiye cem xwe. Bê guman wî xortî, ji heqê xwe zêdetir qezenc dikir; ji ber ku qet demekê jî, nehatibû bîra wî, kargeha wî ew qas kar bike, wî komîsyoneke gumra dabûyê xortî; pêşdîtina xortî digote wî, ku ew ê di demeke kin de xwe bigîhînine miyên xwe.

- Ji bo çi tu dixwezî pîramîdan bibîni? Tûcar ji xortî pirsîyar kir, ji ber ku wî dixwest behsa lewha pêşangehê biguherîne.

- Ji ber ku pîr behsa wan kirin ji min re, got û bersiv da. Qet qala xewnên xwe nekir. Xezîne êdî bîranîneke bi êş bû û qet nedixwest wê bîne bîra xwe.

Tûcar gote wî;

- Ez di van deran de hîç kesek jî nas nakim, ku bes jî bo dîtina pîramîdan were û vê saharê derbas bibe. Ma jî bilî qûçeke jî kevir çî tişt e? Tu dikarî li baxçê xwe pîramîda xwe çêkî.

- We qet xewnên rêwîtiyê neditîne, xortî jî tûcar re got û di wê demê de mûşteriyek nû ket dikanê û xort çû cem wî.

Piştî du rojan, behsa lewha pêşangehê vekir jî Tûcarî re:

- Ez ji guhertinan pir hez nakim, got. Ne ez û ne jî tu, em naşivin li tûcar Hesenê bavê peran. Gava ew tişteki bikire, xeletiyekê bike, bona wî ne xem e. Lê em daîm mecbûr in, bedêla xeletiya xwe bidin. Xort "Gotinên wî rast in," got di hindurê xwe de.

- Tu bo çî ev lewha pêşangehê dixwezî, Tûcarî pirsî?

- Ez dixwezim berî demekê herim û xwe bigihînim miyên xwe. Şans ji ber ku hê jî di cem me de ye, divê em jî vê yekê feyde werbigrin. Ji bo vê jî, çî pêwîst e, divê em bikin. Ji vê re "Qaidê Quralan" tê gotin. An jî "şansê ecemîti."

Tûcarê pîr demekê rawestiya, hîç devê xwe venekir. Paşê axîfî:

- Peyxemberê me Qur`an da me û wî em mecbûr kirin, ku em heta dawiya umrê xwe, bes îteata pênc şertan bikin. Şertê girîngtirîn ev e: Bi tenê Xweda`yekî heye. Şertên din jî; nimêj kirina pênc wext, rocî girtina di meha Remezanê de û zikatdana bo feqîran.

Bêdeng bû. Gava behsa pêxemberê kiribû, çavên wî hêşir kiribûn. Însanekî dil bi coş bû. Hîn caran wek mirovekî bê sebir bixûyaba jî, wî cehd dikir, ku bi an gor şertên Îslamê jiyana xwe bide berdewam kirin.

- Baş e, şertê pêncemîn kîjan e? xortî jê pirsî.

- Berî du rojan te gote min, ku min qet xewnên rêwîtiyê nedîtine, tûcarî got û bersiv da. Ji bo misulmanek baş şertê pêncemîn, kirina rêwîtiyek e. Di jiyana xwe de qet nebe carekê, divê em ziyareta Mekkê bikin.

- Mekke ji Pîramûdan pir dûrtir e. Gava ez xort bûm, min perê xwe yê hindik, ji bo vekirina vê kargehê bi kar anî. Min hêvî dikir, rojêk bihête û ez ê pir dewlemend bim û herim Mekkê. Eger tu ya rastî dipirsî, min dest bi qezenca peran jî kir, lê min nekarî krîstalên xwe teslîmê yekî bikim; helbet, mirov gelek îhtîmam bide krîstalan, ew nazik in. Di vê navberê de gelek rêwiyên Mekkê serdana kargeha min kirin. Di nav wan de pir hecberên dewlemend ên ku bi tevî xizmetkar û hêştirên xwe bi rê ketine, hebûn, lê hemû jî insanên ji min feqîrtir bûn.

- Hemû jî bi bextiyarî diçûn û bi bextiyarî jî vedigeriyan û li ser deriyên xwe nîşanên çûn û hatina hecê didalîqandin. Yek ji van, jiyana xwe bi dirûtina solan qezenc dikir û wî ji min re got, ew ji bo derbasbûna çolê salek meşiyaye, lê niha ji bo kirîna koselê, gava mecbûr maye li kolanên Tancayê bigere, wî xwe zêdetir westiyayî hiskiriye.

- Baş e, lê hûn niha bo çi naçin Mekkê? xortî ji pîremêrî pirsîyarkir.

- Tiştî ku min di jiyane de dide sekinandin Mekkê ye. Ez bi hêza wî dikarim li rojên heman mîna hev, wazoyên li ser refan rêzkirî û xwarina sê wext li aşxaneyêke kerixî berxwe bidim. Ez ji pêkanîna xewna xwe ditirsim, ji ber ku wê çaxê, sedema min a ji bo jiyane dê nemîne.

- Tu, miyên xwe û Pîramûdan xeyal dikî. Tu ne mîna min î. Ji ber ku tu dixwezî xeyalên xwe pêk bînî. Lê

daxweza min bes xeyalkirina Mekkê ye. Min bi hezar caran xeyal fikir, ez ê saharê derbas bibim, biçim û bigihîm meydana Hacerê Esved ê Kevirê Pîroz, bêtî ku berî destê xwe lêdim, heft caran li dora wî bizvirim. Kî dê li cem min be, kî dê li pêşiya min be, em ê çi biaxifin, kîjan dûayan bikin... min ev yek jî xeyal fikirin. Lê niha ez jî şikestina van xeyalên xwe ditirsim; ji ber vê yekê jî, bes bi kirina xeyalan îdare dikim.

Tûcarî, wê rojê îzîna xortî da, ku bila ew lewha pêşangehê bide çêkirin. Her kes xeyalên xwe eynî nabîne, an gor qewlê xwe dibîne.

DU MEH DÎSA BIHURÎ. LEWHA PÊŞANGEHÊ PIRTIR mûşterî kişand kargeha bilûriyê. Xort hesab kir, eger ew şeş mehan dîsa wek vê bixebite, dikare pê vegere Îspanyê û ji xwe re şêst miyan bikire. Di serde jî wî dikaribû şêst miyên din jî bikire. Di nav salekî de wî ê miyên xwe du car zêde kiriba û bihata rewşeke bazarîkirin a bi Ereban re, ji ber ku wî di fêrbûna vî zimanê ecêb de bi rastî bi ser ketibû. Ji bo Tûcarê Bilûriyê, Mekke çawa xeyaleke dîr bû, ji bo wî jî Misir êdî bûbû xeyaleke wisa dîr û ne diyar; ji ber vê yekê jî, ji serpêhatiya xwe ya wê sibêya malûm a li meydana bazarê û vir de, qet serî li Urîm û Tummîmî jî nexistibû. Lê ji karê xwe xweş bû û qet ji bîra xwe dernedixist ku ew ê rojêk bi rewşeke serketî pêlê axa perava Tarîfayê bike.

Keyserê pîremêr jê re gotibû; "Daîm bine bîra xwe, tu mecbûr î, ku bizanibî tu çi dixwezî." Xortî jî dizanibû ew çi dixweze û di rêya armanca xwe de dixebitî. Rêya wî derketiba vî welatê ecêb, rastê dizekî hatiba û bêyî xerckirina quruşek jî, wî dê pezên xwe du car lê zêde kiribana; xezîna wî jî belkî ev bû.

Bi xwe re bi rûmet dibû. Tiştên girîng fêrbûbû. Ticareta bilûriyê wek zimanê bê gotin û rimzan e. Wexteke piştî nîvro li serê qiyamê, wî mirovek dît; mêrik gilî û gazindan dikir, ku piştî hilkişîna qiyamê, ji bo vexwarinê, wî, cîhekî baş neditiye. Xort, zimanê

elametan êdî dizanîbû, ji bo ku pê re biaxife, çû cem patronê xwe:

- Divê em çay îkram bikin ji bo mirovên ji qiyamê derdikevin û tîn, got.

- Gelek cih hene, ku ew li wir ji xwe re çay vexwin, pîremêrî bersiv da.

- Lê em dikarin bi piyalên krîstal çay îkram bikin. Di vê saye de jî, mirovna dê çaya me pir biyecibînin û bixwezin ji xwe re krîstalan bikin.

Tûcar bêyî gotineke peyvekê, dûr û dirêj li karkerê xwe mêzekir. Lê wê êvarê, piştî nimêja mexrebê û girtina dikana xwe, çû li ser sekoya kêleka kolanê rûnişt; piştî ji xortî re got, bila tevî wî were û ew herin nargîlê bikişînin, ev pîpoya ecêb ku Erebi bi kêf û xweşî wê dikişînin ha dikişînin.

- Tu li peyî çi ketiyî? Tûcarê Bilûriyê ji xortî pirs kir.

- Min berî niha gotibû we, ez li peyî çi me. Divê ez miyên xwe ji nûve bikirim. Ji bo na vê yekê jî min pere divên.

Pîremêr ji nûve agir xiste nargîla xwe û ji marpûçê, kûr kûr nefes kişand.

- Ev sî sal in ez vê dikanê dixebitînim. Krîstalên baş û nebaş kîjan in, ez dizanim, hemû ziraviyên ticaretê jî dizanim. Hînê dikana xwe û mûşteriyên xwe bûme. Eger tu bi piyalên krîstal çay bifroşî, kar dê mezintir bibe. Wê çaxê jî divê ez şiklê jiyanê xwe biguherînim.

- Ma ev ne tiştê baş e?

- Ez hînê terza jiyanê xwe bûme. Berî hatina te, dostên min, bîleksê min daîm diguherîn, gava karê wan rind an jî xirab diçû, min xwe bi xwe difikirî, ku ez hemû dema xwe di vê derê de winda dikim. Vê yekê jî ez gelek bi ber xwe dixistim. Niha ez dizanim rewş ne wisa ye. Bi

rastî dikan, tam wek bi ya xeyala min bûye niha. Ez naxwezim biguherim, ji ber ku ez nizanim dê çawa biguherim. Êdî ez bi tevayî hîne xwe bûme.

Xort, nedizanîbû çî bêje. Li ser vê yekê pîremêr axaftina xwe berdewam kir:

- Tu ji bo min bûyî şanseke nelibendî. Tu bûyî lûtfa Xwedayî. Niha ez tişteki dizanim, ku min berî niha ew nedizanîbû. Lûtfa qîymeta wê nayê zanîn, seranser dibe karesateke mezin. Ez êdî ji jiyane çî tişteki hevî nakim. Lê tu min zorê dikî, ku ez li dewlemendiyên heta niha min ew neditîne binihêrim, li berbangên nû binihêrim. Lê ji ber ku niha ez dizanim ev çî ne û derfetên li pêşiya xwe jî dibînim, ji bo vê jî ez ê xwe ji berî xirabtiyê hîs bikim. Ji ber ku ez dizanim, ez ê xwediyê her tiştî bibim û ya rastî ez vî tiştî naxwezim.

Xort fikirî û xwe bi xwe got: "Pir baş e, ku min jî firoşgerê lazûtên qelandî re çî tişteki negotîye."

Gava roj diçû ava, wan hinek dîsa kişandina nargîleya xwe dan berdewam kirin. Di nav xwe de Erebi qisedikirin. Xort pir dilşa bû, ku wî dikarî bi Erebi bi axife. Demekê wisa bawer dikir, di vê dînyayê de, miyên wî dê her tişt fêrê wî dikirin. Lê mî nedikarî Erebi fêrê mirov bikin.

Xort dîsa fikirî, "di vê dînyayê de hîn tiştên din jî divê hebin, ku mî wana nikarin fêrê mirov bikin." Bêyî gotineke peyvek, li Tûcar nihêrî. "Ji ber ku ew jî bilî av û xwarin li tişteki nagerin. Ez bawer im ew fêrê min nakin. Ez fêr dibim."

- Nivîs, Tûcarî got, di dawiyê de.

- Ev tiştî hûn dibêjin, tê çî maneyê?

- Ji bo fêmkirina vê yekê, divê mirov wek Erebi were dînyayê. Lê wergera wê tê mena wek "nivîskirî".

Û gava agirê nargîla xwe vemirand, ji xort re got, ku ew ji mûşterîyan re dikare bi pîyalên krîstal çay îkram bike.

Demên wisa hene ku, mirov nikare hêla herikîna çemê jiyanê biguherîne.

★

Institut kurde de Paris

MIROV LI QIYAMEYA KOLANÊ HILDIKÎŞIYAN Û gava xwe dîgîhandin jorê, xwe westiyayî hîs dikirin. Li serê qiyamê, dikanekê, ku tê de krîstalên her yek ji ya din xweşîktir tê firotan hebû û di vê dikanê de jî, çayên bi pûng ên hindurê mirov fireh dike, dihat îkram kirin. Mirov ji bo çaya bi pûng ên di piyalên krîstal de dihête îkram kirin vexin, yekser diketin dikanê.

- Welle, tiştêkî wisa qet nehat bîra jîna min, digot mêrekî. Îşev çend mîvanên wî dê bihatana mala wî û eger bi van piyalên xweşîk çay vexwaribûna, ew ê pir dîlxweş bibûna; ji ber vê sedemê jî, wî, çend piyalên krîstal dikirîn. Mûşteriyekî din jî, bi navê xwe ew dipejirand û digot, vexwarina çayê di van piyalan de xweşîktir û bi tamtir e, ji ber ku rahiya çayê di van piyalên krîstal de berhewa nabin û naçin. Mûşteriyê sêyemîn jî îdîa dikir, ji ber ku krîstal xwedî hêzeke efsûnî ye, îkramkirina çayê bi piyalên krîstal, edeteke Rojhilatî ye.

Nûçe di demeke kin de belavbû û qafileyên mirovan ji bo dîtîna vî cîhî ku ew nûhatiyek aniye ji bo alema bazirganiyê, dest bi hilkişîna serê qiyamê kirin. Kesên ev tişt dîtî, ew jî dikanên, ku tê de çayên bi piyalên krîstal tene îkramkirin, vekirin, lê ji ber ku dikanên wan ne li ser destê qiyameyekê bû, incax mêşan kom dikirin.

Piştî demeke kin, Tûcarî du xebatkarên din jî girt ji xwe re. Di aliyekî din de jî, Tûcar mecbûr ma û çû rêz bi

rêz pîyalên kirîstal û çêwal çêwal çay kirîn, ji bo
daxwezên jin û mêrên ku ew ti û birçiyên nûhatîyê bûne,
bi têra wan bibersivîne.

Bi vî awayî şeş meh derbas bû.

Institut kurde de Paris

XORT, BERÎ ROJ DERKEVE AVA, HIŞIYARBÛ. JI WÊ rojê ku wî pêlê axa Afrikayê kir û vir de, bi tevayî yanzde meh û neh roj derbas bûbû. Cil û bergên Erebi yên ku wî bi taybetî ji bo vê rojê kiribû, li xwe kir. Tûrbana xwe ya bi xelekeke ji çermê hêştir hatiye alandin, xiste serê xwe. Di dawiyê de sandaletên xwe jî pêkir û bê deng bê deng dakete jêrê.

Bajar hê jî di xewê de bû. Simûteke sûsamî xwar û çayeke ji piyaleyeke krîstal vexwar. Piştî jî, li ser şemûka dikanê rûnişt û dest bi fûrfûrandina nargîleya xwe kir.

Gava wî nargîle dikişand hûndirê xwe, qet tiştek nedifikirî. Ji bilî dengê vinevîna bayê ku bêhna saharê jî bi xwe re tine, qet tiştek nedibihîst. Piştî qedandina nargîleya xwe, destê xwe avête bêrîkeke xwe, tiştek jê derxist û dûr û dirêj lê mêzekir.

Di nav destê wî de pereyek gûmrah hebû. Sed û bîst mî, bilêta vegeerê û rûhseteke ji bo îxracat û îthalata di navbera welatê wî û vî welatî ku ew niha tê de ye... ev pere têra van hemû tiştan jî dikirin...

Bi sebir û bi aram rawestiya, ku pîremêr da were û dikanê vebike. Pêkve çûn, çay vebixwin.

- Ez îro diçim, xortî jî pîremêrî re got. Têra kirîna miyên min, perê min heye. Yê we jî, qasî çûyîna bo Mekkê, perê we heye.

Pîremêrî qet tiştek negot.

- Ez dûayên we yên bi xêrê dixwezim, xort lê zêdekir
û di ser de çû. We alîkariya min kir.

Pîremêrî qet dengê xwe dernexist û çay dem dîkir.
Di dawiyê de piştî lezekê vegeriya ser xort:

- Ez bi te re bi rûmet dibim, got. Te giyanek da
kargeha bilûriyê. Lê ez ê neçim Mekkê, tu vê yekê
dizanî? Eynî mîna ku dîsa tu dizanî, tu ê jî miyan nekirî.

- Kî gote we? xortî bi bêhîtîneke mezin jê pirsîyarkir.

Pîremêrê Tûcarê Bilûriyê, bi kûrtî:

- Nivîs, got.

Û ji bo wî, dûayek xêrê xwend.

*

Institut kurde de Paris

XORT ÇÛ XURFA XWE, TIŞTÊN XWE BERHEV KIRIN. Sê çentên meşîn ên bi dewisandinê ve tijî. Tam li ser rêya veqetînê de bû, yekser dît ku di kuncalek xurfê de heqîba wî ya kevin a şivantiyê disekine. Di rewşeke heyîf de bû, hebûna wê seranser ji bîra wî çûbû. Kulavê xwe tê de dît, kulavê ku gava ew teze hatibû vê derê, wî niyet kiribû, ew ê kulavê xwe bide zarokek ewil li pêş wî derketî. Dema dest avêt heqîbê û xwest kulavê jê derxîne, du kevir jê ketin. Urîm û Tummîm.

Wî, lezeke dirêj keyserê pîremêr fikirî, gava keyser hat bîra wî, sehkir ku ew demeke dirêj e, ev lirastêhev hatina wan nehatibû bîra wî û bi vê yekê re jî, şaşbû ma.

Salek, bê rawestî xebitîbû, ji ber ku bi bi şerm venegere Îspanyê, ji bilî qezenckirina perê bi têra xwe, çi tiştek nefikiribû.

"Xeyalên xwe ti car neterikîne," gotibû kêyserê pîremêr. "Daîm bala xwe bide ser rimzan."

Xort, kevirên Urîm ile Tummîm ji erdê girt û ket nav hîsekê, ku kêyserê pîremêr niha di nêzîkî wî de ye. Ev hîseke xerîb bû. Salek bi tevayî û bi erjengî xebitîbû û hemû elametên çêbûyî, nîşanê didan, ku dema çûyîna wî hatiye.

"Ez ê para vegerim û ji cîhî ku min nîvî de hîşt, dîsa berdewama karê xwe bikim," xort di hindurê xwe de got. "Lê çi heye ku, ez ji miyan Erebi fêr nebûm."

Lê mî tişteki din ê herî girîng fêrê wî kiribûn: Di rûyê erdê de zimanêkî ku her kesek jê fêm bike heye û gava wî dikan dixemiland û kar pêş dixist, wî ji vî zimanî feyde dîtibû. Ev yek zimanê coşî ye, dema ku mirov bi hemû daxweza xwe tişteki dixweze û an jî pê bawer dibe ku ew ê wî tiştî bike, divê bi evîn û coşeke mezin ve dest bi karê xwe bike; ev ziman zimanê vî tiştî ye, vê helwestê ye. Tanca ji bo wî êdî bajarekî biyanî nebû. Xwe bi xwe hîs kir; wî çawa ev bajar fêtiħ kiribû, wisa jî dikaribû hemû cihanê jî fetih bike.

Keyserê pîremêr jê re gotibû; “Dema ku tu tişteki pir bixwezî, ji bo ku tu daxweza xwe pêk binî, hemû gerdûn hevkarîyê dike.”

Lê Keyserê pîr ji wî re, ji dizan, ji çolên bê serî û bê binî, ji kesên ku xewnên xwe dizanin lê ji bo pêkanîna wî çi tişteki nakin, qal nekiribû. Keyserê pîr ji wî re negotibû, Pîramîd bes qûçeke ji kevîran e û her kesek bixweze dikare di baxçê xwe de jî vê qûçê çêbike. Wî jî bîr kiribû, ku jê re bêje, eger we pereyekî qasî du mislî pezên we yên berî qezenê kir, êdî sitandina wan miyan, ji bo we dibe erkeke mezin.

Heqîba xwe berhevker û bi tevî çentên din girt ser milên xwe. Ji derinceyan piyabû; gava mûşteriyên din bi piyalên krîstal çaya xwe vedixwarin, pîremêrî xizmeta mêr û jineke biyanî dikir. Di vê wexta sibê de destpêkeke baş bû. Xort, ji cihê xwe yekemûn car sehkir; porên Tûcarê Bîlûriyê pir bi porên Keyserê Pîr dişiviya. Ew roja ewilî ya li Tancayê ku bê cih, bê welat wisa li rastê mabû û gava ji xewê şiyar bûbû, rastê gîrnijîna tûcarê şekir bûbû; ew gîrnijîn jî bi rastî gîrnijîna keyserê pîr dianî bîra mirov.

"Mîna ku ji vê derê derbas bûye û şopek hîştîye," got xwe bi xwe. "Mîna ku bi rastî ev mirovna hemû jî, di demeke jiyana xwe de rastê wî keyserî hatine." Di serde jî, ma wî negotibû, ez ji aliyê her kesên ku ew Menkiba Şexsî ya xwe dijîn, dihême dîtîn.

Bêyî ku ji Tûcarê Bilûriyê xatir bixweze, ji wir rabû çû. Bê guman dikaribû wî bibîne, lê nedixwest bigrî. Çi heye ku wî dê biriya vê derê, jiyana vê derê û tiştên wî fêrbûyî, kiriba. Êdî gelek ji xwe bawer bû û hiseke bi fetihkirina cîhanê ketibû dilê wî.

"Lê ez ê dîsa herim geliyên berî min ew nas dikirin û li wir pez biçêrînim." Lê, êdî ji ber vê bîryara xwe, wî dilşahiyeke hîs nedikir. Salek seranser xebitibû ku xewnên xwe pêk bîne, lê ew xewin di her lezê de girîngiya xwe winda dikir. Di rastiya xwe de belkî jî, qet xewneke wisa tunebû.

"Kî dîzane, belkî jî mirov bibe kesek mîna Tûcarê Bilûriyê baştir e. Mirov qet neçê Mekkê, lê daîm bi daxweza çûyîna Mekkê bijî." Lê wî, kevîrên Urîm û Tummîmî di nav destên xwe de digirt û van her du kevîran hêz û îradeya keyserê pîr derbasê wî dikir. "Di dawiyê de bûyereke tesadûfî- an jî nîşanek," got xwe bi xwe û hat ber wê qehwexaneyê ku wî hatina xwe ya vê derê ya roja ewil, serî lêdabû. Diz ne li wê derê bû. Patron bardaxek çay anî jê re.

"Dikarim dîsa bibim şivan," got xwe bi xwe. "Ez fêrbûm, mirov çawa divê li miyan binîhêre û ez wana ti car jî bîr nakim. Lê belkî jî, ji vê û şûnde qet derfeta min a ji bo serdana Pîramîdan çênebe. Li ser singê wî pîremêrî de singbereke zêr hebû û wî paşeroja min dizanîbû. Keyserekî rastî bû ew, keyserekî zana."

Di navbera wî û deştên Endûlûsî de, bi avgerê ve, rêyeke bi du saet hebû, lê di navbera wî û Pîramîdan de jî, çolekê hebû. Xortî fikirî, gelo mirov dikare vê yekê bi nihêrîneke cûda jî bibîne. Ya rastî, ew niha du saet kêmtir dûrê xezîna xwe de. Her çi qas ji bo xwe gîhandina vê menzîla du saetan, kêm zêde nêzîkî salek xerc kiribe jî.

"Ez pir baş dizanim, ji bo çi dixwezim xwe bigîhînim miyên xwe. Ev demeke dirêj e, ez wana nas dikim; û ew li ser mirovan nabin barekî, dikarim wan hez bikim; çol xezîna min vedişêre, ez ê saharê hez bikim an na, vê yekê nizanim. Eger min xezîna xwe nedît, dikarim dîsa vegerim welatê xwe. Eve, jiyanê, ew perê ku pêdiviya min pê hebû, bi carekê ve da min û min dem divê û ew jî heye. Baş e, bo çi nebe?"

Yekser di wê lezê de rehaweteke kûr hîskir. Çi wext bixwestiba, wî dikarîbû şivantî bike. Çi wext canê wî bikişandiba, wî dikarîbû bibe froşgerê krîstalan. Belkî jî, cîhanê hê gelek xezîneyên din jî vedişartin, lê wî bes xewnek dîtîbû û bes li rastê keyserekî hatîbû. Û ev yek jî wisa nedihat serê her kesek.

Gava ji qehwê derdiket, pir dilşa bû. Hatîbû bîra wî, yek ji mûtehîten ku ji Tûcar re mal peyda dikir, eşyayên krîstal bi karwanan dianî û karwan jî ji saharê derbas dibûn. Urîm û Tûmmûmên xwe xist destê xwe; bi saya van herdu keviran, eve dîsa dest bi şopandina xezîna xwe kirîbû.

Keyserê pîremêr ji wî re wisa gotîbû;

"Ez li cem wan kesan im ku ew daîm Menkîba Şexsî ya xwe dijîn."

Ji bo ku ew fêr bibe, Pîramîd dûr in an na, eger ew heta imbarê biçûya, ma wî dê çi wînda kiriba?"

YEKÎ ÎNGÎLÎZÎ DI NAV AVAHIYEKÊ DE RÛDINIŞT Û
ji wir, bêhneke giran a heywanên cûrbe cûr, bêhna toz û
xwîdanê dihat. Êdî mirov nedikarî ji vê derê re bêje
imbar; seranser tewla heywanan bû.

"Nexwe min hemû umrê xwe xerc kiriye ji bo
xwegîhandina cîhekî wisa," got xwe bi xwe û bê hemdê
xwe, rûpelên pirtûkeke sîmyatîyê tevdida. "Piştî
perwerdeyeke deh salan min xwe gîhand tewla
heywanan."

Lê divê mirov berdewam bike. Mirov divê baweriya
xwe bi rimzan bîne. Hemû jiyana wî, hemû perwerdeya
wî bes ji bo armancekê bû: Dîtina zimanê yegane û rast ê
ku gerdûn pê diaxife. Di destpêkê de zimanê
Esperantoyê fêrbûbû, piştî li ser dînan lêkolîn kiribû û
di dawiyê de jî bi hemû hêza xwe ve li ser sîmyayê kûr
bûbû. Wî dikaribû bi zimanê Esperantoyî biaxife, li ser
dînen cûda cûda gelek agahiyan berhev kiribû, lê hîna jî
nebûbû sîmyagerekî. Bê guman wî dikaribû gelek
pirsgirêkên mûhim çareser bike. Lê, lêkolînên wî hatibû
asteke wisa, êdî pêşçûna wî ya ji wir û pê de, bê derfet
xûya dibû. Xwestibû bi sîmyagerekî re têkelî çêbike, lê
mixabin di vê de serneketibû. Çi heye ku ev sîmyageran
mrovên pir ecêb bûn, ji bilî xwe ti kesek nedifikirin û
nedixwestin alîkariya wî bikin.

Kî dizane, belkî jî sirê Kevirê Sirî (*) - bi gotineke din Kevirê Felsefê- keşif nekirbûn û ji ber vê yekê jî, xwe xistibûn nav bêdengiyê?

Di rêya lêgerîna vala ya Kevirê Felsefê de beşeke mezin a ji serweta bavê xwe xerc kiribû. Çûbû mezintirîn pirtûkxanên cîhanê û ji wir pirtûkên girîngtirîn û herî nayêditin kiribûn. Di van pirtûkan yekê de xwendibû ku sîmyagerê Ereb ê navdar berî salan Awrûpê ziyaret kiriye. Di vê pirtûkê de dihat nivîsandin, berî zêdetirê du sed salan vî sîmyagerê Erebî, sirê Kevirê Felsefê û Îksîra Jiyana Ebedî keşif kiriye. Vê çîrokê, tesîreke mezin li ser zîlamê Îngilîz çekiribû. Lê eger dostekî wî, piştî gera xwe ya ji saharê, ji wî re behsa vî Erebî, ku hêzên wî yên derveyê derfetan heye, nekiriba; wî ji bawer kiriba, ku ev jî, mîna yên din bes efsaneyek e.

Li "Wehaya Fayoumê" dijî, gotibû. "Mirovan dibêjin, salên wî ji du sedî derbas bûne û qudreta wî heye ku bikare madenek adî vegerîne zêrê."

Îngilîz ji xwe bihuribû û heyecaneke mezin pê girtibû. Li ser vê yekê, hemû peymanên xwe yên wî ji berî de çekirî, xirab kir, pirtûkên xwe yên girîngtirîn hilda û niha li derve karwanekê hebû, ku ji bo derbasbûna ji Saharê amadeyiya xwe dikir û ew jî, di imbareke mîna tewla heywanan de radiwestiya.

Û ew karwan dê ji El-Fayoumê derbas bibûya.

"Divê ez vî sîmyagerê nelet lê hatî, bibînim," Îngilîz got xwe bixwe. Û mirov bêtir dikaribû li ber bêhna heywanan de yax bike.

(1) Bi an gor sîmyageran, kevirê ku madenan dike zêr.(Wer.)

Xortekî Erebi, li ser milên wî çente û tûrên wî, bi wî halî ket nav avahiya ku Îngilîz tê de ye û silavek da wî.

- Tu bi kû ve diçî, xortê Erebi jê pirsî.

- Ber bi çolê ve, got Îngilîz û bersiv da; û dişa li ser xwendina xwe ponijî. Di vê lezê de wî nedixwest bi kesek re qise bike. Bê guman Sîmyager hatiba û wî îmtîhan kiriba, ji ber vê yekê jî diviya wî hemû perwerdeyên xwe yên di deh salan de fêrbûyî, ji nû ve bianîba bîra xwe.

Xortê Erebi jî pirtûkek derxist û dest bi xwendinê kir. Pirtûk bi Îspanî hatibû nivîsandin. "Şansekî!" got Îngilîz xwe bi xwe. Îspanîya wî ji Erebiya wî baştir bû û eger ev xort jî biçûba Fayoumê, gava wî tiştên mûhîm nedikir, nexwe wî dikaribû bi yekî re sohbet bike.

"PIRXERÎB" XORT XWE BI XWE GOT, GAVA WÎ merasîma cinazê ya ku di despêka çirokê de cîh girtibû, ji nû ve dixwend. "Hema hema ev du sal in, min dest bi xwendina vê pirtûkê kiriye, lê dîsa ji min nekarî ji van rûpelan wê de biçim." Her çi qas li cem wî, kêyserekî, ku li ber xwendina wî astengî bike, tunebe jî, wî nedikarî bala xwe li ser pirtûkê kom bike. Lê wî niha tiştekî girîng fêhm dikir: Biryardana tiştekî ji bilî destpêkê çi tiştekî nîn e. Gava mirov biryara tiştekî dide, ber bi hêlekê, ber bi herikîneke bi şidet dikeve û diçe, ku di destpêkê de mirov ev tişt na nizane û ti car nayne bîra xwe jî.

"Gava min li xezîna xwe digeriya, qet nehatibû bîra min ku ez ê di kargeheke bilûriyê de bixebitim," got xwe bi xwe û bi awayekî xwe tesdîq bike. "Wek vê, ev karwan belkî li an gor biryara min e, lê gûzergeha wê daîm wek sirekî bimîne."

Li hember wî, ew jî mîna wî pirtûk dixwîne, yekî Awrûpî hebû. Yekî bê meymenet bû. Gava ew ketibû hindur, wî Awrûpî bi pîçûktayî lê nihêribû. Belkî jî wan dikaribû bibin dostên hevûdu, lê ewê Awrûpî bi yekser bê deng bûbû.

Xortî pirtûka xwe girt. Wî nedixwest çi tiştekî bike ku di kiryara wî û ya Awrûpiyan de mînahevbûnek bihête dîtin. Wî jî bêrika xwe Ûrîm û Tummîmên xwe derxistin û bi kevîran re dest bi listîkê kir.

Biyani qêrînek avêt:

- Ev Urîm û Tummîm!

Xortî ji nişka ve kevirên xwe xist bêrika xwe.

- Ne ji bo firotanê ne, got.

- Bi tişteki jî nakin, got zilamê Îngilîzî. Ser û binî du krîstalên zinaran, hemû jî ev in. Di rûyê erdê de bi milyonan krîstalên zinaran hene, lê ji bo kêsên jê fêhm bikin, evna Urîm û Tummîm in. Min nedizaniyê, di vê herêma cîhanê de, di van deran de ew bêne dîtin.

- Keyserekî, ev diyari dane min, xortî jê re got.

Biyani heyirî û ma. Paşê destê xwe xist bêrika xwe û bi ricifînê ve, du kevirên mîna wan derxist.

- We behsa keyserekî dikir, got.

- Wek hûn bawer dikin ku keyserekî ti car bi şivanekî re qise nake, got. Ev car jî, wî dixwest axaftinê bide birîn.

- Bilekîs. Di dema xwe de qet kesek nexwest keyserî nas bikin, çi kesek qiymet neda wî, lê şivanan, yekemîn kes bûn ku li ber wî rêz girtin.(*). Ji ber vê hindê, di axaftina keyseran û şivanan de qet xerîbiyek tune. Û wî guman hebû ku xort wî baş fêhm bike, lê zêde kir:

- Di Încilê de derbas dibe. Çêkirina ev Urîm û Tummîmî, ez ji vê pirtûkê fêrbûm. Ev kevir hacetên kehanetê ne ku Xwedayî, îzna vê yekê bes daye van. Kêşeyan di binê singbereke zêrîn de ev keviran bi xwe re digerandin.

Xortî bi yekser xwe pir dilşa hîskir ku ew niha li vê derê ye.

(*) Di Beşa Încila Mattayê de, referans tê şandin ji bo mûnecimên (şivan) behiskirî.

Keyserê ku di nivîsê de derbas dibe jî, Îsa Pêxember e. (Wer.)

“Belkî jî ev yek îşaretek e,” got zîlamê Îngîlîz, mîna ku bi dengêkî bilind difikirî.

- Kî ji we re behsa îşaretan kir?

Elaqeta Xortî her dem zêdetir dibû.

- Di jiyanê de her tişt îşaretek e, got zîlamê Îngîlîz û kovara xwe ya ku wî ew dixwend, girt. Gerdûn bi zîmanekî ku her kesek jê fêhm dike hatiye afirandin, lê mirov ev zîman jî bîr kirîne.

Bi tevî gelek tiştan, ez li vî Zîmanê Gerdûnî digirim. Ji ber vê yekê ez li vê derê me. Ji ber ku divê ez yekî ku jî vî Zîmanê Gerdûnî têdîgihîje, bibînim. Sîmyagerekî.

Qisedana wan jî aliyê rêvebirê imbarê hat birin.

- Şansê we heye, got zîlamê Erebbî qelew. Piştî nîvro karwanekê ber bi El-Fayoumê bi rê dikeve.

- Lê ez ê biçim Misrê, xortî jî wî re got.

- El Fayoum jî li Misrê ye, got mirovê qelew û ew bersivand. Di te de jî Erebbîyeke ecêb heye!

Xortî jî wî re got ku ew di eslê xwe de Îspanî e. Îngîlîz bi vê yekê pîr şabû: Bi cil û bergên Erebbî be jî, qet nebe yekî Awrûpî bû.

- Mêrik, îşaretan wek “Şans” bi nav dike, got zîlamê Îngîlîz, gava Erebbî qelew derket der. Eger jî min hatiba, min ê li ser “şans” û “tesadûfî” ansîklopediyek binivîsiya. Zîmanê Gerdûnî bi van bêjeyan tê nivîsandin.

Paşê qisedanên xwe berdewam kirin. Îngîlîzî, jî xortî re got, “Ev yek ne tesadûf e ku Êrîm û Tummîm di destê te de ne û min jî bi vî awayî tu dîtî.” Paşê jê pîrsî, gelo ew jî li yekî sîmyager digere an na.

- Ez jî bo lêgerîna xezînekê diçim wîra, xortî jî wî re got û bersiv da û li ser vê gotina xwe jî yekser poşman bû.

Lê Îngîlîzî wisa xwe dida diyarkirin ku qeyê wî hîç
ehemiyet nedaye vê bersiva vî xortî.

- Bi aliyekî ve, ez jî, got.

Gava berpirsiyarê imbarê ji derve gazî wan dikir,
xortî wisa gote wî:

- Lê ez nizanim, sîmya tê çi menayê jî.

Institut kurde de Paris

"EZ SERÊ KARWANÊ ME," GOT ZILAMEKÎ ÇAVREŞ û rişdirêj. Mafê min ê mirinê û mayînê heye li ser her kesên ku ez rêberiya wan dikim. Ji ber ku Sahar li ew jinên ku car carna mêran dibehêcinin, dişive.

Li hawîldor nêzikî du sed kes û qasî du mîslê wan jî heywan hebûn. Hêştirên hecîn, hesp û hêştir û teyran. Jin û zarok jî hebûn, gelek mirov jî bi xwe re, an li ser piştê xwe şûr, an jî li ser milên xwe sîleh digêrandin. Zilamê Îngîlîzî jî birrek sandûqên rêwîtiyê bi xwe re anîbûn û di wan de gelek pirtûk hebûn. Li meydana here gureyek hebû ku qet nepirsîn. Rêberê Karwanê jî, ji ber ku her kesek baş têbigihîjin, xîtabeta xwe çend caran dubare kir.

- Li vê derê mirovên jî her netewan hene û di dilê van mirovan de xwedayên cûrbe cûr hene. Yek Xwedayekî min heye û ew jî Allah e û ez bi navê Allah sund dixwînim ku ji bo careke din ez saharê mexlûb bikim, çî tiştê baştirîn jî destê min were, ez ê bikim. Ema we lakîn, ez dixwezim bila her kesek bi navê Xwedayê xwe û jidil sund bixwînin ku di her şert û mercê de divê fteata min bikin. Lewra neîteatî ya di çolê de mîna mirin e.

Di ajeweyî de pisepiseke bi ûrînî dest pê kir û çû. Her kes bi şahidiya Xwedayê xwe û bi liblibandina lêvên xwe sund dixwendin. Xort jî bi navê Îsayî sunda xwe xwend. Îngîlîz qet devê xwe venekir. Miremirîniya wan

dirêjtir bû ji dûayek basît dirêjtir bû. Mirov, ji bo ku Xweda wan teksîr bike, dua dikirin.

Dengê dûr û dirêj ê borîzenek hat û her kesek li sûwarkên xwe sûwarbûn. Xort û zîlamê Îngîlîzî, ji bo sûwarbûnê, ji xwe re hêştir kiribûn, ji ber vê hindê jî, di sûwarbûna heywanen de gelek dijwarî kişandin. Xort, gunê xwe bi hêştirê Îngîlîzî anî, ji ber ku wî birrek sandûqên pirtûkan li heywan barkiribûn.

- Tesadûfî tune, got Îngîlîz, bi wî awayî axaftinên xwe yên ku li imbar di nîvî de hiştibûn, da berdewam kirin. Hevalekî min bû sedem û ez hatim vê derê, ji ber ku wî hevalê min yekî Ereb nas dikir û ew Ereb...

Lê karwan dest bi rê kiribû û êdî dengê wî nedihat bihistin. Xort pir baş dizanibû ku naveroka behsê çî ye: Girêdaneke sirî, zincîreke sirî tiştek bi tişteki din ve girê daye, di tercîhkirina şîwantiyê de tesîr li ser wî çekiriye, bûye sedem ku ew eynî xewna xwe bi çend caran bibîne û were bajarekî nêzikî Afrikayê, li rastê keyserekî bibe û paşê ji aliyê dizekî were şêlandin û bi vî awayî jî tûcarekî bîlûriyê nas bike, ûwd...

Xortî xwe bi xwe got, "Mirov dema nêzikî xeyala xwe bibe, Menkiba Şexsî ya mirov dibe sedema rastî ya jiyana xwe."

Karwan, berev rojhilatê bi rê ket. Bi hemû roj dimeşîyan, gava roj dest bi harbûnê dikir, diqeland; wan bihnek didan, piştî gava roj hinek dadiket, wê çaxê jî dîsa dest bi meşê dikirin. Xort bi zîlamê Îngîlîzî re, ku wî di rê de daîm pirtûk dixwendin, pir qise nedikir.

Ji ber vê sedemê bala xwe da ser însan û heywanên ku li çolê û di nav bêdengiyeke kûr de dimeşin. An gor ew roja ku wan dest bi rê kiribûn, niha her tişt pir cûda

bû. Wê rojê, hay hûy, qêrîn û qîjîn, zarîna zarokên biçûk, hîrîna hespan tevlihev dibûn û di nava vê qeremolîyê de emrên bê sebir ên rêber û tûcaran dihat bihîstin.

Lê di saharê de ji bilî vînevîna bagerê û dengê lingên heywanan qet tişteki tunebû. Rêber jî êdi di navbera xwe de qise nedikirin. Êvarekê;

- Tu ew rastberên qûmê dibînî, eve ez bi gelek caran ji wan deran derbas bûme, hêştirvanekî got. Lê çol ew qas berfireh û aso ew qas dûr e ku, mirov xwe piçûcîk hîs dike û bêdeng dibe, nikare devê xwe veke.

Xort heta niha qet çol neditûbe ji, wî fêmkir, hêştirvan dixweze çî bêje. Ji ber ku ew çî wext li behrekê, an jî li agirekî binihêre, di nava kûraniyên hêz û bêdûmahîya bûyerên xwezayê de diponîjî û bêyî vekirina devê xwe, wî, bi saetan jî dikaribû wisa biraweste.

"Ez ji miyan û krîstalan gelek tiştan fêrbûm," got xwe bi xwe. "Mîna vê, ez dikarim ji çolê jî gelek tiştan fêr bibim. Ji ber ku hem pîrtir û hem jî zanatir e."

Bayekî bê sekan dihat. Li Tarîfayê, gava li ser sûran rûnîştibû, di rûyê xwe de bayek hîs kiribû, têgîhîşt ku ev ba û ew ba eynî ne. Belkî ev eynî bayê hanê, niha rûyê miyên ku ji bo av û xwarin di gelîyên Endûlûsê de digerin, mizdide û derbas dibe.

"Êdi ew ne miyên min in," got di hindurê xwe de, bêyî ku hesretîyeke rastî bikişîne. "Ew hînê şivanekî din bûn û bê guman niha wan ez ji bîr kirime jî. Ev yek baştir e. Kesên mîna pez hînê gerê bûne, dizanin dê rojek dema veqetîne dihêt.

Piştî qîza tûcarî ket bîra wî: Bê guman ew niha jî mêj de zewîcî bû, yeqîn wisa bû. Belkî bi yekî firoşgerê lazûtên qelandî re, an jî bi şivanekî re, ku ew xwendin dizane û dikare jê re çîrokên xweşik bêje. Ma ew tenê

dikare ev tiştina bike. Lê ev pêşhîsîna wî, hindurê wî ser û bin kir.

Ew bi xwe jî belkî niha wî zimanî ku ew şahidiya paşeroj û îroja hemû mirovan dikir, fêrdibû. Dayka wî daîm digot "hîsên pêş." Wî êdî dest bi têgîhiştinê kiribû; çemekî jiyanê hebû û di vî çemî de jiyanên hemû mirovan bi hev re dihatin girêdan û dibûn yek; eve hîsên pêş ew tişt e, ku giyanên mirovan jî nişka ve li herikîna gerdûnî ya vî çemî diqulibe. Ji ber ku her tişt hatiye nivîsandin, me dikaribû her tişt bizanibana.

- Nivîs, got û Tûcarê Bilûriyê anî bira xwe.

Çol di hîn deveran de bi qûm, hîn deveran de jî bi kevîran ve sergirtî bû. Karwan gava rastê komeke mezin a zinaran bihata, li dora wê dizivirî; eger rastê komeke kevir û berên biçûk bihata, wê çaxê jî sinora wê komê dişopand. Gava dihatin cîhên bi qûmên pir zirav, ku ev qûm jî bo piyên hêştiran ne baş bû, bihureke din a bi qûmên saxlem digeriyan. Car carna, rastê newalên gola zihabûyî û bi xoyê ve sergirtî bûyî dihatin. Heywan pir zehmetî dikişandin û mirovna jî, ji heywanan piya dibûn û alîkariya meşa wan dikirin. Wê çaxê, barên xwe hildidan ser piştê xwe û cîhên bi xeter derbas dibûn û paşê jî, dişa barên xwe li heywanên xwe dikirin. Eger rêberekî mirîba an jî nexweş ketîba, wê çaxê hêştirvan dihatin cem hev û pişk dikişandin.

Lê bes sedemeke van tiştên hemû hebû: Karwan bi tevayî bi armançê ve girêdayî bû, ji ber vê yekê jî, ew qas pir ehemiyeta ger û vegera wê tunebû. Gawa hemû astengî dihatin derbaskirin, stêrê ku ew diyar dike weha li kîjan hêlê ye, di ber wê de dixûya. Û gava mirov sibe zû di asîmanê de stêreke helgiri bidîtana, wan dîzanîbûn,

ev stêrk cîhî ku li wir jin, av, palmiye û xurme hene, rayê wan dide. Bes wî Îngilîzî ev tişt seh nedikirin. Zêdetir, wî di van rewşan de pirtûkeke xwe dixwend.

Di rojên ewil ên rêwîtiya xwe de, pirtûkeke wî xortî jî hebû û ji bo xwendina pirtûkê, wî çend caran xwe ceribandibû. Lê ji bo wî, temaşekirina karwanê û guhdarkirina dengê bahoze balkêştir û hêjatir bû. Gava wî dest bi naskirina hêştirê xwe bû û bêtir nêzikî bû, xwendina pirtûkê terikand. Li gel vê yekê, baweriyeke wî ya ecêb jî hebû: Wî çî wext rûpelên vê pirtûkê vekiriba, wisa bawer dikir ku niha mirovekî girîng rastê wî tê.

Di dawiyê de, bi hêştirvanekî re bû dost, ku ew daîm bi wî re digeriya. Gava dibû êvar û ji bo bihindanê agir vêdixistin, wî jî dostê xwe re behsa çirokên xwe yên ecêb ên di dema şivantiya xwe de dikir.

Hêştirvanî di sohbetekê de ji wî re dest bi qala jiyana xwe kir.

- Ez di gundekî nêzikî El-Qahîrê de rûndiniştim, got. Bostaneke min, zarokên min û jiyaneke min a heta dawiya umrê min dê neguheribe, hebû. Salek, berhemên zewiyên min jî her salî pir zêdetir bû û ez jî çûm ziyareta Mekkê. Min jî bi vî awayî farîzeke xwe bi cih anîbû. Êdî bi dilrihetî min dikaribû pêşwaziya mirinê bikim û ji ber ku bimirim, ez ê pir dilşa jî bibûma.

Rojekê, erd dest bi ricifinê kir û Nîlê bi lehî ji cîhê xwe qetiya, ser re çû. Min heta wê çaxê difikirî, ev tişt bes tê serê kesên din, lê ev car hatibû serê min jî. Cînarên min ditirsiyan ku darên zêtûn ên baxçê wan dê bi avê de here, jîna min ditirsiya ku zarokên wê di avê de bixenikin. Ez jî ketim nav tirseke mezin; ku ez ê hemû tiştên xwe yên ez xwediyê wan in, wînda bikim.

Lê çareya vî tiştî tunebû. Çi tişteki nemabû ku êdî ji axê were girtin, ez jî li çareyeke din geriyam. Niha hêştirvantî dikim. Lê di saya vê bûyerê de min kelâma Xwedayî fêm kir. Kes divê ji nayêzanînê netirse, ji ber ku her kes dikare tiştî ku dixweze û pêdiviya xwe bi wî heye, bi dest bixe.

Dixwezî jiyana me be, dixwezî zeviyên me yên ajotinê be, em ji windakirina tiştên xwe yên ku em xwediyên wan in, ditirsin. Lê gava me fêmkir, çîroka jiyana me û diroka cîhanê ji aliyê heman dest hatiye nivîsandin, gava me ev yek fêmkir, tîrsa me jî difire û diçe.

*

CARAN, DI BÎHINDANÊN ÊVARIYAN DE KARWAN rastê hev dihatin. Mîna ku her tişt ji aliyê destekî evrayî hatiye nivîsandin, pêdiviya karwanekê, yeqîn di ya din de dihat dîtin. Hêştirvan di derbarê bahozên saharan de agahdarî didan hev û di dora agir de rûdiniştin û ji hevûdu re çîrokên saharê digotin.

Caran, mirovên sirrî yên rûyên wan bi pêçiyayî jî dihatin: Evna Bedewî bûn û rêyên karwaniyan dişopandin. Di derbarê rêbir û eşîrên asî de agahdarî didan wan. Xwe li cellabyayên(*) bi rengê tarî û kefiyên(**)xwe yên ku bes çavên wan jê dixûyê, dipêçan û bê deng bê deng dihatin û diçûn.

Di van şevên yekê de xort û Îngîlîz pêk ve li dora agir rûniştibûn û ew hêştirvan jî hate cem wan:

- Dibêjin, di navbera qebîleyan de şer derketiye, got.

Her sê jî, yekser bêdeng bûn. Her çi qas kesî devê xwe venekiribe û çi tiştek negotibe jî, xortê Îspanî pir baş seh fikir ku tirseke mezin li hawîldor pêçaye. Wî careke din zimanê bê gotin, Zimanê Gerdûnî têgîhiştibû.

Piştî demekê, zîlamê Îngîlîzî jê pirsîyarkir, gelo xeteriyekê heye an na.

(*) Cilên bi serpûş û mildirêj, li Afrîka Bakûr, mêr û jin li xwe dikin.

(**)Serpûşên bi guncil yên mêrên Ereb. (Wer.)

- Ji bo kesên li çolê ketî, êdî çi veger tune, hêştirvanî got û bersiv da wî. Ji ber ku nikare vegere, nexwe çare ne li paş e; baştirin ew e, ew ê çawa bi pêşkeve, divê ew rê bihête dîtin. Xeterî jî tê de, êdî her tişt di nav texdîra Xwedayî de ye.

Û axaftina xwe bi bêjeya efsûnî, bi "Nivîsê" ve kuta.

- Divê hûn bala xwe baş bidine karwanan, xortî ji Îngîlîz re got, gava hêştirvan jî wan weqetiya. Rêyeke bi fitil dişopînin, lê her diçin digihîn eynî noxtê.

- Divê hûn jî di derbarê cihanê de hîna pir tiştan bixwînin, zîlamê Îngîlîzî got û bersiv da xort. Pirtûk jî, heman li karwanan dişivin.

Rêzên dirêj ên mirov û heywanan, jî vê û pê de bi leztir dest bi pêşveçûnê kirin. Êdî bédengî, ne tenê bi roj hukim dikir. Êvaran jî, ew wextên ku mirov hîne sohbetkirina li dora agirî bûbûn jî, hêdî hêdî bédengiyekê hukim dikir. Rojekê, ji bo ku pir diqet neyê kişandin, serokê karwanê biryar da û got; êdî agir neyê vêxistin.

Li ser vê yekê, mirov jî ber ku necemidin, di navbera heywanan de dicivîyan û pêk ve xew dikirin. Serokê karwanê jî bilî van tedbîran, li der û dora cihê rawestîne nobedar danîn.

Di van şevan yekê de, Îngîlîzî ku xewa wî nedihat, çû cem xortê Îspanî û bi hev re di nav qûmîyan de geriyan. Di şevê de hîveke pazne hebû. Xortî hemû çîroka jiyana xwe ji Îngîlîz re got.

Îngîlîzî, baleke mezin da ser wê dema firoşgeha bîlûriyê, ku piştî destpêkirina xebata xortî, kar wisa roj bi roj pêşketibû.

- Her tişt jî aliyê qaîda bîngehî tê birêvekirin, got. Di sîmyayê de jî vê re dibêjin Rûhê Gerdûnê. Gava em bi

hemû dilê xwe ve tiştêkî bixwezin, bêtir nêzîkî Rûhê Gerdûnê dibin. Hêzeke heyînî ye.

Ji bilî vê, ev tişt ne cûdahiyêke taybetî ya mirovan e, got: Dixwezî madenek, dixwezî nebatek, dixwezî heywan an jî fikirek be, di cihanê de rûhê her tiştêkî heye.

- Her tiştên li ser û li binê axê, bê rawestîn diguherin, ji ber ku ax jiyande ye û rûhekî wê heye. Em parçeyek ji vî Rûhî ne û em pir kêr dizanin, ku ew ji bo çêyiya me dixebite. Divê hûn fêr bikin, di serkeftina we ya li kargeha bilûryê, para wazoyan jî hebû.

Xortî, gava li hîvê û qumê temaşe dikir, bi lezekê, bédeng sekinî û qise nekir.

- Min bala xwe da ser karwana, ku li saharê dimeşe, got di dawiyê de. Karwan û çol heman zimanê qise dikan, çol ji ber vê yekê izna pêşketina karwanê dide. Saharê, ji bo ku têbigihîje, gelo karwan bi wê re û bi tevayî di nav lihevbûnekê de ye an na, ew hemû gavên karwanê hîs dike; û eger rewş wisa be, karwan dê xwe bigihîne wehayê. Lê, kesek di nav me de, çi qas cesûr dibe bila bibe, eger ji vî zimanî fêr nekiriba, hê di roja ewilî de dimir.

Bi hev re li ronîya hîvê temaşe kirin.

- Hêza rimzan, xortê Îspanî got û axaftina xwe berdewam kir. Min dît ku rêberên me îşaretên saharê çawa dixwînin, min dît, rûhê karwanê bi rûhê saharê re çawa qise dike.

Piştî lezekê, Îngilîzî dest bi axaftinê kir:

- Bi rastî, divê ez hînek dîsa bala xwe bidim ser karwanê, got di dawiyê de.

Xort jî;

- Divê ez jî pirtûkên we bixwînim, got û bersiv da wî.

EV PIRTÛKÊN PIR ECÊP BÛN. BEHSA CÎWA, XOY, ejdiyar û keyseran dikirin, lê wî qet tiştek jê fêm nedikir. Lê di hemû pirtûkan de ramanekê daîm dubarekirî hebû. Her tişt, nîşana tişteki yek û tek e.

Wî, ji van pirtûkan yekê fêrbû, ku girîngtirin nivîsa sîmyayê ji çend rêzan avabûye û ew ji li ser zûmrûtekê hatiye nivîsandin.

- Lewha Zûmrût, got Îngilîzî û xururek hîskir di hindurê xwe de, ji ber ku wî tiştek hînê hevalê xwe kiribû.

- Madem wisa ye, bo çi ew qas pir pirtûk hene?

- Ji bo nirxandina çend rêzan, got Îngilîzî. Lê esil wî ji bi vê bersiva xwe pir bawer nedikir.

Pirtûkekê, pir meraqa xortî kişandibû û di vê pirtûkê de jî, çîroka jiyandî sîmyagerên bi nav û deng cîh girtibû. Sîmyager ew kes bûn, ku wan hemû jiyana xwe di labaratûwaran de ji bo safîkirina madenan xerc kiribûn; wan bawer dikir, eger madenek bi salan li ser agir were pijandin, ew ê hemû taybetiyên xwe winda bike û di dawiyê de bes Rûhê Gerdûnê bimîne. Ev Tiştê Evrayî mecal dida sîmyageran, ku ew her tiştên li ser rûyê erdê fêm bikin. Ji ber ku ev Tiştê Evrayî zîmanekî bû û bes bi hêza vî zîmanî ve, di navbera hemû hebûnên gerdûnê de têkelîyek dihat avakirin. Sîmyager, ew bi Marîfeta Mezin an jî, Afîrîna Mezin bi nav kiribûn û ev keşif ji du beş hatibû avakirin: Avî û hişkî.

- Ji bo tégîhiştina vî zimanî, gelo çavdêriya mirovan û rimzan ne bes e? xortî jê pirsîyar kir.

- Xeletiyeke we heye, hûn dixwezin her tiştî basît bikin, Îngilîzî got, bi hêrsekê ve û bersiva wî da. Sîmya karekî cidî ye. Divê tu hemû konaxên pêvajoyê, wek hostayan fêrê te kirî, bişopîni. Xort tégîhişt ku ji bo beşa avî ya Avahiya Mezin, Îksîra Jiyana Ebedî té gotin. Vê îksîrê bi tenê hemû nexweşîyan sax nedikirin, di eynî wextê de jî wê nedihîşt sîmyager pîr bibin. Ji bo beşa wê ya hişkî jî, Kevirê Felsefê dihate gotin.

- Dîtina Kevirê Felsefê, ne wisa karekî hêsan e, got zîlamê Îngilîzî. Sîmyageran, ji çavneîriya agirî ku madenan safî dikin, bi salan di labaratuwaran de diman. Wan xwe ew qas dabûn nihêrîna agirî ku, di wêjdanên xwe de, xwe jî nîrxên fanî yên cîhanê rizgar dikirin. Û di dawiyê de wan jî fêm dikir ku bi safîkirina madenan, esil giyanên xwe safî kirine.

Di wê demê de Tûcarê Bilûriyê hat bîra wî. Tûcarê Bilûriyê, ji bo ku ew herdu jî, ji fikrên xirab xilas bibin, jê re gotibû, paqijkirina wazoyên krîstal tişteki qenc e. Xortî, hêy diçû bawer dikir, divê mirov sîmyageriyê jî jiyana rojane fêr bibe.

- Di ser de jî, Îngilîzî got û axaftina xwe berdewam kir, bi tevayî, taybetiyeke derê derfeta Kevirê Felsefê heye. Ji bo ku girseyeke mezin a madenek adî vegeirîne zêrê, parçekî biçûk ê vî kevirî bes e.

Ji wê demê û şûnde li ser sîmyayê, mereqa xortî roj bi roj mezintir bû. Wî difikirî, eger hinek sebir bike, ew dikare her tiştî vegeirîne zêrê. Çîroka jiyana kesên ku wan ev yek pêk anîne, xwend: Helvetius, Elias, Fulcanelli, Geber. Ev çîrokan pîr bi tesîr bûn. Hemû jî, Menkîba Şexsî ya xwe heta dawî dijiyan. Rêwîti dikirin, bi

zanayan re hevdiñinan çêdikirin, li ber çavên bêbaweran de mûcîzeyan diafirandin, Kevirê Felsefê û Îksîra Jiyana Bêdawî bi dest xistibûn.

Lê gava wî teşebûs dikir, rêgeha gîhîştina sîmyayê fêr bibe, bi tevayî diheyirî û dima. Di vê behsê de ji bilî nexşan, agahiyên bi şîfre û nivîsên ku menayên wan pir tarî ne, çî tişeteki tunebû. Êvarekê;

- Ji bo çî zimanekî wisa qet nayê fêmkirin, bi kar tinin? xortî ji zîlamê Îngîlîz pirsî.

Di vê navberê de wî sehkir, Îngîlîz wisa bêmade dixuyê, mîna ku wî bêriya pirtûkên xwe kiribû.

- Ji bo ku ew dixwezin, bes ew kesên ku bi têra xwe berpirsiyarî hîs dikin, bes ew kesan bila wan fêmbike, got Îngîlîz. De bifikire, hema her kesek rabe û qirşûnê vegeirîne û wê bike zêr. Piştî demekê êdî qiymeta zêrê qet namîne. Bi tenê kesên bi iynad, vekolînerên bi deyx dikarin di pêkanîna Avaya Mezin de bi ser kevin. Sedema bûna min a li vê çolê jî ev yek e. Ji bo ku ez bi rastî sîmyagerekî baş bibinim, ku ew ê di xwendina şîfreyan de alîkariya min bike.

- Ev pirtûk çî wext hatine nivîsandin? xortî jê pirsîyar kir.

- Berî çend sedsalan.

- Di wan deman de hîna çapxane tunebûn. Ne mûmkûn bû, her kesek xwe bigîhîne agahiyên sîmyageriyê. Lê baş e, armanca vî zimanê ecêb, armanca ev rimzan çî ne?

Li gel van zordanên xortî jî, Îngîlîz qet bersiv neda. Wî got, ku ev çend roj in, wî karwan temaşe kiriye û qet tiştek nû keşif nekiriye. Lê bes tiştêkî keşif kiribû: Behsa şer roj bi roj pirtir dibû.

ROJEKÊ, XORT, PIRTÛKÊN ZILAMÊ ÎNGÎLÎZÎ LÊ
vegerand û da wî.

- Gelo hûn pir tişt fêrbûn an na? got Îngîlîzî bi
meraqeke bê aramî û jê pirsî. Ji bo ku xwe ji tîrsa şerê
rizgar bike, pêdiviya wî bi axaftina bi yekî re hebû.

- Ez fêrbûm, rûhekî Gerdûnê heye û ew kesên vî rûhî
têdigihîjin, dikarin zimanê hebûnan jî têbigihîjin. Ez
fêrbûm, gelek sîmyager Menkîba Şexsî ya xwe dijîn û di
dawiyê de Rûhê Gerdûnê, Kevirê Felsefê û Îksîra Jiyana
Bêdawî keşif dîkin.

- Bi taybetî jî ez fêrbûm, ku ev tişt pir hêsan in û
mirov dikare wana li ser zûmrûdekê jî binivîsîne.

Îngîlîz ket nav xeyalşikestinekê. Perwerdeya bi salan
bihurî, rimzên efsûnî, peyvên ku bi dijarî têne fêrkirin,
hacetên labaratuwarê, hemû ev tiştina, qet yek jî tesîr li
ser xortî çênekiribûn. Xwe bi xwe got, "Rûhekî wî ya ne
terbiyekirî hebe divê, qasî ku van tiştan nikare fêrbibe."

Pirtûkên xwe girt û xist nav çentên xwe yên li
semara hêştirê daliqandî.

- Biçin û ji xwe re çavdêriya karwanê bikin, got.
Karwana we jî tişteki girîng fêrê min nekir.

Xortî, dîsa dest bi temaşekirina ewraziya bêdeng a
çolê kir; qûm, gava heywan dimeşîyan, berhewa dibûn û
wî jî, ev rewşa qûmê temaşe dîkir "An gor qewlê her
kesek, rêgeheke fêrbûnê heye," digot û dubare dîkir xwe
bi xwe. "Rêgeha fêrbûna wî, rêgeha fêrbûna min nîn e;

rêgeha fêrbûna min jî ya wî nîn e. Lê ew jî, ez jî, em herdu jî, li Menkiba Şexsî ya xwe digerin; ji ber vê yekê ez li wî rêz digrim.

Institut kurde de Paris

KARWAN ÊDÎ HEM BI ROJ, HEM JÎ BI ŞEV DIMEŞIYA. Nûçebirên rû pêçiyayî êdî roj bi roj zêde dibûn. Hêştirvanî ku di van deman de xwe li ber xortî wek dost dida xûyakirin, jê re gotibû, di navbera qebîleyan de şerekî derketiye. Eger wan di wextê de xwe bigîhandibana wehayê, şansê wan dê hebûya.

Heywan ji ber westanê helaq bûbûn û mirov jî, hê diçû bêdeng dibûn. Bêdengî li şevan erjengtir bû. Bi taybetî, dema ku orîna hêştirekî, tirseke mezin dixist hawildorê (lê berî niha, ev yek bes orîna hêştirekî bû û tişteki ihtiyadî dihat qebûlkin).

Lê dîsa jî, hêştirvan, mîna ku ji tehdîta şerê pir tesîr bûye, nedixûya.

- Ez dijm, got ji xortî re. Xurme dixwar û kamp jî, di şeveke bê hîv û bê agir de bû. "Û ez eger tişteki bixwim, ji xeynî xwarinê çî tişteki nafikirim. Dema ez dimeşim jî, bes meşê difikirim, hemû ev yek e. Eger ez mecbûrê şerkirinê bim, mîrin ev roj hatiye, an jî ew roj... ji bo min ne xem e. Ji ber ku ez ne di paşerojê de û ne jî di pêşerojê de dijm. Bes dema min a niha heye û bes ev yek mijûlayiya min e. Eger tu bikaribî daîm di dema niha de bijî, wê çaxê tu ê bikaribî bibî mirovek dilşa. Tu ê têbigîhîjî ku li saharê jiyan heye, li asîmanê stêrk hene û şervanên qebîleyan jî, ji ber ku di naveroka jiyana mirovê de heye, şer dîkin. Wê çaxê jiyan dê bibe cejin, dê bibe

şênayî, ji ber ku jiyan ji dema jiyandebûna me îbaret e û bes ev e."

Piştî du rojan, xort gava di xew re diçû, li stêrê ku hêlên meşê dide diyarkirin, nihêrî. Mîna ku aso hîn nêzîktir bûbû, li ser çolê ji bi sedan stêr hebûn.

- Ew der weha ye, got hêştirvanî.
- Madem wisa ye, em çima bi zû ve naçin wê derê.
- Ji ber ku divê em binivin.

★

Institut kurde de Paris

GAVA ROJ JI SER ASOYÊ BER BI JOR BILIND DIBÛ xortî çavên xwe vekir. Li hember wî, li cihî ku şevê, stêrk li wê derê dibiriqîn, rêzên darên xurmê dirêj dibûn û li hemû rûyê saharê girtibûn.

- Di dawiyê de em hatin, got û qêrînek avêt Îngîlîz, gava ji xewê şiyarbû.

Lê xortî devê xwe ji venekir. Fêrê bédengiya çolê bûbû; bi tenê darên xurme yên li hember wî disekinîn, temaşe dikir. Ji bo ku ew xwe bigihîne Pîramîdan, hîna rêyeke wî ya dirêj hebû; û ev sibe, ji bilî rojeke îhtiyadî û serpêhatîyekê, ji bo wî çi tiştêkî din nebûya. Lê niha, demeke niha bû, cejna ku hêştirvanî behsa wê dikir; wî hewil dida ku ev dem, ew bi wêneyên paşerojê û bi xewnên pêşerojê ve bijî. Rojekê, ev wêneyê bi hezaran darên xurmê, bes dê bibe bîranînekê. Lê di vê lezê de, ji bo wî rimza siyê, avê û meteriseke li dijê şerê bû. Heman bi vî şiklî, hêştirekî xêxbûyî dikaribû bibûya nîşana xeterîyeke mezin û rêzên darên xurme jî, dikaribû nîşana mûcîzeyekê bidana mirov.

"Gelek zimanên Gerdûnê hene," got di hindurê xwe de.

*

GAVA DEM BI LEZ DIBE, KARWAN JÎ BI LEZ DIBIN,“
Sîmyagerî di hindurê xwe de got û dît ku bi sedan mirov
û heywan dihêt wehayê. Mirovên li wehayê bi qêrîn û
gazîn reviyar û hatin pêşwaziya wan kirin. Toza rabûyî
şewqa çolê dixiste siya xwe; zarokên ku biyaniyan
dibînin, ji ber şabûnê li hewa qiloz dibûn. Sîmyager
sehkir, reisên qebilê diçin cem serokê karwanê û hemû
pêk ve li civîneke veşartî rûdinin.

Lê ev tiştina, qet yek ji bala sîmyagerî nedikişand.
Berî niha ji wî dîtibû, çendîn mirov hatine û çûne. Qet
tişteki neşiyabû bêdengiya wehayê û saharê xirab bike.
Li ser van qûmên bê serî û bê dawî yên bi tesîra bayê
şikil diguherînin, wî çî keyser û parsekên gerok dîtibûn;
lê qet cûdahiyê ve qûmê tunebû ji qûmê, ku wî di
zarotiya xwe de dîtibû. Piştî axa zer û asîmanê lacîwerdî,
mirovên rêwî bi yekser keskeneziya ev darên xurmê li
ber çavên xwe dîtibûn û ev yek dilşahiyeke dabû wan; li
gel her tiştî, Sîmyager di kûraniyên dilê xwe de ev
dilşahiya wan his dikir û nedikarî ev hisa xwe bide
sekinandin.

“Belkî ji Xwedayî çol da afirandin, ku gava mirov li
wê derê darên xurme dîtin, bila şabibin,” got xwe bi xwe.

Piştî, biryar da; ew ê êdî bi pîrsgirêkên bêtir rojane
ne, mijûl bibe. Wî dizanibû, ew kesê ku ew ê beşeke ji
sirên pêzanî hîne wî bike, bi vê karwanê re hatibû.
Nîşanan, xebera vî tiştî dabûn. Wî hîna ew kes nedinasî,
lê çavên wî yên bi tecrûbe, gawa ew dîtin, dê ji nîşka ve

ew binasiyana. Wi hêvî dikir, ku ev ji, qasî tilmîzê wî yê berî, zîrek e.

“Ev tişt bo çi ji devê mirov neqlê guhan dibin, bi rastî ez têngîhijim,” got di hindurê xwe de. Bê guman, ne ji bo ku evna sirên rastî ne. Xwedayî, hemû sirên xwe ji bo hemû xalikên xwe, bi azadane vedikir.

Bi an gor wî, bes menayeke vî tiştî hebû: Bê guman ev parçeyên Jiyana Safî bûn û ji ber ku têngîhîştina Jiyana Safî ya bi şiklê wêneyî an ji bi rewşa gotinî, gelek dijwar e, divê ev tişt bi vî şiklî bihatana neqil kirin.

Ji ber ku mirov xwe di nav efsûna wêne û peyvan de winda dikin û di dawiyê de Zimanê Gerdûnî ji bîr dikin.

*

KESÊN NÛHATÎ YEKSER LI HIZÛRA SEROKÊN AL-Fayoum hatin derxistin. Xort ji bo bawerkirina tiştên ku wî dîtine, dijawariyeke mezin dikişand: Di dewsa bireke bi çend darên xurme dor lê alandî de (bi an gor teswîrekê, ku wî di pirtûkeke dirokî de xwendibû), wî dît, ev weha ji gundekî Îspanî gelek mezintir e. Di Wehayê de, sê sed bîr, pêncî hezar darên xurme û gelek ji konên di navbera darên xurme de belavbûyî hebûn.

- Mîna Hezar û Yek Şev, got zîlamê Îngîlîz, ji bo dîtina Sîmyagerî, bê aram bûbû.

Bi yekser zarok hatin û dora wan girtin. Bi mereq, li heywanên wan ên sûwarbûnê, li hêştiran û mirovên hati mêze dikirin. Mêr dixwestin ji kesên hati fêrbîn, ku wan îşaretên şerê dîtine an na; jin jî, li ser qumaş û kevîrên bi qîymet ên ku tûcar ew anîne, hevûdu dibirin û dianîn. Bêdengiya saharê êdî mîna xeyaleke dûr bû, her kes, mîna ku ji cîhana rûhan qetiyane û hatina cîhana mirovan, wisa bê sekan diaxifîn, dikeniyên û digaziyan. Mirov şa û dilşa bûn.

Hêştirvanî, ji xortî re got, li gel tedbîrên, ku berî rojek hatibû hildan, ji ber ku piraniya sakînen vê derê jin û zarok in, wehayan daîm axên bê teref têne qebûl kirin. Her du teref jî, wehayên xwe hebûn; ji ber vê sedemê, şervanên, ku di qûmên saharê de li qirêkên hevûdu

digrin, wehayen wek meteris dihesibandin û hizûra van deran xirab nedikirin.

Serokê karwanê, hinek bi dijiwarî bibe jî, zîlam û rêwiyên xwe li hev civand û agahdarî da wan. Heta şerê qebileyên xilas bibûya, ew ê li vê derê bimana. Rêwî, wek didar, li konên sakînen wehayê bi mîvanî bihatana qebûl kirin û cihên baştirîn bi wan bihata dayîn. Zagona kevneşopiya mîvanperweriyê wisa bû. Paşê jî wan xwest, bi tevî nobedarên wan, bila her kesek sîlehên xwe teslîmê zîlamên ku serokên qebileyên ew bi wazîfedar kirîne, bikin.

- Qanûnên şer wisa ye, got. Bi vî awayî, şervan êdî nikarin wehayên wan wek meterisên şer bi kar bînin.

Gava xort dît, ewê Îngilîz jî bêrika sakoya xwe şeşagirê xwe yê bi destî krom derxist û teslîmê zîlamê wazîfedar kir, devê wî jî ber heyîrîne vekirî ma.

- Çi karê we heye bi şeşagirê ve, xort jê pirsî.

- Ji bona di bêbiryar nemana mirovan de alîkariya min bike, got. Ji ber ku lêgerîna wî êdî xilas bûbû, dîlşa bû.

Lê xort jî bes xezîna xwe difikirî. Dema nêzîkî xeyala xwe dibû, her tişt bi dijiwartir dibû. "Şansê Ecemîtî" ya ku keyserê pîremêr behis dikir, êdî çenedibû. Wî dizanibû, niha jî bo kesên ku ketine peyî Menkiba xwe ya Şexsî, berxwedan û îmtîdana cesaretê pir girîng bû. Ji ber vê hindê jî, divê wî ecele nekiriba û neketiba nav bêaramiyê. Belkî jî ber eceletiyê, nîşanên ku Xwedayî li rêya wî danayî, dê nedîtiba.

"Xwedayî ew li ber rêya min danîn," got di hindurê xwe de û bi heyîrîneke xwe bi xwe. Heta niha wî difikirî, ku nîşan aidê vê cihanê ne. Mîna xwarin û xew kirin, an jî mîna evîn û lêgerîne. Lê wî ti car nefikiribû; jî bo ku

karê divê were kirin, li nîşanê wî bide, ev yek zimanekî Xwedayî ye.

“Bê sebir nebe,” got û dubare kir xwe bi xwe. Mîna ku hêştirvanî digot, “Eger wexta xwarinê hat, xwarinê bixwe. Wexta meşê hat, bimeşe.”

Roja ewil, bi tevî zîlamê Îngîlîz, her kesên ku teslîmê westanê bûne, nivîyan. Xort, bi tevî pênc zarokên, ku hema hema di temenê wî de bûn, li konekî hîn dûtir dima. Zarokên saharê bûn ev, bajarên mezin mereq dikirin. Xort, ji wan re behsa demên xwe yên şivantiyê kir; gava Îngîlîz ket nav konê, wî dest bi behiskirina serenca xwe ya li kargeha bilûriyê dikir.

- Ji sibê de we digirim, got, dema ku wî, hevalê xwe derdixiste der. Divê hûn alîkariya min bikin, da ez sîmyagerî bibînim.

Wan berî pir ceribandî, ku ew, wî sîmyagerî bi derfetên xwe ve bibînin. Bê guman diviyabû Sîmyager ji sakînen din ên Wehayê, cûdatir bijî; bi ihtîmaleke mezin, niha di konê wî de ocaxeke daîm vexistî hebû. Piştî ku ew demeke dirêj geriyan, wan fêmkir, ku weha ji texmîna wan pir pir mezintir e û tê de bi sedan kon hene.

- Ew ma ku me hemû rojek xilas kir, got Îngîlîz, gava wî bi tevî hevalê xwe li ber bireke li Wehayê rûdinişt.

- Belkî pirsîyarkirin herî baştir e, xort got.

Îngîlîz nedixwest diyar bike, ku ew li El-Fayoumê ye, ji ber vê sedemê, wî nekarî biryar bide. Di dawiyê de stûyê xwe şikand û ji xortî, ku wî baştir Erebi dizanibû, daxwez kir, çî divê bila ew bike. Xort li ser vê yekê, ji bo tijîkirina hewana xwe ya ji eyalên miyan, nêzîkî jineke li ber bîrê bû.

- Êvara we bixêr be xanim! Di vê Wê hayê de Sîmyagerekî heye, min dixwest bizanibim ka ew li kû derê dijî, got û ji wê pirsîyar kir.

Jinik ji wî re got, wê qet yekî wisa nebihîstîye û paşê jê dûr ket. Di ser de ji jinikê, xort îqazkir, bila ew ji vê û şûnde teşebûsa afaxtina bi jinên cilên reş li xwekirî neke, ji ber ku ev jinên zewîcî bûn. Diviyabû mirov li ber kevneşopiyan rêz bigre.

Îngîlîz ketibû nav xeyalşikestineke mezin. Nexwe wî bedilhewa, ev rêwitiya xwe ya bi zehmet kiribû. Hevalê wî ji ber vê rewşê, ber xwe ketibû. Îngîlîz ji ketibû peyî Menkîbeya Şexsî ya xwe. Û eger însanek vê yekê bike, ji bo ku ew lêgerîna xwe bibîne, hemû Gerdûn dixweze alîkarî bike. Keyserê pîr wisa gotibû. Xeletbûna wî ji derê derfetan bû.

- Min heta niha qet nebihîst, li vê derê behsa Sîmyagerî hatiye kirin, xort ji wî re got. Wer nebûya, min ji dixwest ez alîkariya we bikim.

Çavên Îngîlîz birîqîn.

- Helbet wisa ye, got û qêriya. Belkî jî, li vê derê çi kesek nizane, Sîmyagerekî kî ye. Hûn, ya baştir ew e, ji wan bipirsîn, kesî ku nexweşên gund sax dike kî ye?

Çend jinên cil û bergên reş lixwekirî hatin ku ji bîrê av bikişînin, lê li gel berxweketina Îngîlîzî jî, xort bi wan re qet qise nekir. Di dawiyê de zilamekî hat.

- Li gund, hûn kesekî, ku nexweşîyan sax dike dinasin? xort ji wî pirsî.

- Xwedê hemû nexweşîyan sax dike, wî zilamî got û ew bersivand. Ew ji van biyaniyan pîr tirsîyabû. Hûn herdu jî li efsûndaran digerin.

Û piştî xwendina çend ayetên ji Qur'anê, çû rêya xwe.

Zilamekî din hat. Ew hê jî pîrtir bû, di destê wî de elbeke biçûk hebû. Xort eynî pisiyara xwe ji wî jî kir.

- Hûn ji bo çi li zilamekî wek wî digerin, Erebe got û jê pirsîyarkir, di dewsa bersivê de.

- Ji ber ku vî dostê min, ji bo naskirina wî zilamî, rêwitiyeke bi mehan kir.

- Eger ev zilam li vê Wehayê dijî, divê ew kesekî pir bi hêz e, got pîremêr, piştî fikirîneke kin. Serokên qebîleyan jî nikarin bi xwesteka canê xwe wî bibînin. Divê ew tiştekî wisa bixweze. Ya baştir ev e; hûn li benda dawîbûna şerê bisekinin û paşê jî bi tevî karwanê ve berdewama rêya xwe bikin. Hewil nedin ji bo têketina jiyana Wehayê, got û axaftina xwe girêda û ji wir veqetiya çû.

- Lê Îngîlîz ji ber şabûnê nedizani çî bike. Nexwe ew li ser şopeke rast bûn.

Di vê demê de keçeke xama xûyabû, cil û bergên reş li xwe nekiribû. Di ser milê xwe de destiyek dianî û di dora serê wê de laçîkek hebû, lê rûyê wê vekirî bû. Xort, ji bo pirsîyarkirina wî Sîmyagerî, çû xwe nêzikî kir.

Di wê lezê de mîna ku dem rawestiya; mîna ku Rûhê Gerdûnê bi hemû hêza xwe ve derketibû li ber xortî.

Gava xort, çavên reş û lêvên wê yên ku di navbera ken û hişbûnê de bê biryar mane dît, beşa esastir û berztir a zimanê, ku cîhan pê qisedike û hemû mexluqên rûyê erdê jî bi dilên xwe jê fêmdikin, têgihîşt. Û eşq bû navê vî zimanî; ji mirovan û ji çolê kevintir bû; eynî mîna lihevûdu qelibîna ev herdu nihêrînên li ber bîrê, li her cîhî ku ev herdu nihêrîn li wir, li hev diqelibin, daîm bi eynî hêzê ve derdiketin holê. Lêv di dawiyê de biryara kenîne dan û ev yek îşaretek bû; îşareta, ku ew bê

zanebûn li benda wê radiwestiya; îşareta, ku li pirtûkan, li cem miyên xwe, li krîstalan û di bêdengiya saharê de lê digeriya.

Zimanê Saf ê Gerdûnê bû ev, pêdiviya wî ya bi vegotinê tunebû, ji ber ku Gerdûn di rêya xwe ya bêdawî de dimeşiya û di vî karê xwe de jî, pêdiviya wî bi qet tiştêkî tunebû. Xort di wê lezê de têgihîşt, ku jinika jiyana wî li hember wî disekine û keçikê jî ev yek dizanibû û ji bo vê zanînê, pêdiviya wê bi qet tiştêkî tunebû. Dêûbavê wî, dêûbavê dêûbavê wî ji wî re bigotana ku divê mirov berî zevacê nazan bike, xwe bixemiline, gûstîlî be, hevûdu nas bike û bibe xwedîperan, dîsa jî xort di vê dînyayê de bes bi vê yekê ve bi bawerbû. Kesên dijê vî tiştî digotin, haya wan ji zimanê gerdûnî tunebû. Ji ber ku yên jî vî zimanî fêmdikin ji xwê fêmdikin, dixweze li serê girdên saharê be, dixweze di navenda bajarên mezin de be, ew kes dikare fêmbike, ku di vê dînyayê de daîm kesên li benda hev hene. Û gava ev herdu însan rastê hevûdu hatin û çavên wan li hev qelibîn, êdî hemû paşeroj û pêşeroj girîngiya xwe wînda dike, bes ew dem û ew rastiya, ku di binê qubbeya asîmanê de her tişt jî aliyê Eynî dest dihête nivîsandin, heye; belê ew rastiya nayêbawerkirin heye. Destê ku wî, kesek dê were hezkirin afirandiyê ji bo her kesek, ku evîne diafirîne, dixebite, bîhna xwe dide û di binê ronîya rojê de li xezînan digere... Ji ber ku eger wisa nebûya, qet menayeke xeyalên cîsnê mirov nedibû.

"Nivîs" got xwe bi xwe.

Îngîlîz rûdinişt, piştî jî cîhê xwe rabû û bi hevalê xwe girt û ew hejand.

- De haydê, jê pirsîyar bikin!

Xort nêzikî keçik bû. Keçik careke din bi gîrnijînekê ve li wî nihêrî. Xort jî bi gîrnijîn bersiv da.

- Navê te çi ye, xort ji wê pîrsiyar kir.

- Navê min Fatima, got û bersiv da, paşê li ber xwe nihêrî.

- Li welatê, ku ez ji wir hatim jî, navê hin jinan wiha ye.

- Navê keça pêxemberê ye, Fatimayê gote wî. Mûcahîdên me ew birin wê derê.

Keça rindik, bi xurur behsa mûcahîdan dîkir. Îngîlîzî, ku li cem wan disekinî, îsrar dîkir. Li ser vê yekê, xort ji keçik pîrsiyar kir, gelo ew, zilamekî ku hemû nexweşîyan sax dike, dinase an na.

- Zilamekî, ku sirên cîhanê dizane. Bi cinên saharê re diaxife, keçikê got.

Cin, periyên Qencî û Xirabîyê bûn. Ê keçik, bi destê xwe ve aliyê başûr îşaret kir, ev zilamê ecêb di wî alî de rûdinişt.

Paşê destiya xwe tijî kir û ji wir dûrket. Îngîlîz jî, ji bo lêgerîna Sîmyagerî, jî wir dûrket. Xort, demeke dirêj li ber bîrê rûnişt û fikirî, ku bayê rojhilatiyê, rojekê, bêhna vê keçikê li rûyê wî xistibû û wî qet nedizaniyê ev jînek diji, lê dîsa jî, wî ew hezkiribû. Ê eşqa wî ya ku ew ji bo vê keçikê hîs dike, dê hemû sirên cîhanê ji wî re vekiriba.

Xort, sibetirê rabû û ji bo wê keçikê çû ber bîrê. Gava ku wî li wê derê zilamê Îngîlîz dît, heyirî: Cara ewil bû, wî saharê temaşê dîkir.

- Ji esrê de, ji êvarê de, ez wisa radiwestim, Îngîlîz got. Gava stêrên destpêkê zayîn, ew hat. Min jê re got, ku ez li çi digêrim. Wî jî min pîrsî, gelo ez dikarim qirşûnê vegerînim li zêrê. Min jî got, ez jî dixwezim vî karî

fêrbibim. Li ser vê yekê, wî jî ji min re got, biçe û vê biceribîne. Ji bilî "Biçe û biceribîne!" qet tiştek negote min.

Xort devê xwe venekir. Nexwe, evê Îngîlîz, ji bo fêrbûna tiştekî, ku wî ji mêj de ev yek dizanûbû, ew qas rê meşiyabû. Anî bîra xwe, ji bo fêrbûna tiştekî mîna vê, wî jî, şeş miyên xwe dabû keyserê pîremêr.

- Madem wisa ye, hûn ji biceribînin, got ji Îngîlîzî re.

- Ez jî vê yekê bikim. Hema dest bi karê bikim.

Piştî çûyîna Îngîlîz, Fatima ji bo tîjî kirina avê, hat ber bîrê.

- Ez hatim vê derê, ku bes tiştekî bêjîme te, xort ji keçikê re got. Ez dixwezim tu bibî jîna min. Ez ji te hez dikim.

Ava destiya keçikê ji ser re çû.

- Ez ê her roj li vê derê li benda te bim, xort got û axaftina xwe berdewam kir. Ji bo lêgerîna xezîneke li nêzîkî pîramîdan, ez hemû saharê derbas bûm. Şer, ji bo min bi tevayî bêşansiyek bû. Lê eynî şer îro jî, ji bo min bû şansekî, ji ber ku min tu dîtî û ez niha li cem te disekinim.

- Şer, rojek dê xilas bibe, keçikê got.

Xort li darên xurme yên Wehayê nihêrî. Wî şivantî kiribû. Li vê derê jî mî hebûn. Fatima ji xezîne girîngtir bû.

- Mûharîb li xezîneyên xwe digerin, keçikê got, mîna ku wê ramanên wî keşif kiribû. Û jinên saharê bi mûharîban bi rûmet dibin.

Piştî tîjîkirina destiya xwe, ji wê derê çû.

Xort her roj dihat ber bîrê û li benda keçikê radiwestiya. Wî ji Fatima re, behsa jiyana xwe ya şivantiyê, rasthatina wî ya bi keyserê re û behsa

firoşgeha bîlûriyê dikir. Bûn dostên hev, her çi qas bihevrebûna wan ji panzde deqeyê derbas nebûya ji, ev dema kinik, ji bo wan ji dema roja mayîn dirêjtir dihat.

Nêzikî mehekê bû, ew di Wehayê de bûn. Serkarwan rojek hat, gazî her kesî kir û civînek çêkir.

- Em nizanin, şer dê çi wext xilas bibe û ji nû ve bi rêketina me jî, ne mumkun e, got. Bê guman, şer hê demeke dirêjtir, dê berdewam bike, belkî ji bi salan. Di herdu layen de ji mûharîbên cesûr û leheng tîji ne û herdu artêş jî, ji şerkirinê rûmet hildidin. Ev şerê hanê, ne şerê rind û nerindan e. Ev şerekî di navbera hêzên, ku ew dixwezin heman desthilatdariyê bi dest bixin û di şerekî wisa de, Xwedê di aliyê herduyan de ye jî.

Mirov belav bûn. Xort, wê êvarê, careke din Fatima dît û di civînê de çi hate axaftin, ji wê re neqîlkir.

- Di hevdîtîna me ya duyemîn de te ji min re behsa evîna xwe kir. Piştî jî, te, tiştên pir xweşik ên mîna Zimanê Gerdûnê, Rûhê Gerdûnê fêrê min kirin. Û evna, pêve pêve ez kirim mîna parçeyek ji te.

- Ji bo ku ez li benda te rawestim, pir zû hatim ber bîrê. Ez pir rawestiyam. Paşeroja min û kevneşopî nayê bîra min, nayê bîra min, ku zîlam çi dixwezin, daxweza wan çi ye ji jinên saharê. Di dema zarokatiya xwe de min daîm xeyal dikir, rojek were û çolê, cîwantirîn diyariya jiyana min dê bide min. Û wê îro ev diyariya xweşik daye min, ew diyari tu yî.

Xort dixwest bi destê keçikê bigre. Lê Fatima ji qulpên destiyê pê girtibû.

- Te ji min re behsa xewnên xwe, keyserê pîr û xezinê kirin. Te behsa îşateran kir. Ji ber vê yekê ez ji qet tişteki natirsim, ji ber ku yên tu ji min re anîn, îşaret bûn. Mîna ku tu ji daîm dubare dikî, ez parçeyek ji xewnên te û

Menkiba Şexsî ya te me. Ji ber vê eynî sedemê, ez dixwezim tu divê li peyî wî tiştî, ku lê digerî, çûna xwe berdewam biki. Eger tu divê li benda xilasbûna şerê rawestî, ev yek tişteki baş e. Lê eger tu divê zûtir biçî, wê çaxê di rêya Menkiba xwe de here. Qûm bi bandura bahozan şiklên xwe diguherînin, lê çol daim eynî dimîne. Evîna me ji wisa ye.

- Nivîs, keçikê got, bi careke din. Eger ez parçeyek ji Menkiba te me, tu ê rojek vegerî.

Gava xort ji cem keçik veqetiya, bi berxweketî bû. Wî, mirovên, ku heta niha naskiriye difikirî. Şivanên zewicî, pir dijarî dikişandin ji bo jinên xwe bidin bawerkirin, ku ew mecbur in li geliyan bijîn. Eşq, dida mecbur kirin, mirov divê di nêzîkî hezkiriyê de bijî.

Sibetirê, Xort behsa van tiştan kir ji Fatimayê re.

- Saharê, mêrên me ji me distîne, got Fatima, û her dem ji ewana ji me re venagerine. Em divê hînê vê yekê bin. Êdî ew, li hindurê ewrên ku bîyî barandina baranê dibihurin, li heywanên, ku ew di navbera kevir û beran de xwe veşartîne, li nav avên ku bi comerdîyeke mezin ji axê dipîşkivin, dimînin û disekinîn. Êdî ew parçeyên her tiştî bûne. Rûhê Gerdûnê bûne. Hîn kesên çûyî jî vedigerin. Wê çaxê jinên din dilşa dibin, ji ber ku mêrên, ku ew li benda wan in, belkî ew ê ji vegerin. Berî, min li wan jinan dinihêrî û hesûdiya dilşahiya wan dikir. Niha mêrekî min ê, ku ez li benda wî bim, dê hebe êdî. Ez jineke çolê me û ji ber vê yekê bi rûmet dibim. Dixwezim, bila mêrê min jî, wek bayên, ku cîhê qûman diguherînin, bi azadiyeke mezin bigere. Dixwezim, ez wî li ewran, li heywanan û li avên herikî bibînim.

Xort çû cem Îngîlîz. Dixwest ji wî re behsa Fatimayê bike. Gava wî dît, Îngîlîz li ber konê xwe ocaxeke biçûk

çêkiriye, heyirî û ma. Ocaxeke ecêb bû, li ser wê şûşeyeke zelal hebû. Wî jî dar diavête nav agirê gumrah û çavdêriya saharê dikir. Çavên wî jî demên, ku pirtûkan dixwîne, hêj bêtir bi birqîn dixûyan.

- Ev, yekemîn konaxa xebatê ye, got. Divê ez kûkûrta tevlihev bi safî bikim. Û jî bo pêkanîna vê yekê, divê ez jî sernekeftinê netirsim. Tîrsa serneketinê, heta evroke, daîm bû astengiyeke mezin, ku ez dest bi karê avakirina Avahiya Mezin bikim. Divê min berî deh salan dest bi vî karî kiriba, çi heyîf e, niha dest pê dikim. Lê jî ber ku ez bîst salan rawestiya me jî, gelek dîlşa me.

Îngîlîz, hem li saharê dinihêrî û hem jî agir sor dikir. Xort demekê li cem wî sekinî, ta ku sahar, rengê penpeyî ya roja avabûnê hilda. Ji bo fêmbike ku bédengi dikare pirsiyarên wî bibersivîne an na, wî dixwest di nava çolê de bîponije û here, ev xwesteka wî nedihate sekinandin.

Bêyî ku darên xurme yên Wehayê, jî ber çavên xwe winda bike, demekê wisa bê armanc û bê wate meşiya. Wî, guhê xwe dida bayê û kevîrên çeqil ên li bin lingên xwe jî hîs dikirin. Car carna, qewikek didît û jê derdixist, ku ev sahar di demên pir kevin de behreke mezin bû. Li ser kevîrekî mezin rûnişt û xwe berda bin tesîra efsûnî ya asoya, ku li hember wî disekinî. Wî nedikarî evîne bifikire, bêyî ku hizreke lê xwedîderketinê tevî bike. Lê Fatîma jîneke saharê bû. Eger tişteki bikaribûya alîkariya têgihîştina wê bike, bê guman ev jî çol bû.

Ta ku wî sehkir, li ser serê wî de tişteki xwe dileqîne, wisa bêyî ramankirin li wê derê sekinî û ma. Wî gava li asîmanê nihêrî, du başokên, ku di serjoran de difirin, dîtîn.

Bala xwe da ser teyrên jakav û şiklên wan ên êcêp, ku di firîna xwe de çêdikirin. Ev, wek xetên bê rêk û pêk

dixûyan, lê disa ji ji bo wî gelek meneyên xwe hebûn. Çi heye ku, wî nedikarî ev menayan tam têbigîhîje. Li ser vê yekê, biryar da, ku ew ê bi çavên xwe ve hereketên teyran bişopîne, bi vî awayî, belkî wî dikaribû mesajekê bixwîne. Belkî ji çolê dikaribû ji wî re îzaha eşqa, ku ew xwedîderketina xwe nedivê, bike.

Sehkir, êdî xewa wî tê. Lê dilê wî ji wî daxwez dikir, bila ew nenive; bilekis divê wî xwe wisa bihiştiba.

Ez Zimanê Gerdûnê têdigîhîjim, got û di vê cihanê de mena her tiştî ji heye, heta firîna teyrên jakav jî, ev yek wisa ye. Ji bo eşqa, ku ew bo jinekê his dike, di hindurê xwe minetiyeke kûr his kir. "Gava mirov hez dike," got di hindurê xwe de, "wateyên hebûnan jî zêdetir mena qezenc dikin."

Ji nişka ve, başokekî, ji bo hêrişeke ya li ser başokekî din pike kir. Di wê lezê de wêneyek xaftî û kin li ber çavê xortî de xûyabû: Zilamên yekîneyeke çekdarî, di destên wan de şûrên wan, Weha dagir dikirin. Wêne bi yekser windabû, lê bandura xwe pir zindî bû. Wî behsa serabê bihistibûn û çend serab jî dîtibûn: Xwestekên bi hêz di qûmên saharê de dihatin ber çavên mirov. Çi heye ku, bê guman wî jî nexwestibû, artêşekê were ber çavên wî û Wehayê dagir bike.

Wî xwest ev tiştan ji bîr bike û dîsa bikeve nav fikir û ramanan; xwest, hizra xwe berev sahara bi rengê penpeyî û keviran bimeyîline. Lê tişteki di dilê wî de qet rihetî nedida wî.

"Her dem îşaretan bişopîne," keyserê pîr ji wî re gotibû. Fatima ket bîra wî. Paşê ew wêneyê, ku li ber çavên wî xûya bûbû, anî bîra xwe û sehkir, ev yek ji rastiye pir dûr nîne.

Hewil da ji hestên bifetis a ku hindurê wî dialîne, rizgar bibe. Rabû ser xwe û ber bi darên xurmê meşiya. Careke din zimanê piranî ya hebûnan fêmdikir: Niha, Wêha bûbû rimza xeteriyê, çol ji bûbû temsila ewlekariyê.

Hêştirvanî, li binê dareke xurmê rûnîştîye û derketina rojê temaşê dikir.

Wî dît, xort ji paş qûmûlekê derdikeve û tê.

- Artêşekê nêzik dibe, xort got. Min xûyaniyek dît.

- Çolê, dilê insanan bi xeyalan ve tîjî dike, hêştirvanî got û bersiv da.

Lê xort, ji wî re behsa başokan kir: Gava wî firîna başokan sêyrdikir, ji nişka ve, di Zimanê Gerdûnê de ponijîbû.

Hêştirvanî qet bersivek neda; tiştî ku xort, ji wî re şîrove dikir, wî ew têdigihîşt. Wî dizanibû, ku tişteki ihtiyadî ya di rûyê erdê de, her tişteki jî, dikaribû jiyane şîrove bike. Em hemû jî dikarin jiyana xwe bi ceribandineke, ku em wê lezê dijîn, têkeliyekê çêbikin; bi vekirina rûpeleke ihtiyadî ya pirtûkekê, bi hûrniherîna destê kesek, an jî bi nihêrîna firîna teyran, an jî bi nihêrîna fala kaxizan, an jî em bêjin bi rêgeheke dîtir... Lê di eslê xwe de qet hebûnekê, tenê bi serê xwe nikare hîn menayan bide şîrovekirin; mirov li ser van hebûnan çavdêrî dikin û bi vî awayî jî dişên rêgeha fêmkirina Rûhê Gerdûnê keşif bikin.

Gelek mirov bi hêsanî Rûhê Gerdûnê têdigihîştin û bi saya vê yekê jî, jiyana xwe qezenc dikirin; çol bi van mirovan tîjî bûbû. Kahîn digotin ji van re; û kahîn jî, ji jinan û pîran ditirsiyan. Şervan, pir kêr ji wan tişteke dişewirîn, ji ber ku ne mûmkûn e, mirov çî wext mirina xwe ji berî de bizanibe û bi vî awayî jî biçe şer. Ew tercîh

dikin, ku ji şer hez bigrin, heyecanek bigrin ji tiştê nayêzanîn; dûwaroj ji aliyê Xwedayî hatiye nivîsandin û eger Xwedayê me çi nivîsibe, ji bo çêyiya mirov e. Ji ber vê sedemê jî, şervan bes di dema niha de dijiyan, ji ber ku dema niha bi bûyerên nayêzanîn ve tîjî bû û ew mecbûr bûn, bala xwe baş bidine li ser gelek tiştên he neqewimîne. Şûrê dijmin li kûderê bû, hespê dijmin li kûderê bû, ji bo rizgarbûna ji mirinê, diviya wan darbeyeke çawa lê bidana?

Hêştirvan ne şervanekî bû û wî heta niha hîn caran bi kahînan re şewiribû. Hîn kahînan jî, ji wî re rastî gotibûn; hinekan jî pir tiştên xelet gotibûn. Rojekê, remilvanê (kahinê) pîrtirîn (û erjengtîrîn) ji hêştirvanî pirsîbû, "bo çi tu ew qas bi dema hatinê re bi mijûlî?"

- Ji bo ku ez hîn tiştan bikim, gotibû hêştirvanî û bersiva wî dabû. Û ji bo ku ew tiştên ez naxwezim wan ters biguherînim.

- Wê çaxê ev yek nabe pêşeroja te, gotibû remilvan û wî jî bersiveke wisa dabûyê.

- Lê belkî jî, ez ji bo amadebûna li hember tiştên dê biqewimin, dixwezim pêşerojê fêrbibim.

- Ji bo tiştên qenc, ev ê bibe sûprîzeke xweşik; lê ji bo tiştên xirab jî, hîna ew neqewimîne tu ê pir jan bikişînî.

- Ji ber ku ez mêrekî me, ez dixwezim pêşerojê fêrbibim, got hêştirvanî li ser vê yekê. Û mêr, bi girêdayiya pêşerojên xwe dijîn.

Remilvan, demekê qet qise nekir. Di fala çoyan de pir pispor bûbû. Çoyên xwe davêt erdê û bi an gor sekana wan jî, şîrove dikir. Lê wê rojê, çoyên xwe bi kar neanîn. Çoyên xwe bi pînekê ve pêça û xist bêrika xwe.

- Ez pêşeroja mirovan dixwînim û bi vî awayî jiyana xwe qezenc dikim, got. Zanîna sirî ya çoyê dizanîm û

wan bikar tînim, ji bo ku ez bikevim nav mekana ku her tişt tê de niviskirî ye. Li wê derê dikarim pêşerojê bixwînim, tiştên jibîrkirî keşif bikim û îşaretên niha ji têbigihîjim. Gava mirov tîni bi min re bişêwirin, ez pêşerojê naxwînim. Wan hîs dikim. Ji ber ku pêşeroj bes a Xwedayî ye û bes Ew dikare pêşerojê şîrove bike û bes di demên taybetî de. Ez pêşerojê çawa hîs dikim? Bi saya îşaretên dema niha. Koka sirê di vê demê de ye; gava te bala xwe da ser nihayê, tu dikarî wê baştir bikî. Û eger te dema niha baştir kir, a li peyî wê tê jî, baş dibe. Pêşerojê ji bîr bike û her roja jiyana xwe bi an gor qaydên Şerîatê û bi baweriya ku Xwedayî ew ji bo weledên xwe bexşandiye, bijî. Her roj, bi xwe re Bêdûmahiyê jî tîne.

Hêştirvanî xwest fêrbibe, ew rewşên taybetî, ku Xwedê îzna dîtina pêşerojê dide, çi ne:

- Dema ku Ew bixwe wê şîrove dike. Û Xwedê li ser pêşerojê pir kêr şîrove dike û vê yekê jî, bes ji bo vê sedemê çêdike: Eger pêşerojekê, ku ji bo guherîna hatibe nivîsandin, bibe behsa şîrovê.

“Xwedayî, ji xort re pêşerojek daye diyarkirin,” xwe bi xwe got hêştirvanî. Ji ber ku xort ji wî dixwest bila ew ji wî re bibe hacet.

- Here cem serokên qebîleyan, got hêştirvanî. Ji wan re behsa şervanên nêzîkbûyî bike.

- Ew ê henekên xwe bi min re binin.

- Ev mirovên saharê ne. Mirovên saharê hîna îşaretan bûne.

- Wê çaxê, ew jî niha vê rewşê dizanin.

- Lê ew, ji xwe re nakin xem. Ew wisa bawer dikin, eger rojek were ku ew divê ji kiryarên Xwedayî agahdar bibin, yeqîn kesek tê û ji wan re agahdarî dide. Eve, ev roj, ev peyamêr tu yî.

Wî, Fatima anî bîra xwe. Û biryar da, ew ê biçe cem serokên qebîleyan.

Çû li cem mûhafizê, ku ew li ber konê sipî û terikî ya li navenda Wehayê hatiye avakirin nobedariyê dike û ji wî re:

- Nûçeyek tînim ji çolê. Ez dixwezim bi serokan re biaxifim, got.

Mûhafiz bersiv neda wî. Çû ket nav çadîrî û demeke dirêj li wê derê ma. Piştî, bi Erebekî, bi cil û bergên sipî û zeriya zêrîn derket derve. Xort, ji wî re behsa ew tiştên, ku wî ditine, kir. Ereb, ji wî re got bila li wê raweste û paşê çû ket hindurê çadîrî.

Bû şev. Di vê navberê de Ereban û gelek tûcaran diketin hûndirê konî û derdiketin. Hêdî hêdî ocax hatin vemirandin û Weha, mîna sahareke bê deng bû. Bi tenê roniya konê mezin vêdike. Xort, di vê demê de daîm hizra Fatimayê dikir; axiftina wan a piştî nûvro hê ji neketibû serê wî.

Piştî rawestina çend saetan, di dawiyê de heras hat û ew hilda hindur.

Xort, li ber tiştî ku wî dîtî, bi heyecan bû. Qet nefikiribû, ku di navenda saharê de konekî wisa hebe. Cîh, bi xaliçeyên bedewtirîn, ku ew heta niha li ser tiştêkî wisa nemeşiyabû, hatibû raxistin; li jor, awîzeyên ji madenên biriqîn û bi nexiş, ku tê de mûmên veketî hebûn, hatibûn daliqandin. Serokên qebîleyan pala xwe dabûn balgiyên hewreşimî yên bi nexşên gumrah û bi vî awayî, li aliyê para konî, bûbûn wek xelekek û rûnîştibûn. Di destên xizmetkaran de sîniyên zîvîn hebûn û bi wan, xwarinên xweşik dianîn û dibirin, çay îkram dikirin. Xizmetkarên dîtir jî, agirên nargîleyan teze dikirin. Bêhneke xweşik a titûnê li hewa belav dibû.

Heşt serokên qebileyan hebûn, bi yekser jê derxist, ku ji wan kijan girîngtirîn serok e. Erebe bi cil û bergên sipî û zeriya zêrîn, di navenda nîv xelekê de rûniştibû. Li cem wî jî, xortî ku wî lezeke berî bi wî re axiftibû, hebû.

- Biyanîyê, ku behsa mesajê dike, kî ye? got û pirsî, yekî ji serokan û li xort nihêrî.

- Ez im.

Û tiştên wî dîtî, gote wan.

- Çol dizane, ku em ev çend nîfş in li vê derê dijîn, bo çi ji biyanîyekî re tişteki wisa bêje? serokekî din ê qebileyekê.

- Ji ber ku hê çavên min hînê çolê nebûne, ji ber vê hindê tiştên ku çavên hînbûyî nabinîn, dikarim ez bibînim.

"Ji bilî vê yekê, ez dizanim Rûhê Gerdûnê çi ye," got di hindurê xwe de. Lê, ji ber ku Ereb bi tiştên wisa bawerî nakin, ev hizra xwe nexist nav gotinên xwe.

- Weha cîhekî bê teref e. Qet kesek hêrişê ser wehayekê nake, got serokê sêyemîn.

- Ez, bi tenê tiştên min ew dîtî, dibêjime we. Eger hûn bi min bawer nebin, hûn ê tişteki nekin.

Ji nişka ve, bédengiyeke mezin ket nav çadir, piştî jî gengeşîyeke bi heraret dest pê kir. Bi zaravekî Erebî ya ku xort jê fêhm nedikir, qise dikirin, lê gava xort teşebûsa derketina derve kir, heras ew nehîşt. Li ser vê yekê tirsîya; îşaret ji wî re digotin, ku hûn tişt bi rê ve naçin. Pir poşman bûbû, xwezil wî ev bûyer ji hêstirvanî re negotiba.

Bi yekser, pîremêrî, ku li navendê rûndinişt, bi girmijîneke xûya û nexûyayî mêzekir. Gava xort ev yek dît, dilê wî rihet bû. Pîremêr, hê tevi gengeşiyê nebûbû û çi tişteki jî negotibû. Lê xortî, ku ew êdî hînê Zimanê

Gerdûnê bûye, dikarîbû hîs bike, ku êdî di nav çadir de lerzîneke aşîtiyê tevdigere. Hisên wî ji wî re digotin, wî bi vê kiryara xwe tişteki pir baş kiriye.

Gengeşî bi dawî bû. Ji bo guhdarkirina wî pîremêrî, her kes bêdeng bû. Piştî pîremêr vegeriya xortî. Niha di rûyê wî de îfadeyeke sar û qure hebû.

- Berî du hezar salan, li welatekî dûr, zilamekî, ku bi xewnan bawer dikir, avêtin birê û wek êsir firotin. Tûcarên welatê me ew kirin û birin Misrê. Û em hemû ji pê dizanin, kesekî bi xewnan bawer e, dikare evana ji şîrove bike(*).

Xort, ew pîrejina Mirtîb anî bira xwe û xwe bi xwe got; "Lê her dem nikare di pêkanîna vê yekê de serkeftî be."

Bi saya xewna çêlekên qelew û çêlekên kelax, ku Firawûnî ew xewin dîtîbû, vî zîlamî Misir ji xelayê xilas kir.

Di welatekî biyanî de ew ji biyaniyekî mîna te bû û kêr û zêde, ew ji di salê te de bû.

Bêdengî dirêjbû. Dengê wî pîremêrî sar bû.

- Her dem, em bi ya Kevneşopiyê dikin, got pîremêr û gotinên xwe berdewam kir. Kevneşopî, Misir ji birçîtiyê xilaskir wê çaxê, gelê wî welatî jî, kir dewlemendtirin gelê cihanê. Kevneşopî, dide fêrkin ku mirov dê çawa ji çolê derbas bin û çawa qîzên xwe bidine mêr. Kevneşopî dibêje weha herêmeke bê teref e, ji ber ku wehayên her du terefê jî hene û ji ber vê sedemê jî, her teref jî bê parastin in.

(*) Çîroka Yûsûfê, ku di navbera babên 37-50 yên beşa Tekvîn a Tewratê de tê behis kirin.

Gava pîremêr diaxîfî, çî kesek devê xwe venekir û gotinek jî negot.

Lê Kevneşopî vê yekê jî dibêje me; divê em bi mesajên çolê jî bawer bikin. Her tiştên em dizanin, çolê ew fêrê me kriye.

Li ser îşareta pîremêrî, hemû zilamên Erebbabûn serxwe. Civîn bi dawî bûbû. Nargile hatin vemirandin û heras derbasê cîhên xwe bûn. Xort xwe amadeya çûyîne dîkir, lê wî pîremêrî jî nûve dest bi axaftinê kir:

- Sibe, em ê peymana, ku tê de hatibû ferman kirin, çî kesek nikaribe di nav sînorên wehayê de sîleh bi xwe re bigerîne, betal bikin. Heta êvarê em ê li benda dijminê bin. Gava roj çû ava, zilam dê sîlehên xwe binin û teslîmê min bikin. Li gel dijminekî kuştî, tu ê lirayek zêr bistînî.

Lê bêtî ketina şer, çek dê neyîne derxistin. Çek, mîna çolê, bi naz in; eger dema nedivê bîn derxistin, di dema pêdivê de jî agir nakin. Eger sibê çek dê nehatibe bi kar anîn, tê wê menayê, ku kêmtirîn yeke ji wan dê were bikaranîn. Dijê te.

*

XORT GAVA JI KONÎ DERKETE DER, WEHA BI ronahiya hîvê ve serê xwe dişûşt. Ji bo çûna konê xwe, diviya ew qasî bîst deqe bimeşe.

Tîştên, wî şahidiya wan kiribû, ew bitirs kiribû. Wî xwe xistibû nav kûraniya Rûhê Gerdûnê û dikaribû bedela vê yekê bi jiyana xwe ve bide. Xumareke mezin listibû. Lê gava ku wî ji bo lipeyçûna Menkiba xwe ya Şexsî miyên xwe firotibû, wê çaxê jî xeteriyeke mezin xistibû ber çavê xwe. Û mîna gotina hêştirvanî, belkî mirina sibê ji mirina rojeke din baştir jî dibû. Her roj, ji bo jîyan û ji bo mirinê ye. Her tişt bes bi peyvekê ve girêdayî bû; "Nivîs."

Bi bêdengî meşiya. Li gel her tiştî, poşman nebû. Eger ew sibê bimira, nexwe Xwedayî nexwestibû pêşeroja wî biguherîne. Lê piştî derbasbûna wî ya saharê, piştî xebata wî ya li firoşgeha bîlûriyê, piştî naskirina saharê û çavên Fatimayê dikaribû bimre. Berî demeke pir dirêj, ji veqetîna welatê xwe û pê ve, wî her roja xwe bi tîrbûneke mezin jiyabû. Eger ew sibetirê bimra, çavên wî vekirî nediçûn, ji ber ku çavên wî ji yên şivanên din pirtir tiştan dîtibûn û wî, ji vê yekê pir xurureke mezin dihesiya.

Ji nişka ve, dengekî teqînî bihîst û bi tesîra bayekî, ku bi şideteke nehatiye dîtin bibayê dibû, li erdê gilor bû. Li hawîldora wî ewreke tozê hilgirtibû û ji ber vê, roniya

hîvê hema hema qet nedixûya. Li hember wî, hespekî kûmet û terikî, bi hirîneke erjeng rabû ser piyan.

Pir kêr ditin, ku çî diqewime, lê gava ewra tozê belavbû, ket nav tîrseke erjeng a ku heta niha qet hîs nekirbû. Sûwarê hespê, zilamekî bi cil û bergên reş bû, li ser milê wî yê çep de bazekî hebû. Tûrbanek bi serê xwe pêçabû û ji pêçeya rûyê wî, bes çavên wî dixûyan. Gelo ew nûçedarê saharê bû? Lê kesayetîyeke wî ya pir bi hêztir a ji yekî cihanî hebû.

Sûwarê ecêb, şûrê xwe yê terikî û bi qews, ji cîhê kêleka zînê dardakirî derxist. Polat li ber taviya hîvê bîriqî.

- Kî cesaret kir, ku firîna başokan şîrove bike? got û pîrsî. Dengê wî ew qasî bi gurîne bû, mîna ku ew ji aliyê pêncî hezar darên xurmê yên Al-Fayoumê hate bersivandin. Xort;

- Min cesaret kir, got. Û bi yekser, pêkera Ewliya Santiago Matamorosê, ku wî, bê îmanan di bin piyên hespê xwe de pelixandibû, anî bîra xwe. Sûwar, eynî mîna yekî Ewliya Santiago Matamoros bû, lê niha rewş cûda bû.

- Min cesaret kir, got û dûbare kir. Û bi xwarkirina serê xwe, li ber darbeya şûrê xwe amade kir. Ji ber ku we Rûhê Gerdûnê nexiste nav hesabê, jiyana gelek mirovan dê rizgar bibe.

Çi heye ku, şûr ji nişka ve neket. Destê sûwarê, giran giran daket jêr û devê şûrê bi hêdîka li eniya xort nikiya. Şûr ew qas tûj bû ku, dilopekî xwîn xûyabû.

Sûwar, mîna kevîrekî, wisa bê leqan radiwestiya. Xort jî wisa. Revîn qet nehatibû bîra wî. Di kûraniya dilê wî de dilşahiyeke ecêb belavbû: Ew ê ji bo Menkîba xwe ya Şexsî bihata kuştin. Û ji bo Fatimayê. Bi kinayî,

rimzan ji wî re rastî gotibûn. Eve, ew niha li ber dijmînê xwe bû û madem Rûhê Gerdûnê hebû, wê çaxê mirin ji ser seran ser çavan hatibû. Ew ê piştî çend deqeyan bibûya parçeyek ji wê.

Biyani, devê şûrê xwe hê ji li ser eniya xort de dida sekinandin.

- Te bo çi firîna teyran şîrove kir?

- Min bi tenê tiştî ku teyir dixwestin bêjine me, xwend. Dixwezin Wehayê rizgar bikin. Hûn û zilamên we dê hemû werine kuştin. Zilamên Wehayê ji we pirtir in.

Devê şûrê hê ji li ser eniya xort de disekinî.

- Tu kî yî, ji bo guhertina çarenûsa ku Xwedayî ew nivîsiye, xwe radigîhîni?

- Xwedayî artêş afirandin, lê Wî, teyir ji afirandin. Xwedayî zimanê teyran fêrê min kir. Her tişt ji aliyê heman dest hatiye nivîsandin, xort jê re got û peyvên hêştirvanî anî bîra xwe.

Sûwar, di dawiyê de, şûrê xwe para vekişand. Xort di hindurê xwe de rihetbûnek hîs kir. Lê wî nedikarî bireve.

- Bala xwe bide ser kehanetên xwe. Eger tişteke hatibe nivîsandin, rizgarbûna ji wê ne mûmkûn e.

- Min bi tenê artêşek dît, xort got. Min dawiya şereki nedît.

Sûwar mîna ku bi gotinên xort dilxweş bûbû. Lê wî hê ji şûrê xwe di destê xwe de digirt.

- Biyaniyekî, li welatekî biyanî çi dike? got û ji wî pirsîyar kir.

- Li Menkibeya Şexsî ya xwe digirim. Tişteki, ku tu jê fêm bikî nîn e.

Sûwar, şûrê xwe xiste kewdanka xwe û bazê li ser milê wî, qêrîneke ecêb avêt. Xort hêdi hêdi sakîn dibû.

- Min diviya cesareta te îmtan bikim, wî sûwarî gotê wî. Cesaret, ji bo kesên ku li Zimanê Gerdûnê digerin, fazîleta herî girîng e.

Xort heyîrîbû. Vî zîlamî behsa tiştên, ku kêmanînsan pê dizanin dîkir.

- Divê mirov ti car sistayî nede xûyakirin, ji pîr cîhên dûr hatibe jî, got û axaftina xwe berdewam kir. Divê mirov çolê hez bike lê ti car bi tevayî piştî xwe pê girê nede. Ji ber ku çol ji bo mirovan kevîrê ceribandîne ye. Çol, gavên hemûyan seh dike û kesên, ku heneka xwe pê dinin, dikûje.

Gotinên wî li gotinên keyserê pîr dişivyan.

- Eger şervan hatin û serê te jî, piştî mexrebê, hê di cîhê xwe de sekinîbe, were dîtina min, sûwar got.

Destê ku berî lezekê şûr girtibû, niha qamçiyek girtibû. Hesp ji nûve rabû ser piyên xwe û toz û dûman tevlihev kir.

- Tu li kûderê rûdinî, xort jê pîrsî, gava ew jî wir dûrdiket.

Destê bi qamçî, aliyê başûr îşaret dîkir.

Hevnasîna xort û wî sîmyagerî bi vî awayî bûbû.

*

SIBETIRÊ, LI NAVENDA DARÊN XURMEYÊN AL-FA-youmê du hezar zilamên çekdar hebûn. Hêştta roj qasî seriyekî derneketibû, pênc sed leşker li aso xûyabûn. Sûwar, ji aliyê bakûr ketin Wehayê. Li an gor xûyaniyê, mîna sefereke aşîtxwez bû, lê wan sîlehên xwe di binê meşleqên xwe yên sipî de veşartibûn. Lê gava ew hatin li ber konê mezin ê li navenda çolê, pala û tîfingên xwe derxistin ortê. Û hêrişê ser konê vala kirin.

Zilamên Wehayê hemû sûwarên saharê xistin nav çembera xwe. Di nav niv saetê de, çar sed û nod û neh cesed li meydanê belav bûbû. Zarok di serê wî aliyê darên xurmê de bûn û qet tiştek neditin. Jin di konên xwe de ji bo mêrên xwe dûa dikirin û wan jî çi tiştek neditin. Eger cesedên di meydanê de belavbûyî nebûna, mirov dikaribû bigota, Weha jiyana xwe ya rojane û ihtiyadî dijî.

Bi tenê şervanekî nehat kuştin. Fermandarê hêrişkaran bû. Ber bi êvarê ew anîn û derxistin hember serokên qebîleyan. Ji wî pirskirin; wî ji bo çi kevneşopiya wan bin pêl kiribû? Wî jî got, zilamên wî tî û birçî bûne, ji ber şerekî bi rojan dewamkirî westiyayîne û mane û ji bo ku ew dîsa bikaribin şer bikin, li ser dagirkirina Wehayekê, biryareke wisa dane.

Serokê mezin ê qebîleyan da diyar kirin, ku ew ji bo şervanan pir berxwe ketiye, lê çi dibe bila bibe, divê li

ber Kevneşopiyê rêz bihête girtin. Di çolê de tenê tiştekî, ku diguhere heye: Qûmên ber bayê...

Paşê, serokê mezin, serokê dijmin mehkûmê mirineke bê rûmet kir. Di dewsa sitûbirin an jî gule barankirin, di laşê dareke xurme ya hişkbûyî de hat bi darvekirin. Cesedê wî li ber bayê çolê dihejiya û disekinî.

Serokê qebîlê gazî kir ku bila xort jî were civînê û pêncî lirayên zêr dan wî(*). Piştî, careke din bûyerên li ser Yûsûf qewîmîne anî bîra wî û jî wî xwest, jî vê û pê de bila ew bibe Mûşawirê Wehayê.

*

Institut kurde de Paris

(*) Serokê Qebîlê, kiryara Fîrawûnî ya li gel Yûsûf, dúbare dike. (Binihêr: Tevrat, Tekwîn, 41-37-45 (Wer.)

DEMA ROJ BI TEVAYÎ ÇÛ AVA Û STÊRÊN EWIL DEST bi derketinê kirin (Ji ber ku hîva pazne hebû, stêr pir nedibiriqîn), xort ber bi aliyê başûr dest bi meşê kir. Û di wî alî de bes konekî hebû; û eger mirov guh bidayê ser gotinên Ereben ji wir derbas bûyî, ev der li îstîlaya cinan qelibibû. Lê xort, li wê derê rûnişt û demeke dirêj wisa rawestiya.

Gava hîv gelek bilind bûbû, Sîmyager xûyabû. Li ser milên wî du başokên mirî hebûn. Xort:

- Ez li vê derê me, got.

- Divê hûn nehatibana vê derê, Sîmyager got. An Menkîba we ya Şexsî hûn anîn vê derê?

- Di navbera qebîleyan de şerekî hebû. Derbasbûna çolê ne mûmkûn bû.

Sîmyager ji hespê piyabû û ji xort re îşaretek kir, bila ew bi wî re were. Çûn konekî, ku ji bilî ew konê bi şatafata xwe çîrokên periyên dianî bîra mirov, mîna konên din ên li wehayê bû. Çavên xwe ji bo dîtina hacetên sîmyayî û ocaxên sîmyageriyê gerand, lê çi tiştek nedît. Bes çend rêzên pirtûkan, firina xwarinê û xaliçeyên, ku bi nexşên efsûnî hatine xemilandin hebû.

- Tu rûne, ez ê çay dem bikim, Sîmyager got. Û em ê pêk ve van başokan bixwin.

Xort, xwe bi xwe fikirî, başokên ku wî ew roj dîtibûn, ev in an na, lê der heqê vê de çi tiştek negot. Sîmyager agirek vêxist û di nav demeke kin de hûndirê konî bi

bêhneke xweşik, bi bêhneke goştê ve tijî bû. Ev bêhin ji bêhna nargîlê xweşiktir bû.

- We ji bo çi dixwest, ku min bibînin? xort ji wî pirsîyar kir.

- Ji ber îşaretan, Sîmyager got û bersiv da. Bayê ji min re got, ku tu ê werî. Û pêwîstiya te dê bi alîkariyê hebe.

- Na, kesê hûn behis dîkin, ne ez im. Biyanîyê din ê Îngîlîz. Ew li we digeriya.

- Berî ku ew min bibîne, divê ew tiştên din bibîne. Lê niha rêya xwe serrast kiriye. Dest bi sêyra çolê kiriye.

- Lê ez?

- Gava me tişteke xwest, ji bo ku em xewna xwe pêk bînin, hemû Gerdûn hevkarî dike, Sîmyager got û bi vî awayî gotinên keyserê pîremêr anin bîra wî.

Xort têgihîşt. Nexwe, ji bo ku wî bibin û bigihînin Menkîba Şexsî ya wî, yekî din derketibû ser rêya wî.

- Nexwe hûn ê fêrê min bikin?

- Na xêr. Tiştî ku divê were zanîn, tu êdî dizanî. Ez ê bi tenê, di rêya xezîna te de ji te re rêberî bikim.

- Di navbera qebîleyan de şer heye, xort jê re got û dúbarekir.

- Ez jî çolê nas dikim.

- Min zû de xezîna xwe dît. Hêştîrekî min heye, perê min ê ku min ew li firoşgeha bîlûriyê qezenc kir, heye, pêncî lîrayên min ên zêr hene. Ez di welatê xwe de belkî mirovekî dewlemend tême qebûl kirin.

- Lê evana li gel tiştên cem Pîramîdan qet ne tişteke in.

- Fatîma heye. Xezîneyeke mezintir ji her tiştên, ku min ew qezenc kirin.

- Ew jî li cem Pîramîdan tişt nîn e.

Wan bi bédengî başok xwarin. Sîmyager, şûşeyek vekir û aveke bi rengê sor tijî qedeha mêvanê xwe kir. Ev şerav bû, hem jî şeraveke xweşiktirîn, ku wî di umrê xwe de qet venexwaribû. Lê Şerîatê, şerav qedexe kiribû.

- Xirabî, ne di wî tiştî de ye, ku ji devê mirov dikeve xwarê. Xirabî, di wî tiştî de ye, ku ji wir derdikeve.

Gava şerav xort vedixwar, bi tevayî xwe baştir hîs dikir. Lê vî sîmyagerî ew hinek ditirsandi. Derketin li roniya hîvê temaşe kirin. Roniya hîvê, stêr hêdî hêdî vedimrandin.

- Vexwe û hinek bi keyif bibe, Sîmyager jî xort re got. Sîmyager didît, ku xort hêy diçe dilxweş dibe. Şervanekî çawa berî şer bihna xwe dide, tu jî wisa bihna xwe bide. Lê ji bir neke, dilê te di cihê xezînê de ye. Û eger tu dixwezî tiştên, ku te ew li ser rêya xwe keşif kirîne, hêjayê nirxekê bibin, divê tu yeqîn xezîna xwe bibînî.

- Sibê, hêştirê xwe bifroşe û hespekî bikire. Hêştir xayîn in. Bêyî ku elameteke westana biçûktirîn bidin xûya kirin, bi hezaran fersah rê dimeşin. Û paşê, ji nişka ve li ser çokan dikevin û dimrin. Hesp ne wisa ne, hêdî hêdî diwestin. Û yek jî, tu dikarî bizanî, ew ê çi bixwezin û çi wext bimrin.

★

SIBETIRÊ, XORT BI HESPEKÎ VE HAT BER KONÊ Sîmyagerî. Piştî demekê, Sîmyager xûyabû: Ew ji li hespekî sûwarbûbû, Di ser milê wî yê çep de başokek hebû.

- Li çolê, jiyan rêberiya min dike, Sîmyager got. Kesê, ku dikare li çolê, cîhê jiyanê bibîne, xezînen saharê ji dikare keşif bike.

Di ronahiya hîvê de li ser qûmên saharê dest bi meşê kirin. Xort xwe bi xwe got, "Gelo li çolê ez ê bikaribim cîhê jiyanê bibînim? Ez hê çolê nas nakim."

Dixwest ev ramana xwe ji Sîmyagerî re veke, lê ji wî ditirsiya. Hatin ew cîhê bi kevir, ku berî niha wî li wê derê, li asîman başok dîtîbûn; niha ba û bédengî li ser her tiştî hûkim dikirin.

- Ez li saharê nikarim îşaretên jiyanê keşif bikim, gêncî got. Ez dizanim ew heye, lê di dîtina wî de ez sernakevim.

- Jiyan jiyanê dikişîne, Sîmyager got.

Û xort tégîhûşt, ew dixweze çî bêje. Li ser vê yekê bi yekser hevsarên hespê berda û hesp di navbera kevir û qûman de bi ya xwe beziya û dest bi çargavî kir. Sîmyager, bédeng bédeng ew dişopand; bi vî awayî hespê xortî bi qasî nîv saet beziya. Êdî herdu ji nedikarîn darên xurmeyên Wehayê bibînin, êdî bi tenê ev ronahiya hîva bê emsal û zinarên ku bi ronahiya hîvê wek zîv

dibiriqîn, hebûn. Li cîhekî, ku ew heta niha qet nehatibû wê derê, xort ji nişka ve sehkir, hespê wî giran bûbû.

- Li vê derê jiyan heye, got ji wî re. Ez zimanê çolê nizamim, lê hespê min zimanê jiyanê dizane.

Ji hespên xwe piyabûn. Sîmyager qet tiştek negot. Bi bêdengî meşiya û dest bi nihêrîna keviran kir. Yekser sekîni, bala xwe da axê û hinekî xwar bû. Li erdê, di nabera keviran de qulek hebû; Sîmyager, destê xwe xiste qulê, paşê ji hemû milê xwe... Di hindurê qulê de tiştekî leqiya û çavên Sîmyagerî, ku wan şahidiya hewildanên wî dikirin (Xort bes çavên wî diditin) qurmiçîn. Milê wî, wek di qulê de bi tiştekî re şer fikir. Sîmyager, paşê bi tevgerekê, ku pê wî bitirsîne, ji nişka ve milê xwe kişand û rabû ser xwe. Di destê wî de marek hebû, wî bi poçkê marê ve girtibû.

Xort ji qilda, lê berev paşvepê. Mar wek dînbûyî hawildida, bi deng û fitika xwe di tenhatiya saharê de deng vedida. Ev, marekî kobra yê bi berçavk bû û jehra wî dikaribû mirovek di nav çend deqeyan de bikûje.

"Li jehrê diqet bike," xort di hindurê xwe de got. Lê mar ji zûde Sîmyagerî, ku wî destê xwe xistibû qulê, kit kiribû. Lê dişa ji rûyê Sîmyager pir sakîn bû. "Sîmyager du sed salî ye," Îngilîzî gotibû ji wî re. Nexwe ew dizane, li hember marên çolê divê çi bike.

Xort mêzekir, hevalê wî çû cem hespê xwe, şûrê xwe yê bi şiklê hilal girt destê xwe, bi vî nîv çemberek li erdê xetand û mar, ji nişka ve bû cemed û ma.

- Netirse, Sîmyager ji wî re got. Ew nikare ji xetê derkeve. Te jiyana li saharê keşif kir, ji bo min jî ya pêwîst, îşaret bû.

- Ev yek bo çi ew qas girîng e?

- Ji ber ku Pîramîd tam di navenda çolê de ne.

Xort nedixwest di derbarê Pîramîdan de çi tişteki bibîhîse. Ji duhê êvar de dilê wî bi keser û bi qisawet bû. Elesas berdewamkirina lêgerîna xezîne dihat wê wateyê; divê ew ji Fatimayê veqete.

- Ez ê li saharê rêberiya te bikim, Simyager di vê navberê de gote wî.

- Ez dixwezim li Wehayê bimînîm, xort ji wî re got. Ez rastê Fatimayê hatim. Û Fatima, ji bo min ji xezîne qiyemettir e.

- Fatima qîzeke saharê ye. Ew dizane, mêr ji bo vegeerê, mecbûrê çûyîne ne. Wê ji zûde xezîna xwe dît: Wê tu dîtî. Niha ew li bendê ye, ku tu ji lêgerîna xwe bibînî.

- Baş e, eger ez biryara mayîne bidim?

- Tu ê bibî Mûşawirê Wehayê. Gelek perên te hebin û tu ê bikaribî bi van peran gelek hêştir û miyan bikirî. Tu ê bi Fatimayê re bizewicî û hûn ê du salan bi dilşahî bijîn. Ji ber ku tu ê fêrê evîne bibî û pencî hezar darên Wehayê binasî. Tu ê bibînî da ew çawa gêşdibin û ew ê rayê te din, ku cîhan çawa û bê rawestî diguhere. Piştî demekê, tu ê îşaretan baştir û rastir şîrove bikî, ji ber ku çol, mamosta mamosteyan e.

Li sala dûyemîn tu ê bînî bîra xwe, ku xezîneyek hebû. Îşaretan, bi israrî behsa wê bikin û tu ê heta ji te hatiye hewil bidî, ku wan nebîhîsî û nebînî. Zanabûna xwe bes ji bo Weha û sakînen wê bi kar bînî. Serokan, ji ber vê hindê bi dilekî minetdarî ji te hez bikin. Hêştir dê ji te re pere û qudret bînin.

Sala sêyemîn, îşaretan dê berdewama behsa xezîne û Menkibeya Şexsî ya te bikin. Bi roj û bi şev, tu ê di nava wehayê de bigerî û bisekinî û ji ber ku te ji rûyê wê berdewama rêya xwe nekirî, Fatima jî, dê bibe jîneke bi

keder. Lê tu ê hê jî wê hezbikî û ew jî, ji te hezbike. Tu ê bînî bîra xwe; wê nexwestibû tu li wir bimînî, ji ber ku jîna saharê libendebûna vegera mêrê xwe dizane. Ji ber vê sedemê jî, tu ê jê nexeyîdî. Lê belkî tu ê bifikirî, berdewamkirina rêya te û bi bawerbûna te ya bi evîna Fatimayê pêwîst bû, tu ê di nav qûmên çolê û darên xurmê de bê sekan û bê westan bimeşî û bigerî. Ji ber ku sedema mayîna te ya li Wehayê, di eslê xwe de tîrsa te ya nevegerê bû. Eve, tam di wê demê de, îşaret dê ji te re bêjin, ku xezîna te ebediyen li axê gorandî ye.

Sala çaremîn, ji ber ku te guhê xwe nedayê wan, îşaret dê rûyên xwe ji te biguherînin. Serokên qebîlê ew rewşa te fêmbikin û tu ê ji erka Mûşawirî werî ezilkin. Tu ê wê çaxê bibî tûcarekî dewlemend ê xwedî mal û milk û birên hêştiran. Lê tu ê rojên xwe yên ji vê şûnde bi fikreke wiha û bi gereke di navbera çolê û darên xurmê de derbas bikî; te Menkîba Şexsî ya xwe pêk neaniye û ji bo pêkanîna vê jî, êdî dem ji mêj de derbasbûye.

Divê tu fêm bikî, li ber çûyîna mêrekî li peyî Menkîba xwe ya Şexsî de, eşq ti car astengiyekê nîn e. Gava tişteki wîsa qewimibe, baş pê bizanibe, ku ew eşqa bi Zimanê Gerdûnê qisedike ne ev e, yanê ev yek, ne eşqa rastî ye.

Sîmyager, çembera ku wî li axê xetandibû, rêçkir û kobra jî, ji nişka ve dûrket û çû nav keviran.

Xort, Tûcarê Bîlûriyê, ku wî daîm xwestibû biçe Mekkê û Îngîlizî, ku li Sîmyagerî digeriya, difikirî. Jîna bi çolê bawerbûyî, difikirî. Çolê, rojek ji rojan, ew merê, ku wê dixwest dilê xwe bide wî, jê re anîbû.

Li hespên xwe sîwarbûn. Ev car jî wî xortî, ew dişopand. Bayê, guregura dengê Wehayê dianî guhên

wî. Xort, hewil dida dengê Fatimayê bibihîse. Wê rojê ji ber şer, neçûbû birê.

Lê şevê, gava wan li marê, ku di nav çemberekê de wisa bê tevger disekinî dirihêrîn, wi sûwarê xerîb ê li ser milê xwe bazek dianî, ji wî re behsa evînê, xezîneyê, jinên saharê û Menkîbeya Şexsî ya wî kiribû.

- Ez ê bi we re werim, xort ji wî re got. Û yekser di hindurê xwe de hûzûreke mezin hîs kir.

- Sibê, berî rojê, em ê bi rê kevin.

Bersiva Sîmyagerî bi tenê ev hevok bû.

★

Institut kurde de Paris

XORT, KIR NEKIR BI ŞEV XEWA WÎ NEHAT. BERÎ derketina rojê, wî, yekî ji zarokên bi wî re li konî dimînin hişiyar kir û jê xwest, bila cîhî ku Fatima li wê derê dimîne, rayê wî bide.

Paşê jê rica kir, bila biçe cîhî ku ev qîza ezeb li wê dinive bibîne, wê hişiyar bike û jê re bêje, ew li derve li benda wê ye. Erebe gênc gotina wî kir û li gel vê çêyiya xwe, qasî perê miyekê jê pere sitand.

- Niha me bi tenê bihêle, got ji zarokê re. Zarok, ji ber ku alîkariya Mûşawirê Wehayê kiribû, xwe pir bi rûmet his dikir û di aliyekî din de jî, perê miyekê qezenc kiribû; zarok ji ber van sedeman pir dilşa bûbû, dîsa çû vegeriya konê xwe û ket xewê.

Fatima li ber çadîrî xûyabû. Bi hev re berev darên xurmê meşîyan. Xort dizanibû, kiryarên wî dijê Kevneşopiyê bû, lê êdî qet qiyemeteke vî tiştî tunebû.

- Ez diçim, got. Û ez dixwezim tu bizanîbî, ez ê vegerim. Ji ber ku ji te hez dikim.

- Qet tişteki nebêje, Fatimayê gote wî û gotinên wî birî. Mirov ji bo ku hez dike, hez dike. Sedemeke evîne tune.

Lê, xort dîsa jî bersiv da:

- Ji te hez dikim, ji ber ku min xewnek dît; paşê rastê keyserekî hatim, min bîlûriye firotin, ji çolê derbas bûm, qebîle bi hev re ketin şerekî mezin û ji bo fêrbûna cîhê

Sîmyagerekî çûm ber bîrekê. Ji te hez dikim, ji bo ku ez ji te hez bikim, hemû Gerdûn hevkarî kir.

Hevûdu hembêz kirin. Bedenên wan cara yekemûn bû, li hev dizeliqîn.

- Ez ê vegerim, xort ji wê re got bi careke din.

- Berî niha, gava ez derdikeitim çolê, min xwestekek hîs dikir. Lê ji vê û şûnde êdî hêviyeke min dê hebe. Bavê min rojekê çû, lê paşê rojekê li dayka min vegeriya û ew çî wext biçe, dîsa vedigere.

Ji bilî vê, çî tiştêkî qise nekirin. Di nav darên xurmê de hinek meşîyan. Xort, qîza ezeb anî heta ber derê konê wê.

- Bavê te çawa li dayka te vedigere, ez ê ji wisa li te vegerim, wî gote wê.

Wî sehkir, çavên Fatimayê tijî bûne:

- Tu digrî?

- Ez jineke saharê me, wê got û bersiv da, bi guhertina îfadeya rûyê xwe. Lê berî her tiştî, ez jinekê me.

Fatima çû konê xwe. Hinek şûnde roj ê derketiba. Gava roj derket, ew ê derketiba derve û karên xwe yên wê daîm ew dikirin, bikira, lê her tişt guherîbû. Xort ji Wehayê veqetiyabû û êdî mena Wehayê dê nebûya mena wê ya heta duhê. Ev der êdî ne ew weha bû, ku tê de pêncî hezar darên xurmê û sê sed birên avê hebûn û gava gerok dihatin û xwe digîhandin vê derê, şa û dilşa dibûn. Ji îro û pê ve, Weha, ji bo wê, mekaneke vik û vala bû.

Ji îro û pê ve, çolê, ji Weha zêdetir girîngiyek qezenc kiriba. Wê, dema xwe bi temaşekirina saharê û bi vê ramanê ve derbas kiriba; gelo xort, di lêgerîna xezîna xwe de kîjan stêr ji xwe re wek rêber hîlbijardiye. Wê, ji

xort re, bi bayê ve maçikên xwe dişand û wisa hêvî dikir,
ba dê here û li rûyê wî keve û ji wî re bêje, ew bixwe di
jiyanê de ye û wek jinekê, ku li hêviya mêrekî cesûr ê li
peyî xewn û xezîna xwe dimeşe, radiweste.

Ji îro û pê ve, çol dê bibûya bi tenê rimza tişteki:
Hêviya vegera wî.

Institut kurde de Paris

TIŞTÊN KU TE LI PEYÎ XWE HÎŞT, NEFIKIRE,"
Sîmyagerî got, dema bi hespên xwe li ser qûmên çolê diçûn. Her tişt li Rûhê Gerdûnê hatiye kolandin û heta bêdawî dê li wê derê bimîne.

- Mirov ji çûyîne zêdetir, xeyala vegeerê dîkin, xort ji wî re digot û hêdî hêdî hîne bédengiya saharê dibû.

- Tiştî ku te ew dîtî, eger ji madê saf hatibe çekirin, ew ê ti car nerize. Û rojek tu ê vegeerî wê derê. Mîna teqîna stêrekê, eger ew ji bilî ronîya lezekê, qet tişteki nebe, wê çaxê di vegera xwe de tu ê çî tişteki nebînî. Lê dîsa jî, tu ê teqîna stêrekê bibînî. Bi tenê ev yek jî, hêjayê zehmetkişandina jiyîne ye.

Mêrik bi zimanê sîmyayî diaxifî. Lê xort fêr dîkir, rêhevalê wî behsa Fatimayê dike.

Ne mûmkûn e, mirov tiştên li peyî hîştine nefikire. Çol, bi xûyanîya xwe ya hema hema qet nayê guhertin, her dem bi xewnan ve xwedî dibû. Darên xurmê, birên avê, rûyê jînkê hezkirîya wî qet ji ber çavên xortî nedîçûn. Îngîlîz û labaratuwara wî, hêştirvanî, ku ew di eslê xwe de xocyekî bû lê wî jî ev yek nedizanîbû, qet ji ber çavên xortî nedîçûn. "Belkî jî, Sîmyager di jiyana xwe de qet aşîq nebûye," xort xwe bi xwe got.

Sîmyager li ser milê wî bazê wî, li pêş diçû. Bazê, bi tevayî zimanê saharê dîzanîbû û gava wan bihnek didan, ew ji ser milê Sîmyagerî difirîya û diçû lêgerîna xwarîne. Roja yekem kêrwişkek anî. Roja duyem jî du teyir.

Êvaran, kulavên xwe li erdê radixistin, lê agir venedixistin. Hewa bi şev pir sar bû û gava hîv li asîman hêy diçû biçûk dibû, şev jî tarîtir dibû. Heftiyek, di nav bêdenhgiyê de meşîyan; ji bilî tedbîrên ku ji bo nekevin orta şer, qet tiştek qise nedikirin. Şerê di navbeyna qebîleyan de hê berdewambû; carina, bêhna xwîna xavî ku bayê ew dianî, dihat pozê wan. Nexwe di nêzîkan de şerekî bûbû û bayê, bi vî awayî ev tişt dianî bîra xort; Zimanê Îşaretan heye û amade ye, ew tiştên bi çav nayêne dîtin, nişanê mirov bide.

Êvara roja heftemîn a rêwîtiya wan, Sîmyager biryar da, ku ew ê ji her wextê zûtir, îstîrihet bidin. Baz çû nêçîriyê. Sîmyager matera xwe derxist û av da xort.

- Eve, piştî demeke kin rêwîtiya te dê xilas bibe, got. Tu li peyî Menkîba Şexsî ya xwe çuyî: Ez te pîroz dikim.

- Lê hûn bêyî ku tiştekî bêjine min, rêberiya min dikin. Min hêvî dikir, hûn ê hemû zanabûna xwe fêrê min bikin. Berî demekê, min bi yekî, ku destê wî de pirtûkên sîmyayî hebûn, rêwîti kir. Lê ez ji wî çî tiştek fêr nebûm.

- Bi tenê yek rêgeha fêrbûnê heye, Sîmyagerî gote wî. Rêgeha Bizavî. Tiştî, ku divê tu bizanîbî, rêwîtiya te ew hemû fêrê te kirin. Bes tiştekî tenê ma.

Xort xwest fêrbe, ev çî tişt e, lê Sîmyager, li rêya vegera bazê xwe çavdêrî dikir, çavên xwe li asoyê çikandibû.

- Ji bo çî ji we re dibêjin Sîmyager?

- Ji ber ku ez Sîmyager im.

- Baş e, ji bo çî ew sîmyagerên, ku zêrê digerin, lê wî nikarin bibînin, di vî karî de sernakevin.

- Ew bes zêrê digerin, bêyî ku Menkîba xwe ya Şexsî bijîn. Li xezîna Menkîba Şexsî ya xwe digerin.

- Hê çi tişt maye, ku divê ez bizanim, xort jê pirsiyar kir.

Lê Sîmyager çavên xwe ji asoyê venediqetand. Piştî demekê, baz bi nêçîrê xwe ve vegeriya. Ji bo ku ronîya alazên agir neyê ditin, çalek çekirin û tê de agir vêxistin.

- Ez Sîmyagerekî me, ji ber ku ez sîmyager im, got, gawa wî xwarin amade dikirin.

Ez ji bav û kalên xwe fêrê vê zanistê bûn, ew ji ji bav û kalên xwe fêrbûne. Û ev yek, ji afirandina cîhanê û vir de wisa ye. Di wan çaxan de hemû zanistiya Avahiya Mezin li ser zûmrûdekê dihat nivîsandin. Lê mirov mêla xwe dan ser tiştên basît û dest bi nivîsandina pirtûkan, şîroveyan û lêkolînên felsefî kirin. Û di ser de jî, xwe rahiştin ku îdîa bikin, rêgehên herî baş ew dizanin.

- Li ser Lewha Zûmrûdî de çi hatibû nivîsandin? xort ji wî pirsiyar kir.

Li ser vê yekê, Sîmyager li ser qûmê dest bi xetandina hûn tiştan kir û ev kar ji pênc deqe zêdetir nekişand. Gava Sîmyager berdewama xetandinê dikir, xort, ew keyserê pîr û meydana, ku li wir rastê wî hatibû, difikirî; ji wî wetrê, ji navberê gelek salan derbas bûbûn.

- Tiştî li ser Lewha Zûmrûdî hatibû nivîsandin ev bû, Sîmyager got, gava wî karê xwe qedandibû.

Xort nêzikî bû û dest bi xwendina peyvên li ser qûmê hatiye nivîsandin, kir.

- Ev yek şifreyekî ye, xortî got. Ji ber Lewha Zûmrûdî ketibû nav xeyalşikestinekê. Mîna ku di pirtûkên Îngîlîzî de jî ev tişt nivîsandî bûn.

- Na, Sîmyager ji wî re got. Ev mîna firîna başokê ne: Fêmkirina wê ya bi tenê hizrê ve, ne mûmkûn e. Lewha Zûmrûdî, bihûrek e, rast bi rast diçe Rûhê Gerdûnê.

- Zana tégîhîştin, ku cihana xwezayî ji bilî wêne û sûreteke ji bihiştê çî tişteki nîn e. Tek rastiyeke ev e; cihana heyî, temînata hebûna cihaneke ji vê mûkemeltir e. Xwedayî, ev cihan afirand, ku bila mirov, bi rêya tiştên xûyayî, ramanên manevî û mûcîzeyên zanabûnê tégîhîjîn. Ez ji vê re Bizav dibêjim.

- Ma divê ez jî Lewha Zûmrûdî fêr bikim? xort jê pirsîyar kir.

- Eger tu di labatuwara sîmyayî de bibûyayî, niha tam dema wê bû, ku te lêkolîna baştirîn a rêgeha fêrbûna Lewha Zûmrûdî kiriba. Lê tu niha li çolê yî . Madem wisa ye, ya herî baş di nav saharê de biperûje û biçe. Ji bo tu cihanê û di eynî demê de jî, tişteki li rûyê erdê fêr bikî, ew alikariya te dike. Pêwîstiya te ya bi tégîhîştina saharê jî tune: Libeke qûmê temaşê bike, ew jî bes e; tu ê wê çaxê, li wir hemû harîkayên gerdûnê bibîn.

- Ji bo ponijîna li nav çolê, divê çî bikim?

- Guhdariya dilê xwe bike. Dilê te her tiştî dizane, ji ber ku ew jî Rûhê Gerdûnê tê û rojekê, ew ê dîsa vegere wê derê.

★

BI BÊDENGÎ, DU ROJAN DÎSA MEŞIYAN, JI BER KU ew hatibûn nêzîkî cîhî ku li wir şerên herî bi şidet hebû, Sîmyager bi dîqeteke mezin tevdigeriya. Û xort jî, bi hemû hêza xwe ve hewildida dengê dilê xwe bibihise. Bihîstina vî dilî, ne karekî ew qas hêsan e. Di wexta xwe de daîm amadeya birêketinê bû, lê were û bibîne ku niha çi dibû bila bibûya, dixwest xwe bigihîne. Dilê wî caran demeke dirêj çîrokên dilkeser digote wî û disekinû; caran jî, li ber derketina rojê, xort bi heyecan dikir û dizî dizî ew dida gîrandin. Gava wî behsa xezîne ji wî re dikir, dilê wî bi lez û bez dest bi lêdanê dikir û gava çavên xort li asoya bêdawî ya li çolê daçîkî dima, lêdanên wî giran dibûn. Lê xort, bi Sîmyagerî re yek kelîmeyek qisenekirba jî, ev dilê hanê qet bêdeng nedibû.

- Ji bo çi divê em guhdariya dilê xwe bikin? got û pirsî, di bêhindana êvarekê de.

- Ji ber ku dilê te li kûderê ye, xezîna te jî li wê derê ye.

- Dilê min bi keser e, bi ba ye, xortî got. Xewnan dibîne, bi heyecan dibe û aşîqê qîzeke saharê dibe. Pir tiştan jî min dipirse û gava ez qîza çolê difikirim, bi şev û rojan min bê xew dihêle.

- Çi qas baş e! Nexwe dilê te jiyande ye. Berdewam bike, guh bide ser wî.

Piştî çend rojan ew herdu li rastê gelek şervanan hatin. Dilê xortî dest bi behsa tirsê kir. Dilê wî, çîrokên,

ku ji Rûhê Gerdûnê bihîstibû digote xort. Ev çîrok, çîrokên kesên, ku li xezîna xwe digerin û ti car nabînin bûn. Caran jî, dilê wî ew dida tirsandin bi ramana, ku ew ê ti car xwe negîhîne xezîna xwe û rojek li çolê bimire. Bi caran jî, ji bo ku ew rastê sûltana dilê xwe bûya û gelek lîrayên zêr qezenc kiriye, dilrihetî û dilgeşiya xwe digote xort.

- Dilê min xayînek e, got ji Simyagerî re, gava ew ji bo hinek bîhna xwe bidin rawestiyabûn. Naxweze ez berdewam bikim.

- Çi qasî baş e, Simyager bersiv da wî. Ev yek jî dide diyarkirin ku dilê te zindî ye: Tiştên te heta niha qezenc kirîne, niha bi xewnekê ve dixî nav xeteriya windakirinê; ma ne ew qas tabî ye, dilekî ji vê xeteriyê bitirse.

- Madem wisa ye, bo çi ez mecbûrê guhdarkirina dilê xwe me?

- Ji ber ku ti car tu nikarî wê bê deng bikî. Hetta, eger tu qet guh nedî wî jî, ew dişa li wê derê ye, di singê te de ye; ew ê ramanên xwe yên li ser jiyana û cîhanê daîm ji te re dubare bike.

- Eger ew xayînek jî bibe?

- Xiyanet, darbeyek e, ku tu ne li bendê yî. Eger tu dilê xwe bi xwe re bigerînî, ew ê tu car di hêrişa ser te de sernekeve. Ji ber ku tu ê xewin û xestekên wî binasî û wan bigirî ber çavên xwe. Hiç kesek nikare ji dilê xwe bireve. Ji ber vê jî, ya baştir ew e, mirov guhdariya wî bike. Bi vî awayî, darbeyekê, ku tu ne li bendê yî, yeqîn wê li te nexe.

Xort, hem li saharê dimeşiya û hem jî berdewama guhdariya dilê xwe dikir. Qurnaziyên wî, hîle û xurdeyên wî fêrbû û di dawiyê de wî, dilê xwe wisa pejirand. Li ser vê yekê, êdî tîrsa xwe terikand, daxweza

vegerê bi cîh hîşt; ji ber ku dilê wî, êvarekê, ji wî re gotibû, ku ew dilşa ye. "Eger min hinek gilî û gazind kir," digot dilê wî ji wî re, "ji bo ku ez dilekî mirov im û dilê mirovan ji wisa dibin. Ew ji pêkanîna xewnên xwe yên mezintirîn pir ditirsîn, ji ber ku ew difikirin, layiqê xwegîhandinê nîn in, an jî ji wan wetrê ew ê xwe negîhînin armanca xwe. Evînen, bêtî ku vebijîn bi dawî bûne, demên ku ew dikarin mûhteşem bibin lê nekarîne, xezîneyên, ku divê bêne dîtîn lê heta bêdawî di binê qûman de mane, ev hemû gava tene bira me, ji ber ku em dil in, em dimrin. Ji ber ku wexta em bi rewşeke wisa rû bi rû bibin, êşên wek mirin dikişînin.

- Dilê min ji kişandina êşê ditirse, got ji Sîmyagerî re, şevêkê, gava wî li asîmanê bê hîv dihihêrî.

- Ji dilê xwe re bêje, tîrsa êşê jî êş xirabtir e. Eger li peyî xewnên xwe be, qet dilêkî êş nakîşîne. Ji ber ku her dema lêgerînê, dema pêşwaziya bi Xwedayî û Bêdawayî ye.

"Her dema lêgerînê, dema pêşwaziyê ye. Gava ez li xezîna xwe digeriyam, her rojên min birqîn birqîn bûn, ji ber ku min dîzanîbû, her saet parçekî xewna dîtîna wê bû. Gava ez li xezîna xwe digeriyam, li ser rêya xwe min tiştên wisa keşîf kirin ku, ev cesareta min a mezin nebûya, -ku ev cesaret ji bo şivanekî, tiştêkî bê îmkân emîn nedikarî xeyala ev tiştên ez rastê wan hatime jî bikim." Li ser vê yekê dilê wî, di demeke piştî nivroyê de seranser bi rihet bû. Û li şevê, ket xeweke kûr. Dema xort hişiyarbû, dilê wî ji wî re dest bi pêşanîdana karên Rûhê Gerdûnê kir. Jê re got, her mirovek dilşa, ew însan e, ku di hindurê xwe de Xwedayî digerîne. Û eynî wek gotina Sîmyagerî, di yek libekê qûmên çolê de jî mirov dikare dilşahiye bibîne. Ji ber ku liveke qûm jî, dema Xaliqînî ye

û Gerdûn, ji bo afirandina wê livê, bi milyonan bi milyonan salan pê mijûl bûye. "Di rûyê erdê de ji bo her însanek xezîneyek heye û li bendê ye," dilê wî got ji xortî re. "Em dilan, em mirovan, ji ber ku em êdî naxwezin ev xezînan bibînin, êdî qet qala wan jî nakin, naxwezin bikin jî. Em qala wan ji zarokên biçûk re dikin. Piştî, em jiyanê dixwezin, ku bila ew her kes bişîne çarenûsa xwe. Çi heyîf e, ku pir kêman însan rêya ji bo xwe çêkiri dişopîne; lewra ev rê, rêya Menkîba Şexsî û dilşahiye ye. Pîraniya mirovan wisa difikirin, ku cihan cîhekî erjeng û bitirs e û bes ji ber vê yekê jî, bi rastî cihan dibe cîhekî bitirs. Wê çaxê em dilan, em jî bi dengekî nîzmtir dest bi qisedanê dikin, lê em ti car hiş nabin. Me ji mirovan re rêyek xetand û ew jî, ev rêya neşopandin û em naxwezin, mirov ji ber vê sedemê êş bikişînin.

- Baş e, ji bo çi dil nabêjine me, em mecbûrê lipeyçûna xewnên xwe ne? xort ji Sîmyager pirsîyar kir.

- Ji ber ku di vê rewşê de tiştî ku herî pir êş dikişîne jî, dil bi xwe ye. Û kişandina êşê jî xweşa wan naçê.

Xort, ew roj dilê xwe guhdar kir. Ji wî xwest, bila ew ti car wî neterikîne. Ji wî xwest, gava ew ji xewnên xwe dûrket, bila di singê wî de xwe bişidîne, wî şiyar bike û îşaretên şiyarkirinê bişîne. Û ji dilê xwe re sund xwend, ku ew çi wext vê îşaretê bibîhîse, ew ê bala xwe bidê ser.

Xort, wê şevê, ev mijaran hemû bi Sîmyagerî re axîfî. Û Sîmyagerî tégîhişt, ku dilê xort vegeyriyaye Rûhê Gerdûnê.

- Divê ez niha çi bikim? xort pirsîyarkir.

- Berev Pîramîdan berde wama meşa xwe bike, Sîmyager ji wî re got. Û bala xwe bide ser îşaretan. Dilê te hatiye wê rewşê, ku xezîna te rayê te bide.

- An, tiştî ku ez hê nizanîm ev e?

- Na. Tiştî ku tu hê nizanî ev e, Sîmyagerî gote wî:

Rûhê Gerdûnê qiymet dide her tiştên ku berî pêkanîna xewnekê, di rê de hatine fêrbûn. Ne ku ew ji bo me hestên xirab hîs dike û ji ber vê sedemê, wisa tevdigere: Ew dixweze, em li gel pêkanîna xewnên xwe, ew dersên ku em di pêşketina di rêya xwe de hildidin, baş fêrbibin. Lê gelek mirov, tam jî di vê demê de xewna xwe diterikîne. Di zimanê saharê de em vê rewşê wisa tarîf dikin: Mirina ji tibûnê, ku gava palmiyeyên Wehayê li aso tê dîtin. Lêgerîn her daîm bi şansê ecemîtiyê dest pê dike. Û dîsa her daîm jî bi Îmtana Fatîhê ve bi dawî dibe. Xort, gotineke kevin a bav û kalan a ji welatê xwe anî bîra xwe: "Dema tarîtirîn, dema berî berbangê ye."

ÎŞARETA EWIL A XETERIYA VEKIRÎ DI ROJA DIN DE hat dîtin. Sê şervan hatin û ji herdu rêwiyan pirsîn, ku ew li van deran çi digerin.

- Ez hatim, bi bazê xwe ve nêçirî bikim.

- Divê em we bigerin, hela sîlehên we hene an na? şervanekî got.

Sîmyager giran giran ji hespê xwe piyabû. Hevalê wî jî wisa kir.

- Ji bo çi, li ba te ew qas pere hene? şervanekî pirsî, gava wî tûrê pere yên xortî dît.

- Ji bo herim Misrê, xort bersiv da.

Şervanî, her cihên Sîmyagerî lêgeriya û şûşeyeke krîstal a bi av tijî û yek ji, hekeke zer a ji camê, ku ji hêka mirîşkan hinek girtir bû, dît.

- Ev çi ye? şervanî jê pirsî.

- Kevirê Felsefê û Îksîra Jiyana Bêdawî. Avahiya Mezin a Sîmyageran. Ji vê avê kê vebixwe, bi yeqîn hîç nexweş nabe û parçekî biçûk ê ji vî kevirî, dikare madenek vegeirîne zêrê.

Sê şervan bi dengê bilind kenîyan. Sîmyager jî bi wan re kenîya. Wan bersiva wî pir bi henekî dîtibûn. Ji ber vê yekê jî, qet dijarî li ber wan dernexistin û ev herdu rêwî jî, bê zehmetî, eşyayên xwe girtin û çûn.

- Hûn dîn in? xort ji Sîmyager pirsî, gava ew hinek dîrketibûn. Ji bo çi we bersiveke wisa da wan?

- Ji bo ku min dixwest, qanûneke pir basît a jiyanê rayê te bidim. Gava li ber çavên me de xezîneyên pir mezin hebin, em ti car wan nabînin. Baş e, ma ji bo çi, tu dizanî? Ji ber ku mirov li xezînan bawer nakin.

Li çolê berdewama meşa xwe kirin. Roj diçûn, dilê xort bédengtir dibû. Êdî bi bûyerên çûyî û mayî re eleqeder nedibû, ew jî êdî bi temaşekirina çolê û bi tevî xortî, bi vexwarina Rûhê Gerdûnê ve çavtêr dibû. Xort û dilê wî êdî bûbûn herdu dostên, ku wê ti car li hev xiyaneti nekin.

Caran, di dawiya saetên dirêj û bédeng de xort diwestiya û dil jî, bes di van deman de ji bo ku wî bi rihet bike, wî firehtir bike, bi cesaret bike, qise dikir. Dilê wî, berî, ji wî re, behsa taybetiyên wî yên bilind kir. Ji cesareta wî ya, ku ji bo ew ji miyên xwe veqete diviyabû, ji jiyandina wî ya Menkîba Sexsî ya xwe, ji coşa wî ya, ku gava ew di firoşgeha bilûriyê de dixebitî xwe îsbat kiribû, behis dikir.

Dilê wî ji wî re behsa tiştêkî din jî kir, ku xort heta niha qet ew seh nekiribû: Ji rizgarbûna wî ya ji xeteriyan, bêyî ku seh bike. Di yekê de, şeşagîrê bavê xwe dizîbû û veşartibû. Lê bê guman wî dikarîbû xwe birîndar bike. Dilê wî anî bîra wî, ku ew di serê çiyê de nexweş bûbû. Xort verişiyabû û piştî jî, demeke dirêj di xew re çûbû. Lê, tam di vê demê de, du rêbir, du haydût, hinek li wî alî li benda wî bûn û wan pîlanek çekiribûn ku wî bikûjin û paşê jî miyên wî bibin. Lê gava wan dîtine, ku şivanê gênc nehat, qotine qey wî rêya xwe guherandiye û ji ber vê jî, rêbir ji wir dûrketine û çûne.

- Dil daîm alîkariya mirov dikin an na? xort ji Sîmyager pirsîyar kir.

- Bes alikariya kesên, ku ew Menkiba xwe ya Şexsî dijin, dikin. Lê alikariya zarokan, serxweşan û mirovên pîr jî dikin.

- Madem wisa ye, ev yek tê wateyê, ku xeterî nîn e.

- Ev yek bes tê wateyê, ku jî destên dilan çî tê, dikin, Sîmyager bersiv da wî.

Êvarek, jî ordigeheke jî wan qebileyên ku şer dikin derbas bûn. Di her aliyan de Ereben, ku amadayê bikaranîna silehên xwe ne û cil û bergên sipî û mûhteşem li xwe kirine hebûn. Ev zilamna nargîle dikişandin û bi behsa şerê leqirdiyan dikirin. Qet kesek bala xwe neda herdu rêwiyan.

Hiç xeteriyek nîn e, xort got, gava ew hinek jî wan dûrketibûn.

Sîmyager bi hêrs ket.

- Bi xwe bawer be, got, lê jî bîr jî neke, ku tu li çolê yî. Dema mirov şer dikin, Rûhê Gerdûnê jî qêrînên wan dibîhîse. Qet kesek nikare xwe xilas bike jî bûyerên ku di binê asîmanê de çêdibin.

"Her tişt bi tenê yek tiştek e," xortî di hindurê xwe de got.

Û mîna ku çol dixweze gotinên Sîmyagerî rast derbixîne, jî nişka ve du sûwar li peyî rêwiyan xûya bûn.

- Hûn nikarin jî vê zêdetir ber bi pêş herin, got jî wan yekî. Hûn niha di nav herêma şer de ne.

- Ez naçim pir cihê dûr, Sîmyager got û li nav çavên sûwaran mêzekir.

Sûwar, jî bo demekê qet tiştek negotin, paşê jî, îzna rêwiyan dan, ku berdewama rêya xwe bikin.

Xort, heyran heyran li wan nihêribû.

- We bi awirên xwe ve serî li zilaman tewandin.

- Çav, hêza giyanî didin diyarkirin, Sîmyager got û bersiv da.

"Rast e," xort xwe bi xwe got. Wî sehkiribû, li ordîgehê, zilamekî li nav leşkeran, çavên xwe li ser wî û Sîmyagerî çikandibû. Ji ber ku zilam ji wan pir dûr bû, rûyê wî nedihat hîlbijartin. Lê ev yeqîn bû, vî zilamî çavdêriya wan dikir.

Di dawiyê de gava ew ji rêzeke çiyayên berev xeta asoyê hildikişyan, Sîmyager ji wî re got, ji vê derê heta Pîramîdan rêya du rojan maye.

- Eger em mecbûr in, di demeke kin de ji hev veqetin, ji kerema xwe sîmyayê fêrê min bikin, xort gote wî.

- Tu êdî her tiştî ku divê bizanîbî dizanî. Bi tenê tişteki dimîne; nûfûzkirina li ser Rûhê Gerdûnê û keşîfkirina xezîna, ku ew ji me her kesek re hatiye veqetandin.

- Ez naxwezim vê yekê fêrbim. Ez behsa wî tiştî dikim; mirov çawa dikare qirşûnê bike zêr.

Sîmyager rêz li ber bêdengiya saharê girt û bi tenê, gava ew ji bo xwarinê sekinîbûn, qise kir.

- Di Gerdûnê de her tişt ji tekamûlê derbas dibe. Û ji bo kesên zana, zêr, ew madenê, ku herî zêde tekamûl derbaskirî ye. Ji min nepirse, ku çima; ez jî nizanîm. Lê bi tenê vî tiştî dizanîm: Fêrkirinên Kevneşopiyê daîm rast in. Lê mirov nikarin, gotinên zanayan rast şirove bikin. Û zêr, divê bibûya rimza tekamûlê, lê bilekîs bû rimza şeran.

- Heyîna Gerdûnî bi gelek zimanan diaxifin, xortî got. Min berî dît, ku orîna hêştirî bes orîneke îhtiyadî ye, û paşê min dîsa dît, ku ev yek di eynî lezê de rimza xeteriyek e jî; di dawiyê min dît, ev yek orîneke hêştir e û tişteki gelekî îhtiyadî ye.

Lê paşê, xort xwe bê deng kir. Ma Sîmyager ev tiştan hemû nedizanibû.

- Min Sîmyagerên rastî nas kirin, Sîmyager ji wî re got û dest bi axaftinê kir. Xwe li labaratuwarên xwe hepis kiribûn û hewil didan, ku mîn zêrek, xwe têxin nav tekamûlbûnê. Kevirê Felsefê keşif kirin. Ji ber ku wan têgihîştibûn, eger tiştêkî tekamûl derbas bike, ew tiştên li der û dora wî jî tekamûl derbas dikin. Hinekan, Kevir bi tesadûfî dîtin. Jêhatiya wan hebû, rûhê wan jî rûhê kesên din hişiyartir bû. Ev pir kêr in, hewce nake, em wana têxin hesabê. Li dawiyê, hinekan jî hen in, bes li zêrê digerin, evna ti car sirê vê yekê neditin. Ji bîr kirin, ku Menkîba Şexsî ya qirşûnê, baxirê û zêrê jî heye û ew jî dikarin wê pêk binin. Kesên, ku pozê xwe dixin nav Menkîba Şexsî ya tiştên dinê, bi yeqîn ew nikarin Menkîba xwe ya Şexsî keşif bike.

Gotinên Sîmyagerî mîna nîfirek li hawildor belavbû.

Xwarê erdê bû û qewkek ji çolê girt.

- Ev der, berî behîr bû, got.

Sîmyager ji wî xwest, bila ew jî qewkek bigre û bide ber guhê xwe. Di zarotiya xwe de wî çend caran ev tişt kiribû. Wî gawa qewik da ber guhê xwe, dengê behrê hate guhê wî.

- Behîr her dem di nava vê qewkê de ye, ji ber ku ev Menkîba Şexsî ya wê ye. Û çolê, heta ku pêlavên behrê hembêz bike, ew ê ti car wê neterikîne.

Piştî li hespên xwe sêwarbûn û berev Pîramîdên Mîsrê bi rê ve ketin.

Gava dilê xortî îşareta xeteriyê dida, roj diçû ava. Li der û dora wan de qûmûlên bilind hebûn û xort li Sîmyagerî mêzekir; lê diyar e, Sîmyager qet tiştêk seh

nekirbû. Piştî pênc deqeyan, tam di hemberên xwe de du sêwarên, ku siyên wan li cîhê berbangê dikeve, dît. Xort hê devê xwe venekirbû û ji Sîmyagerî re çî tişteki negotibû ku, du sêwar berî bûn deh, paşê bûn sed û di dawiyê de jî, hemû sahar bi sêwaran ve tijî bû.

Şervanan cilên hêşîn li xwe kiribûn, li dora tûrbanên wan de sê xelek hebû. Di rûyê wan de pêçeyên rengîn hebûn û bi tenê çavên wan xûya dibûn.

Ji vê mesafê jî, di çavên wan de hêzên giyanî dixûyan. Û ji van çavan bes peyva mirinê dihate xwendin.

*

Institut kurde de Paris

HERDU RÊWÎ JÎ GIRTIN Û BIRIN ORDÎGEHEKE LI nêzîkî wê derê. Leşkerekî hat û Sîmyager û hevalê wî xist nav konekî, ku ew qas li konên din ên li Wehayê nedişiviya. Di konî de, femanderekî bi tevî zilamên xwe rûdinişt.

- Ev casûs in, got zilamekî ji wan.

- Em rêwî ne, Sîmyager bersiv da.

- Me hûn berî sê rojan di ordîgeha dijmin de dîtin. Û we bi şervanekî re qisekir.

- Ez gerokêkî me, li çolê digirim û stêrkan nas dikim, Sîmyager ji wan re got. Di derheqê yekîneyan û tevgera qebîleyan de hiç agahiyeke min nûn e. Min, bes ji hevalê xwe re heta vê derê rêberî kir.

- Hevalê te kî ye? serok ji wî pirsî.

- Sîmyagerkî, Sîmyagerî got. Hêzên xwezayê dizane. Û ew dixweze ji we femandarê re, hêzên xwe yên derê derfetan diyar bike.

- Biyanîyekî çi dike di axên biyanî de? zilamekî pirsîyar kir.

- Min ji qebîla we re wek taqdîme pere anîn, Sîmyagerê got û ket nav axaftinê, derfet neda, ku xort devê xwe veke.

Û keseya xortî girt û lirayên zêrî da serokê. Serok qet tiştek negot û pere hilda. Ev gelek pere bûn û bi van peran dikaribûn gelek sîleh bistînin.

- Sîmyagerekî çî ye? Zilamê Ereb got û di dawiyê de pirsî.

- Ew mirov e, ku xwezayê û cîhanê dizane. Eger canê wî bixwestiba, bi tenê hêza bayê bikar dianî û ev ordîgeh ser û bin dikir.

Zilam kenîyan. Ew hîne şideta şerê bûbûn û wan dizanîbûn, ku bayê nikare darbeyeke kûjyarî lêxe. Li gel vê yekê, hemû jî hîs kirin, ku dilê wan di singên wan de dişide. Ev mirovên saharê bûn û ji sîhîrbazan ditirsiyan.

- Min dixwest tişteki wisa bibînim, serokê wan got.

- Me sê rojan divê, Sîmyager got. Ji bo ku hêza xwe diyar bike, ew ê bibe bager. Eger ew, di vê kiryarê de ser nekeve, em ê bi hûsnîyeteke mezin, jiyanên xwe ji rûmeta qebîla we re pêşkêş bikin.

- Tiştî ku aîdê min e, tu nikarî pêşkêş bikî, serok bersîveke bi hidet da wî.

Lê ji rêwiyan re sê roj mûsade kir.

Xort ketibû dehşetê û nedikarî di cîhê xwe de bileqe. Sîmyager, ji bo ku alîkariya wî bike û wî derxîne der, mecbûr ma û bi milê wî girt.

- Tîrsa xwe rayê wan nede, got ji wî re. Ev kesên mîrxas in, tîrsonekan biçûk dibînin.

Xort, hêza xwe ya qisedanê windakiribû. Hinek li nav ordîgehê geriyan, incax wî xwe gîhande dengê xwe. Hewce nebû, ku ew li cîhekî girtî bigirtana: Ereban, bi tenê hespên wan ji destê wan girtibûn. Bi vî awayî, Gerdûnê careke din zimanên xwe yên bê hêjmar şanîda: Çol heta niha cîhekî azad û bê hidût bû, lê niha bûbû dîwarekî, ku derbasbûna wî ne mûmkûn e.

- We hemû xezîna min da wan! xort ji wî re got. Her tiştî, ku min ew di tevayî umrê xwe de qezenc kiribû.

- Lê gava tu bihatayî kuştin, xezîna te kêrê çî bihata? Qet nebe, wê jiyana te ya sê rojan rizgar kir. Wisa pir caran nayê dîtîn, ku pere jiyana mirov rizgar bike.

Lê xort, qasî ku ji peyvên hikmetê fêm neke, tirsîyabû. Wî nedizaniyê, ew ê çawa bibe bager. Bi xwe jî ne simyager bû.

Simyager jî şervanekî çay xwest; hinek jî çayê rijand ser zendên xortî. Gava Simyager, tiştên ku wî jê fêm nedikir digotin, di hindurê xortî de pêleke sikûnetê belav bû.

- Radestê bêhêvitiyê nebe, Simyager gote wî, bi dengekî, ku heta ji xwe tê ecêb û nermîn qisedikir. Eger radest bî, tu nikarî bi dilê xwe re biaxîfî.

- Lê ez nizamim, çawa xwe veguherînim bayê.

- Mirovekî eger xwedî Menkîba Şexsî ya xwe ye, pêdiviya wî bi çî hebe, hemûyan dizane. Bi tenê tiştêkî dikare pêkanîna xewnekê bê îmkân bike. Tîrsa binkeftinê.

- Ez jî binkeftinê natîrsim. Bes nizamim, ez ê çawa xwe veguherînim bayê.

- Madem wisa, divê tu fêr bibî. Jiyana te girêdayê vê yekê ye.

- Lê eger ez ser nekevim?

- Ji ber ku te Menkîba xwe ya Şexsî jiyaye, tu ê bimrî. Ev mirîna te baştir e ji mirînê bi milyonan kesên, ku haya wan jî Menkîba Şexsî tunebû û ti car jî dê fêrnebin. Lê netirse. Bi gelemperî mirin, mecbûr dike, ku mirov li hember jiyane bêtir bi dîqet bisekine.

Roja yekemîn derbasbû. Di nêzîkahîyan de şerekî mezin derket, çend birîndar anîn ordîgehê. "Mîrin qet tiştêkî naguherîne," xort di hindurê xwe de got.

Şervanên nû cîhê vala yên mirî tijî dikirin û jiyan wisa berdewam dikir û diçû.

- Ma te dikarîbû paşê jî bimrî, dostê min, şervanekî got, li ber serê cinazê hevalekî xwe. Di dema aşîtiyê de jî te dikarîbû bimrî. Lê di dawiyê de, bi vî şiklî, an jî bi wî şiklî, çer hebe tu ê bimirîba.

Ber bi êvarê, xort çû dîtina Simyagerî. Simyager bi tevî bazê xwe ve diçû çolê.

- Ez nizanim xwe veguherînim bayê, xort got û careke din dûbare kir.

- Tiştî ku min ji te re gotibû, bîne bîra xwe: Cihan, parçekî Xwedê yê ku tê xuyakirin e. Simya jî, bes dikare qudreta manevî berev maddiyetê biherikîne.

- Hûn çi dikin?

- Xwarin didim bazê xwe.

- Eger min nikarî ku xwe veguherînim bayê, em ê bimrin, xort got. Wê çaxê xwedîkirina bazê dê kêrê çi were?

- Tu ê bimrî, Simyager bersiv da. Ez dizanim xwe veguherînim bayê.

Roja dûyemîn, xort çû û hilkişîya li ser serê zinarekî li ber ordîgehê. Nobedaran li ber astengî dernexistin; wan bîhîstibûn, yekî behsa veguherîna bayê kiriye û nedixwestin nêzîkî wî bibin. Di serde jî, çol mîna sûrekî nayê rawirtin bû.

Xort, roja dûyemîn, tev piştî nivro li saharê temaşe kir. Li dilê xwe guhdarî kir. Û çolê jî, guhdariya tirsê dilê xortî dikir.

Herdu jî bi heman zimanî diaxifîn.

Roja sêyemîn, serokê mezin, hemû zabîtên xwe yên bi rûtbebilind gazî kir.

- Hela em biçin li vî zarokî, ku ew ê veguhere bayê, binhêrîn, got ji Sîmyagerî re.

- Em biçin, Sîmyager bersiv da wî.

Xort, ew hemû birin cîhî ku berî rojekê ew hatibû wira. Wî paşê xwest, bila hemû rûnin.

- Ew ê hinek dem bigre, got Sîmyager.

- Ecela me nûn e, serokê mezin got. Em mirovên çolê ne.

Xort, çavên xwe li asoyê çikand û dest bi nihêrînê kir. Ji gelek dûr ve çîyan, qûmûlan, zinaran û nebatên, ku di vî cîhê bêjiyan de ji bo jiyanê li berxwe didan, xûya dibûn. Çar aliyekî wî sahar bû. Saharê, ku ew bi mehan li wê meşiyabû, lê bi tenê qismeke wê ya biçûk nas kiribû. Di vê beşa biçûk de ew li rastê Îngîlîzan, karwanan, şerên qebîleyan hatibû û Wehayeke bi pêncî hezaran darên xurmê û sê sed birên avê ditîbû.

- Tu îro ji min çi dixwezî? çolê ji wî pirsî. Gelo me duhê bi têra dilê xwe li hevûdu temaşê nekir?

- Di qismeke te de ew jinika hezkiriya min dijt. Ji ber vê hindê gava ez li qûmên te yên bê tûxûb temaşê dikim, mîna ku min ew ditiye, dibim. Ez dixwezim li wê vegerim û ji bo ku ez xwe veguherînim bayê, pêwistiya min bi te heye.

- Eşq çi ye? çolê ji wî pirsî.

- Eşq ew dem e, dema firîna bazê di ser te de... Ji ber ku tu ji bo wî şînbûyî û ew ti car ji te, bê nêçîr venegeriyaye. Ew zinarên te, qûmên te û çiyayên te dinase û tu ji wî re gelek comerd î...

- Nikulê bazê parçên min diqetîne, çolê got. Ez bi salan nêçîran xwedî dikim û bi ava ku li gel min pir kême, tîbûna wan dişkênim, ji cîhê xwarinê rayê wan didim û rojek, tam ji ez li bendê me, ku mizdanên nêçîrên xwe

yên germ li ser qûmên xwe hûs bikim, tam di vê demê de ji asîman bazekî dişûje xwarê.

- Lê tu jî, bi yeqîn, ji bo vê dawiyê, wan xwedî û mezin dikî, xort ji wî re got: Ji bo ku bazê xwedî bikî. Û baz dê jî însanê xwedî bike. Mirov jî, rojekê, qûmên te xwedî bikin û ji wir nêçîrek din dê derkeve. Dezgeha dûnyayê wisa ye.

- Ma eşq ev e?

- Belê, ev e. Eşq ew tişt e; bazê vediguherîne mirov, mirovê jî, ji nûve vediguherîne çolê. Ew tişt e, qirşûnê vediguherîne zêr, zêrê jî dixê binê axê û tê de vedişêre.

- Ez gotinên te tînagihim, çolê gote wî.

- Madem wisa ye, vî tiştî fêr bike; cihekî di nav qûmên te de jînek li benda min radiweste. Û li gel bendemana wê, ez mecbûr im, ku veguherim bayê.

Çol demekê, bêdeng ma.

- Ji bo ku bager çêbibe, ez qûmên xwe didime te. Lê ez bi tenê serê xwe nikarim tişteki bikim. Alikariya bayê jî bixweze.

Bayekî sihêl çêbû. Serokên qebîleyan ji dûr ve li xort mêze dikirin, lê ji zimanê wî qet tişteki tînedigihîştin.

Sîmyager tebesûm dikir.

Bayekî sihêl hat û hinarikên xortî mizda. Wî, axaftina xortî bi çolê re bihîstibû, ji ber ku, ba, her dem, her tiştî dizanin. Li cîhanê digerin û difitilin, lê çi cîhên wan ên zayînê heye, çi jî yên mirinê.

- Alikariya min bike, xort ji wehayê re got. Min îro li te, dengê hezkirîya xwe bihîst.

- Axiftina bi saharê û bayê re, kî fêrê te kir?

Xort:

- Dilê min, got û bersiv da.

Gelek navên bayê hebûn. Navê wî yê li vê derê, Bayêkeşîşê bû, Erebb wisa bawer dikirin, ev bayê hanê ji axên avî tîn û li wir mirovên çermêreş dijîn. Navê wî yê li welatê, ku xort ji wir hatiye, Rojhilatê bû; ji ber ku însanên wî welatî ji wisa bawer dikirin, ev bayê hanê, qûmên çolê û qêrîn û qijînên Maxrîbiyan bi xwe re tîne. Belkî li cihên cûda cûda, li cihên dûr ên merayên, ku tê de mî diçêrin jî, mirov bawer dikirin, ew ji Endûlûsê tê. Lê bager qet ji cihekî nedihat û nediçû cihekî û ji ber vê sedemê jî, qasî saharê bi hêz bû. Mirov dikare rojek li çolê dar hêşîn bike, heta dikare li çolê pez xweyî bike, lê ti car derfeta desthilatdariya li ser bayê çenedibû.

- Tu nikarî bibî mîna min, bayê ji xort re got. Taybetiyên me cûda ne.

- Rast nîn e. Gava ez bi te re li cihanê geriyam, ez fêrê sîmyayê bûm. Ba û sahar, umman û stêrk hene li min, di Gerdûnê de çi hatibe xuliqandin di min de hene. Heman destê em çekirin û em xwediyê heman ruh in. Ez dixwezim bibim yekî mîna te, dixwezim li her tiştî nifûz bikim, deryayan derbas bibim, qûmên ser xezîna xwe rabikim û dengê hezkiriya xwe bînim cem xwe.

Min roja bihurî, axaftina te û Sîmyagerî bîhîst. Wî digot, Menkîba Şexsî ya her tiştî heye. Mirov nikarin xwe veguherînin bayê.

- Bo demekê, bagerbûnê fêrê min bike, xort got û jê rica kir. Em bikaribin derfetên bê dawî yê mirov û bageran qisebikin.

Ba pir bi mereq bû û ev yek jî, tişteki, ku wî nedizani bû. Dixwest di vî derbarî de bipeyîvin, lê wî nedizani bû ku mirovek çawa veguherîne bayê. Lê wî di sa ji gelek tişt dizani bûn. Wî sahar avadikirin, gemî binav dikirin, daristan bi ser û bin dikirin û ew bi mûzîkên cûrbe cûr,

bi deng û gurînên tuhaf li bajaran digeriya. Bawer dikir, hêza xwe bê hidût e. Û niha xorteki hatibû ber wî û ji wî re dixwest bide îspat kirin, ku ew dikare tiştên din jî bike.

- Ji vê re dibêjin Eşq, xort got, gava ku wî dît, bayê hema hema li ser qebûlkirina daxweza wî ye.

Gava me hezkir, em dibin parçeyek ji Gerdûnê. Gava me hezkir, pêwîstiya me ya bi fêmkirina bûyeran namîne, ji ber ku wê çaxê, bûyer di hindurê me de diqewimin û mirov dikarin xwe veguherînin bayê. Bê guman bi şertekî; divê ba alikariya wan bike.

Ba pir bi xurur bû. Gotinên xort, ew bezand û fitkir. Qûmên çolê bi hêzeke mezin rakir hewa û dest bi bagerîne kir. Her çi qasî li hemû dunyayê geriyabe jî, di dawiyê de mecbûr ma û qebûl kir, ku wî nedikarî mirov vebiguherîne û bike ba. Wî, eşq jî nedinasî.

- Gava ez di cihanê de digeriyam, min seh dikir, gelek mirov li asîmanê mêzedikin û behsa eşqê dikin, bayê gote wî; bi hêrs bû, ji ber ku wî rastiya hebûna sînorên xwe qebûl kiribû. Belkî jî, ya herî rast, pirsîyar kirina ji asîmanê bû.

- Madem wisa ye, alikariya min bike, xort gote wî û jê rica kir. Ji bo ku ez hê kor nebûme, bikaribim li rojê binihêrim, der û dor bi tozê ve tarî bike.

Li ser vê yekê bayê bi hêztir dest bi bagerîne kir û asîman bi qûmê ve hat sergirtin. Di dewsa rojê de bes qurseke zêrîn hebû.

Li ordîgehê çi dibe çi nabe, fêmkirina vê yekê êdî pir dijiwar dibû. Mirovên çolê ev ba nasdikirin; jê re digotin bayê semûrê, û ew jî bagerên deryan jî xirabtir bû, lê wan qet derya jî nedizanîn çi ye. Hesp dihiriyan û sîleh di binê qûmên saharê de diman.

Li ser zinaran, zabîtekî vegeriya serok û ji wî re got:

- Ew qas bes be, dê baştir be.

Ji niha de nedikarin êdî xortî bibînin. Rûyên wan bi temamî, bi pêçeyên hêşîn hatibû girtin û di çavên wan de bes îfadeya tirsê hebû.

- Em vî karî bidin sekinandin, zabîtekî got, bi îsrar bû.

- Ez dixwezim mezintiya Xwedayî bibînim, serokî got, di dengê wî de rêzgirtin hebû. Ez dixwezim bibînim, mirov çawa xwe diguherîne bayê.

Lê navên van herdu tirsonekan di serê xwe de nivîsî. Bi birîna bagerê ve, wî ew herdu jî, ji erkên xwe bidiyaba vekişandin. Ji ber ku mirovên çolê, tirs çî ye, nedizani.

Bayê gote min, ku roj Eşqê dizane, xort ji rojê re got. Tu Eşqê dizanî. Tu niha Rûhê Gerdûnê jî dizanî, ji ber ku ew ji Eşqê hatiye çekirin.

Roj jî, ji wî rev got:

- Ji cîhê xwe dikarim Rûhê Gerdûnê bibînim. Ew bi rûhê min re di têkelîyê de ye û em herdu bi hev re nebat mezin dikin û miyên, ku xwe re sî digerîn, dimeşînin. Ji cîhê xwe yê ku ez lê sekinîme, (û ez gelek dûrê cîhanê me) fêrê evîne bûme. Û ez dizanim, eger ez hinek dîsa nêzîkî cîhanê bibim, her tiştên li ser rûyê cîhanê dê tune bibin, dê Rûhê Gerdûnê jî pê re tune bibe. Ji ber vê yekê jî, em bes li hev temaşe dikin û ev yek jî têra me dike û em ji hevûdu hez dikin. Ez jiyanê û germê didime wê, ew jî sedema jiyanê dide min.

- Tu dizanî eşq çî ye, xort gotina xwe dubare kir.

- Û ez Rûhê Gerdûnê dinasim, ji ber ku di rêwîtiya xwe ya bê dawî ya di Gerdûnê de, min û wê dûr û dirêj peyîvî. Wê gote min, heta niha pirsgerêka herî mezin ev

e; bi tenê maden û nebat fêmkirine, ku her tişt yek û tek tişt e. Û ji bilî vê yekê jî, ne hewce ye, ku hesin li baxirê, baxir jî li zêrê bişive: Her tişt di nava tiştê rastî de erka xwe ya esasî bi cih tîne û eger Destê, ku her tişt nivîsîne, di roja pêncemîn de bisekinîba, her tişt wek Hevhatineke Aştiyê mabûba. (*)

- Lê roja şeşemîn hebû.

- Tu zanayek î, ji ber ku tu her tiştî ji dûraniyekê dibînî, xort got. Lê tu Eşqê nas nakî. Eger roja şeşemîn nebûya, mirov dê nehatiba afirandin; baxir her dem wek baxir, qirşûn jî daîm wek qirşûn bimaba. Menkiba Şexsî ya her kesek a xwe ye, lê Menkiba Şexsî dê rojekê pêk bê. Madem wisa ye, divê mirov li tişteki baştir veguheribe û heta ku Rûhê Gerdûnê bi rastî bû tişteki tek û yek, divê mirov bibe xwedî Menkiba Şexsî yeke nû.

Roj ket nav fikr û ramanan û zêdetir dest bi biriqînê kir. Bayê ev hevdîtî şîrovekiribû, ji bo ku roj çavên xortî kor neke, bi hêzeke mezin dest bi bagerînê kir.

- Ji bo vê jî simya heye, xortî got. Ji bo ku her mirov bila li xezîna xwe bigere û bibîne û piştî jî, bixweze ku jiyana xwe ya kevin baştir be ji ya nû. Qirşûn, heta ku di cihanê de êdî pêwîstiya xwe çênebe, ew ê erka xwe bi cih bîne; û wê çaxê jî, divê ew xwe veguhrîne zerê.

- Sîmyageran dikarin di pêkanîna vê veguherînê de bi ser kevin.

(*) Referansek bo Beşa Tekwîna Tewratê (Bab 1 - Bab 2) dihête kirin. Bi an gor Tewratê, Xwedê (Allah- Rab) di roja şeşemîn de mirov xuliqand. "Û Xwedayî got, em di sûretê xwe de û bi an gor lihevşivîna me mirovan çêbikin; û ew, li ser masiyên deryayan û teyrên asîmanan û dewaran û li ser hemû rûyê erdê û her tiştên li erdê xişdibe, desthilatdariya xwe çêbike.

Gava em hewil didin, ji hebûna xwe zêdetir bibin hebûnek jêhatî rayê me didin, ku her tiştêkî di hawîldora me de ye, baştir e û baştir berdewam dike.

- Baş e, tu ji bo çi dibêji, tu Eşqê nizanî? rojê ji wî pirsîyar kir.

- Ji ber ku eşq, ji sekana bê tevger a wek çolê, ji gerîna cîhanê, û ji temaşekirina te ya ji dûr ve îbaret nîn e.

Eşq, ew hêz e, ku Rûhê Gerdûnê diguherîne û pêş ve dibe. Gava ez cara ewil ketim hindurê wê, min wisa hizir dikir, ew tiştêkî mûkemel e. Lê paşê min dît, ew vegera roniya her tiştên afirandî ye. Min dît ku şer û bengînen wê jî hene. Em Rûhê Gerdûnê dimijînin û ev cîhana ku em li ser wê dijîn, bi an gor xirab an jî baştirbûna me, dê xirabtir an jî baştir be. Eve, hêza eşqê dê li vê derê tevî karê dibe, ji ber ku gava me ji yek hez kir, em dixwezin ji bûna xwe ya eslî ji baştir bin.

- Baş e, tu çi dixwezî ji min? rojê jê pirsî.

- Alikariya min bike, da ez xwe veguherînim bayê, xort bersiva wê da.

- Gerdûn pê dizane, ku ji afirîneran herî zana ez im, rojê gote wî. Lê ez nizamim, te çawa veguherînim bayê.

- Baş e, ma ez divê serî li kî bixim?

Roj hinekî bêdeng bû. Bayê guhdariya wê dikir û zanabûna wê ya bê hidût li cîhanê belav dikir. Li gel vê yekê rojê nedikarî xwe ji vî xortî ku ew bi Zimanê Gerdûnî diaxifî, rizgar bike.

- Bi Destê ku wî her tişt nivîsiye, biaxife.

Bayê, qêrîneke şahî avêt û bi hêzeke mezintirîn bi bager bû. Çadirên berî lezekê li ser qûman hatine daçikandin, ji nişka ve hilweşîyan; heywan jî, ji kap û hevсарên xwe filitin. Mirovên li ser zinaran bi hêzeke

mezin bi hevûdu wisa girtibûn, ku bi bayê re berkaş nebin û neçin.

Li ser vê yekê xort vegeriya ser Destê ku wî her tişt nivîsiye. Û wî hîna devê xwe venekiribû û çî tişteke negotibû, yekser sehkîr, ku Gerdûn bê deng dibe û wê daîm ji wisa bimîne.

Ji dilê wî, coşeke evînî pişkivî û dest bi girînê kir. Wî heta niha dûayek wisa nekiribû, ji ber ku ev yek bergerîneke bê peyîv bû û wî qet tişteke ji nedixwest. Wî şûkir nedikir ji bo ku ji miyên xwe re cihekî çêrê dîtiye; wî bergerînan nedikir ku hinek pirtir krîstalan bifroşe; wî daxwez nedikir ku jinka heskiriya wî, bila li benda wî raweste. Wî fêhmî dikir, di vê bêdengîya çêbûyî de sahar, bager û roj jî, li îşaretên ku ji aliyê Destê hatiye nivîsandin digerin û ew dixwezîna rêyên xwe bişopînin û tiştî ku li ser parçê zûmrûdê hatiye bi xetkîrin, fêhmî bikin. Wî dizanîbû, ev îşaretîna li ser Rûyêerdê û Asîmanê belav bûne û di xûyanîyê de qet sedemeke hebûn û wateyeke wan tune; wî dizanîbû, ne saharan, ne bageran, ne rojan û ne jî mirovan nedizanîn, ku ew ji bo çî hatine afirandin. Lê ji bo van tiştan sedemeke wî Destî hebû û bi tenê wî dikarîbû ev mûcîzeyan bide xûyakîrin, bi tenê wî dikarîbû, çolê bike behîr, mirov jî bike ba. Ji ber ku bi tenê wî destî dizanîbû, ku îradeyeke evrayî, di roja şeşemîna afirandina cîhanê de Gerdûn veguhertiye û kiriye Avahiya Mezin û ew biriye wê qonaxê.

Û xort, di nav Rûhê Gerdûnê de ponijî û ma û wî dît, Rûhê Gerdûnê parçeyek ji Rûhê Xwedayî ye û wî dît, Rûhê Xwedayî rûhê wî ye jî.

Bayekî wisa hat, bayekî wisa bi hêz; heta wê rojê qet tişteke wisa çênebûbû. Bi salan, bi sedsalan Ereban qala vê efsana xortî kirin, ku wî çawa xwe veguhertiye bayê û

ordîgeha, ku ji aliyê serokê şervan ê herî mezinê çolê tê parastin, çawa ew maye ku ser û bin bibe.

Gava ku êdî ba sekinî, hemûyan çavên xwe berev xortî vegerandin. Xort di cîhê xwe de nebû, li serê wî aliyê ordîgehê de nobedarekî hebû û ji serî heta neynûkan di nava qûmê de mabû, eve, xort li cem wî nobedarî bû.

Zilamên wê derê ji efsûnayeti pir tirsîyabûn. Li gel vê yekê, du kes hebûn, ku gîrnijînan dikirin. Yê yekemîn Sîmyager bû, ji ber ku wî tîlmîzê xwe yê rastî dîtibû; yê dûyemîn jî serokê serbilind bû, ji ber ku wî tîlmîzî, serbilindiya Xwedayî tê gîhîştibû.

Sibetirê, serok xatirê xwe ji Sîmyager û ji xort xwest û grûbeke parastinê da wan, ku ew heta dawîya rêwitiya Sîmyager û xort, bi wan re rêfaqet bikin.

BI HEMÛ ROJ MEŞIYAN. BER BI ÊVARÊ, XWE gîhandin menastireke Kiptî (*). Sîmyagerî, grûba parastinê para şand û ji hespê xwe piyabû.

- Ji vê û şûnde tu ê bi tenê biçî, got. Rêyeke sê saetî maye bo pîramîdan.

- Şûkran, xort gote wî. We Zimanê Gerdûnê fêrê min kir.

- Te ji mêj de ev yek dizanîbû, lê min anî bira te, ji bilî vê yekê min çî tiştek nekir.

Sîmyagerî li deriyê menastirê xist. Kêşeyekî, cilên reş li xwe kirî derî ji wan re vekir. Sîmyager û kêşe di nav xwe de bi zimanê Kiptî qisekirin û paşê, Sîmyagerî xort hilda hindur.

- Min ji wî daxwez kir, bila mitbaxê xwe bo demekê bide min, ku ez bikar bînim.

Bi hev re ketin nav mitbaxê menastirê. Sîmyagerî agir vêxist, kêşe ji wî re hinek qirşûn anî. Sîmyagerî, qirşûn di nav qabek hesin de heland.

(*) Kipt an jî Kiptî: Gelê Misrê Kevin; xiristiyanên Misrî yên bi girêdayiya dêra monofîzîst; Piştî dagirkirina Misrê ji aliyê Ereban (641) ji ber ku gelek mirovên jî Kiptî vegeyriyan ser dinê bisilmantiyê, ev peyiv bes ji bo xirîstiyaniyan hat bi kar anîn. (Wer.)

(**) (Gîzeh, Guîzeh, Gîza): Cîheki ji Kahîrê heşt kilomêtir wê de, ku sê pîramîdên girîng (Keops, Kefren, Mîkerînos) û Sfenks li wê derê ne. Niha bi Kahîrê re bûye yek û nifûsa xwe jî milyonek e. (Wer.)

Gava qirşûn bi tevayî heliya, hêka xwe ya zer û ecêb ji çentê xwe derxist. Wî, qetmanek bi qasî sitûra porekî jê kola û ev di nav mûma hingivê de pêça û paşê jî, avêt nav sihana, ku tê de qirşûna heliyayî heye. Tiştê tevlihevkerî, rengêkî xwînê hilda. Li ser vê yekê, Sîmyagerî, qab ji ser agir hilda û ew hîşt li benda sarbûnê. Di vê navberê de bi kêşe re dest bi axaftina li ser şerên qebilayan kir.

- Ev şerê hanê dê berdewam bike, kêşe got.

Kêşe pir bi hêrs bû. Karwanên ku li benda bi dawîbûna şerê de bûn, ev demeke dirêj e, li Al- Jizahê çikiyabûn û mabûn.

- Lê, tiştî ku Xwedayî gotiye dibe, kêşe got.

Sîmyagerî;

- Amîn, got û ew bersivdand.

Gava preparat sarbû, kêşe û xort, heyran bi heyran lê mêze kirin: Maden, di nav çeperên hindurî ên sihana hesin de hişk bûbû, lê ew êdî ne qirşûn bû. Ew bûbû zêr.

- Gelo rojek ez ê ji bikaribim çêkirina vî tiştî fêr bibim an na? xortî jê pirsîyar kir.

- Ev Menkîba Şexsî ya min e, ne ya te ye, Sîmyagerî got û ew bersivdand; lê min dixwest rayê te bidim, ku ev yek mimkûn e.

Disa vegeriyan û hatin ber derê menastirê. Sîmyagerî, li wê derê kurs kire çar parçe.

- Ev ê we ye, got û parçeyek ji wan da kêşeyî. Li gel comerdiya we ya ji bo gerokan.

- Ev diyariya sipasiyeke wisa ye, ku, ji comerdiya min pir wê de ye, kêşe gote wî.

- Wisa nebêjin. Jiyan dikare we bibîhîse û di doreke din de jê kêmtir bide we.

Piştire, Sîmyager hat cem gencî.

- Ev jî bo te. Li gel zêra, ku di destê serokê şervanan de ma.

Xort ji wî re bigota ku ev zêrê hanê ji yê xwe yê berî pirtir e; peyvên wî yên ji bo kêşeyî gotî anî bîra xwe û negot.

- Ev jî bo min, Sîmyagerî got. Ez divê ji çolê derbas bim û vegerim herim; û şerê qebîleyan jî hê berdewam e.

Sîmyagerî, parçê çaremîn jî da kêşeyî.

- Ev jî bo zarok. Gava pêdiviya xwe pê çêbû...

- Lê ez ê li xezîna xwe bigerim, xort got. Gelek nêzikî wê bûme.

- Ez bawer im, tu ê bibînî, Sîmyagerî got.

- Baş e, hûn parçê dûyemîn bo çi didin?

- Ji ber ku te di dema rêwitiya xwe de du caran perên xwe winda kirin: Carek diz, carek jî, serokê şervanan perê te sitandin. Ez, Erebeke bawermend û pîr im, ku baweriya min bi gotinên bav û kalên welatê min heye: "Tişteke bûyî, ti car dubare nabe. Ema we lakîn, tiştî ku dubare bûyî, yeqîn, sêyemîn car jî çêdibe."

Li hespên xwe sêwarbûn.

- Di derbarê xewnan de ez dixwezim tişteke bêjime te, Sîmyagerî got.

Xort, hespê xwe nêzikî kir.

- Di Roma Kevin de, di dema Împîrator Tiberiûsî de miroveke pîr dûrist û dilpak dijîbûye, du kurên vî mirovî hebûye. Yek ji kurên wî hildane leşkeriyê û ew şandine cîhekî li eyaletên herî dûr ên Împîratoriyê. Kurê din hozan bûye û helbestên wî yên xweşik, hemû Roma xistiye bin tesîra xwe ya efsûnî.

Bavê, şevê, xewnek dîtiye. Ferîşteyek hatiye û li ber çavên wî diyar bûye û ji wî re gotiye; "kurekî te dê wisa bi nav û deng bibe ku, di pêşerojê de û di hemû

cîhanê de ew ê bihête dûbare kirin." Ji ber ku jiyane, comerdiyeke mezin ji wî re kiriye û hin tiştên, ku hemû bavan pê bi rûmet dibin û dilê wan bi şahî tijî dibe, zahirê wî kiriye, pêremêr di nav hêsrên şabûnê de hişiyar bûye.

Piştî demeke kin, ev pêremêr, gava wî hewil daye, ku zarokek ji binê têkerên erebeyek rizgar bike, bi xwe miriye. Ji ber ku ew di hemû jiyana xwe de bi dirûstî û rûmetî tevgeriyaye, yekser çûye bihiştê û li wir jî, rastê wê ferîşteyê, ku ketibû xewna wî, hatiye.

"Tu mirovekî baş bû," ferîşteyê ji wî re gotiye. "Tu di nav evîne de jiyayî û bi rûmetî jî mirî. Îro ez dikarim hema her daxwezeke te bi cîh binim."

"Jiyane pir başî bi min kir," pêremêrî gotiye wê. "Gava tu ketî xewna min, min fêmkir, ku hemû hewildanên min hatine pejirandin. Ji ber ku helbestên kurê min wê di sedsalên pêşerojê de û di hefiza mirovan de bimîne. Ji bo xwe çi daxwezeke min nîn e; lê bavekî, ji ber bi navûdengbûna ewladên xwe bi rûmet dibe. Ew ewladên ku di zarotiya wan de li wan dinihêre, di genciya wan de wan perwerde dike. Di pêşeroja dûr de min dixwest dengê kurê xwe bibihîsim."

Ferîşte, destê xwe bi hêdîka li ser milê pêremêrî xistiye û herdu pêk ve çûne pêşeroja dûr. Meydaneke bê serî û bê bînî ketiye ber wan û di vê meydana de mirov bi zîmanekî ecêb diaxifibûne.

Pêremêr ji ber şabûnê dest bi girîne kiriye.

"Min dizanîbû helbestên kurê min pir xweş in û nemir in." gotiye ji ferîşteyê re. "Gelo ev mirovna kîjan helbestên kurê min dixwînin, ma hûn dikarin bêjine min?"

Ferîşte, li ser vê yekê, bi kûbarî nêzikî wî bûye û bi hev re, li ser yek ji textên li meydanê rûniştine.

"Helbestên kurê te yê hozanvan li Romayê ji aliyê gel pir dihat hezkirin," ferîşteyê gotiye. "Her kes ev helbest dixwendin û jê hezeke mezin werdigirtin. Lê piştî dema Tîberîûsê ev helbestna hemû hatin ji bîr kirin. Ev gotinên ku li meydanê ji aliyê gel dihête gotin û dubare kirin, peyvên kurê te yê din, yên wî leşkerî ne."

Pîremêrî, bi heyîrîneke mezin li ferîştê nihêriye.

"Kurê te ji bo bi cîh anîna erka leşkeriyê çûbû cîhekî pir dûr û li wê derê bûbû sîtvan. Ew ji kesekî pir dirûst û dilpak bû. Êvarekê, yek ji xizmetkarên wî nexweş ket û hat ber halê mirinê. Kurê te di wê demê de behsa xaxamekî ku nexweşan sax dike bihistiye û bi rojan li wî geriyaye. Gava li welat geriyaye, hînbûye ku ew kes kurê Xwedayî ye. Rastê însanên dinbûyî jî hatiye, ku ew ji aliyê wî xaxamî hatine sax kirin. Û ji wan, fikrên wî fêrbûye û wek sîtvanekî Romî, dinê wî pejirandiye. Di dawiyê de rojekê ew hatiye cem wî Xaxamî.

"Ji wî re gotiye, yek ji xizmetkarên xwe nexweş ketiye. Û Xaxamê jî, jê re gotiye, ew amade ye bi wî re biçe mala wî. Lê ji ber ku sîtvan jî xwedî baweriyekê ye, gava mirovên li der û dor rabûne piya û ew jî li hindurê çavên xaxamê nihêriye, teze têgîhiştiye ku ew niha li ber hûzûra kurê Xwedayî de ye.

"Ev gotin yên kurê te ne," ferîştê ji pîremêrî re gotiye. Gotinên ku wî di wê demê de ji Xaxamê re gotiye û êdî ti car nehatine jîbîrkirin: Ya Rab, qiymeteke min tune ye, ku ez bikevim binê bariyê, lê tu peyvek bêje, xizmetkarê min sax dibe."(*)

(*) Încil, Matta, 8:8. (Wer.)

Simyager, hespê xwe bezand.

- Kî çi dibe bila bibe, got, di rûyê erdê de her însan, her dem, di diroka cîhanê de rola sereke dilîze. Û gelek tabîî ye, ku ew kes vê yekê nezanîbe.

Xort bi gîrnijîn bû. Qet nefikirîbû, ku jîyan ji bo şivanekî ew qas girîng be.

- Xatirê te, got Simyager.

- Xatirê te, xort jî bersiva wî da.

Institut kurde de Paris

BI HEWILDANEKE MEZIN, KU GOTINÊN DILÊ XWE
têbigihîje, qasî du saet û nîv li çolê meşiya. Dilê wî ji wî
re bigota, da cîhê xezîna wî li kû derê ye.

"Xezîna te li kû derê be, dê dilê te ji li wir be,"
Sîmyager ji wî re gotibû.

Lê dilê wî behsa tiştan dikir û disekinî. Dilê wî bi
xûrûr û bi rûmet, behsa çîroka wî şivanî dikir; ku ew bi
carekê ve ketiye şopa xewna xwe û ji ber vê yekê jî, ji
miyên xwe qetiyaye. Dilê wî behsa Menkîba Şexsî dikir,
behsa însanan dikir; ku wan daîm eynî tişt kiribûn, ji bo
lêgerîna axên dûr û jinên cûda bi rêyan ketibûn, bi
mirovên çaxa xwe ve ketibûn nav nakokiyên dûr û dirêj
û bi pêşinhukmên xwe re şer kiribûn. Dilê wî di hemû rê
de ji wî re behsa îcadên nû, pirtûkan û qeremolîyan
dikir.

Gava wî xwe amede dikir, ku hilkişê ser girdên ji
qûmê, tam di wê demê de dilê wî li ber guhê wî
pispisand. "Bala xwe bide ser cîhê tu lê digrî; ji ber ku ez
li wê derê me û xezîna te ji li wê derê ye."

Hêdî hêdî dest bi hilkişîna saharê kir. Asîmanê bi
stêrkan ve tijî, ji nû ve, bi şewqa hîvê ve ronî bûbû. Ev
mehek e, wî bi tevî vî Sîmyagerî rêwîtî dikir. Roniya
hîvê, girdên saharê jî bi ronî dikirin; ronî, listikeke siyê
çêdikir û sahar dikir mîna behreke bi pêl; bi vê yekê ve
xort ew roj anî bîra xwe; ew roja, ku xort, hevsarên hespê
xwe berdabû û li îşareta, ku ew li bendê ye dabûyê wî.

Ronahîvê, bêdengiya saharê dibêçiya û rêya kesên li xezîna xwe digerin, bi ronî dikir.

Piştî çend lezek, gava wî xwe gîhand ser serê girdê, dilê wî kire gurm. Pîramîdên, ku bi ronahîvê û sipehiya saharê bi ronî bûbûn, bi hemû mûhteşemiya xwe ve li hember wî bilind dibûn.

Ket ser çokan û giriya. Şikur dikir ji Xwedayî re ku ew baweriya xwe bi Menkîba Şexsî ya xwe anîbû, rojek rastê keyserê, pişt re jî rastê tûcarî, rastê Îngilîzekî û Sîmyagerekî hatibû. Ji hemûyan jî girîngtir, wî dîsa şikur li Xwedayî dikir ji bo ku ew rastê jineke saharê hatiye û ji wê fêrbûye, ku ti car Eşq, mêrekî ji Menkîba Şexsî ya xwe dûr naxîne.

Sedsalên bihurî yên Pîramîdan, li jêr, li mirovên ku li ber pêçiyên wan in, temaşe dikirin. Eger wî bixwestiba, dikaribû vegere Wehayê û bi Fatimayê re bizewice û wek şivanekî ihtiyadî jiyana xwe berdewam bike. Ji ber ku Sîmyager her çend Zimanê Gerdûnê dizanibû û dikaribû qirşûnê veguherîne zêrê, dîsa jî li çolê dijiya. Wî mecbûr nebû ilm û hûnerên xwe li ber kesên din bide îsbat kirin. Gava ew ber bi Menkîba Şexsî ya xwe dimeşiya, fêrê her tiştên pêwîst bûbû û her tiştên, ku wî xeyal kirî, jiyabû.

Lê niha xwe gîhandibû xezîna xwe û ev destpêk, bi tenê gava wî xwe gîhand armanca xwe, bi dawî dibû. Li ser serê qûmên girdê gîriyabû. Li erdê mêzekir, li cîhê hêsrênçavê wî dilopkirî, bocikek rêxî digeriya. Di dema ew li saharê dijiya de, wî fêrbûbû, bocikên rêxî li Misrê wek rimzên Xwedayî dihêtin hesibandin.

Ev jî îşaretek bû. Ser vê yekê, Tûcarê Bîlûriyê anî bîra xwe û dest bi kolandina qûmê kir: Mirov bi hemû umrê

xwe keviran dayne ser hevûdu, dîsa jî çi kesek nîkare di baxçê xwe de pîramîdek avabike.

Bi hemû şev kolana cîhê diyarkirî berdewam kir, lê wî çi tiştek nedît. Sedsalan, ji ser jora Pîramîdan de li wî temaşe dikirin. Lê wî dev jê bernedida. Dikola, wî dikola û bayê jî dîsa qûmên wî kolayî, tijî çalê dikir, lê wî dîsa jî, li hember bayê ditêkoşiya û bêsekan dikola. Milên wî qerimûbûn, di lepên wî de birîn vebûbûn, lê baweriya dilê wî her berdewam bû. Û dilê wî ji wî re digot, cîhî ku hêsrênçavên te lê dilopkirî, bikole.

Gawa wî hewil dida ku çend keviran ji cîhê xwe bileqîne, ji nişka ve dengên lingan bihîst. Çend mirov hatibûn. Ji ber ku roniya hîvê ji para lêdixist, wî nedikarî rûyên wan jî, çavên wan jî bibîne.

- Tu li wê derê çi dikî? got û pîrsî yekî ji wan.

Xort bersiv neda. Lê tirsîyabû. Divê niha ji nav axê xezîneyek derketiba, ji ber vê tirsîyabû.

- Em penaberên şerê ne, got yekî din. Divê em bizanibin, ku te li wê derê çi veşartîye. Me pere divê.

- Ez tiştekî venaşêrim, xort ji wan re got.

Lê yekî ji van mêrikan hat, bi milê wî girt û ew ji çalê derxist. Yekî din jî lêgeriya. Li dawiyê, di bêrikên wî de parçekî zêr dît.

- Zêrê wî heye, got yekî ji hêrişkaran.

Roniya hîvê, rûyê kesê ku li ser wî lêgerîn dike bi ronî kir û xort di van çavan de mirin dît.

- Wî niha gelek zêr ji li axê veşartîne, got yekî din.

Li ser vê yekê, zorê dane wî, ku bila axê vekolîne. Di dawiyê de qet tiştekî nedît û ji ber vê hindê jî dest bi lêdana xortî kirin. Ta ku roniyên ewil ên rojê xûyabû, wisa dûr û dirêj li xortî xistin, ew peritandin. Cil û

bergên wî gincî gincî bûbûn, wî nêzîkbûna mirinê hîs dikir.

“Gava tu bimrî, pere dê çi bi te bike? Kêm hatiye dîtîn, ku pere jiyana mirov rizgar bike!” Sîmyager ji wî re wisa gotibû.

Devê wî bi gurmikên hêrişkaran werimîbû, peritîbû; bi vî devî ve ji wan re got, ew du caran di xewna xwe de xezîna li kêleka Pîramîdan dîtine.

Yekî, ku mirov jê seh dike ew serokên wan e, dirêj dirêj fikirî. Paşê bi zilamekî xwe re axifi:

- Hûn dikarin vî merivî berdin. Tişteki xwe yê din tune. Xweda dizane, wî ev zêr ji cîhekî dizîye.

Xort li ser rûyê xwe ve li qûmê dirêj bûbû. Serokê rêbiran li hevalên xwe dinihêrî. Lê çavên xortî ber bi aliyên Pîramîdan dinihêrîn.

- De em herin, serokê rêbiran ji hevalên xwe re got.

Piştî vegeriya ser xortî:

- Tu ê nemirî, got. Tu ê bijî û fêrî bikî, çi mafê mirovek nîn e, ku ew qas bêfamî bike. Li cîhê te yê ku tu niha li wê derê yî, berî du salan min jî du xewin ser hevûdu dîtîbûn. Min di xewnên xwe de dît; divê ez herim Îspanyê û lêgerînekê bikim li dereke gundî ya hilweşiyayî, ku tê de eşyayên ayînê hatine danîn û şivan jî, bi tevî miyên xwe li wê derê radikevin û li ber derê wê jî dara firawinhêcîreke mezin hebûye; û min di xewna xwe de dît; eger ez binê wê firawinhêcîrê bikolim, ez ê tê de xezîneyeke veşartî bibînim. Lê ez ew qas bêhiş nîn im, bes ji bo ku min di xewna xwe de eynî tişt du car dîtine, rabim û herim saharê derbas bim.

Paşê meşîya û çû.

Xortî, bi dijarî xwe serrast kir û careke din ber bi aliyê Pîramîdan mêze kir. Pîramîd jî, girmijînên xwe

şandin ji wî re û dilê wî bi şaheyekê ve tiji bû; ew jî, ji wan re gîrnijînên xwe şand.

Wî xezîna xwe dîtibû.

Institut kurde de Paris

Peyvapaş

NAVÊ XORTÎ SANTIAGO BÛ. GAVA KU DIBÛ ÊVAR, hat ber dêreke biçûk û terikandî. Li cihî ku eşyayên ayîné li wê dihate danîn, hîna jî firawinhêçîreke terikî hebû û ji navbera baniya rûxiyayî, stêr hîna jî dihatin dîtin. Wî anî bira xwe ku, di wextekê de, bi tevî miyên xwe hatibû vê derê û ji derveyê xewindîtina xwe, şeveke sakîn derbas kiribû.

Lê niha li cem wî miyên wî tunebûn. Lê di destê wî de bêrek hebû.

Demeke dirêj, li asîmanê mêzekir. Paşê ji heqîba xwe şûşeya şeravê derxist û şerav vexwar. Hat bira wî, ku wî û Sîmyager li çolê li stêrkan nihêribûn û pêk ve şerav vexwaribûn. Wî kûr kûr difikirî; ew jî rêyên çawa ecêb derbas bûbû û Xwedayî jî, ji bo ku cihê xezîne rayê wî bide, rêgeheke çawa ecêb hîlbijartî bû. Eger wî baweriya xwe bi xewnên xwe yên ku du caran ser hev dîtibûn neanîba; rastê Mirtibê, keyserê û dizê nehatiba... "Bi rastî listeyeke dirêj; lê di hemû rê de îşaret hebûn û xweşaşkirina min ne mûmkûn bû," got xwe bi xwe.

Bê hemdê xwe bi xew re çû. Gava hişiyarbû, roj bilind bûbû. Bi yekser dest bi kolana binê dara firawinhêçîrê kir. "Efsûnkarê pîremêr," got xwe bi xwe, "te her tişt jî dizanîbûn. Ji bo ku ez vegerim vê dêra hanê, te hinek zêr jî li vir hîştin." Keşîşê, gava dît, ku ez di nav kincên diriyayî de vegeyame, dest bi kenê kir. "Ma te nîkarîbû ez ji van teksîr bikirama?"

Wi bîhîst, ku bayê bersiva wî da: "Na. Eger min ev yek ji te re bigota, te ê Pîramîdan nedîtîbana. Pîramîd pir cîwan bûn, ma ne wisa?"

Dengê Sîmyagerî bû ev. Hinek bi kenok bû û paşê dest bi kolanê kir. Piştî nûv saetê, bêr li tişteki hişk qelibî. Piştî saetek, sendûqek li pêşiya wî bû û tê de jî, pereyên zêr ên Îspanîya kevin tijî bû. Ji bilî van, kevirên bi qiymet, pûtên, ku bi kevirên bi qiymet û pirlantî hatine nexşandin hebûn. Bermayînen fetihkirineke ku demeke dirêj e welat êdî ew neînaye bîra xwe û ji bir kiriye, behsa wê ji zarok û neviyên fatihê bike.

Ji heqîba xwe, Urîm û Tummîmî derxist. Kevir bes carek hatibûn bi kar anîn, sibeyekê, li sûkekê... Di jiyan û rêyên wî de gelek îşaret hebûn.

Wî, Urîm û Tummîm xistin nav sendûqa zêran. Ji ber ku ev kevir bîranîna keyserê pîremêr in, ku ew ê jî, ti car êdî wî nebîne, ev herdu kevir, parçeyek ji xezîna wî bûn.

"Bi rastî jî, jiyan pir comerd e li gel kesên, ku ew Menkiba xwe ya Şexsî dijîn," got di hindurê xwe de.

Û paşê anî bîra xwe ku divê ew biçe Tarîfayê û ji vê xezînê, parek ji dehî bide wê jinika Mirtîb. "Mirtîb çawa jî qurnaz in," got xwe bi xwe. Belkî jî pir rêwîti dîkin, ji ber vê ye."

Paşê bayê dest pê kir. Bayê Rojhilatê ji Afrikî dihat. Ne bêhna çolê îbabû, ne jî tehdita îstîlakirina Maxrîbiyan...

Di şûna wî de, bêhneke pir bi nas û miremîra maçînekê, ku bi hêdîka hatibû û li ser lêvên wî ketibû, dianî.

Kenokiya. Keça ezeb cara ewil tişteki wisa dîkir.

- Ez tîm Fatîma, got. Ez tîm.

Institut kurde de Paris



Paulo Coelho

SÎMYAGER

Roman

Paulo Coelho di wêjeya cîhana îroyîn de êdî wek navekî klasîk di navbera rêzên nivîskarên mezin de cîhê xwe girtiye. Û bi rastî jî ev bicîhbûn mafê wî ye. Ji ber ku di dîroka wêjeya cîhanê de ta nîha çî kesek di dema xwe ya jiyane de ew qas bi nav û deng nebûye, ew qas nehatiye xwendin.

Di vê yekê de gelek bandûrên cûrbecûr hene, lê bandura herî mezin ya Coelhoyî bi xwe ye. Dengê wî yê razî, efsûnî, nerm û kûr; mijarên wî yên jiyانبij, balkêş û cazîb û hevrisîna wî ya fîlozofî, fazîletî, hûnerî û exlaqî yekser li hev dicivin û dibin navendekî bi bandur di giyanê mirov de.

Ma kî dikare îdia bike, ku di romannivîsîne de ev taybetiya mirov nakin xwedî destanên bê dawî?

Edîtor

Institut Kurde de Paris



IKPLIV105677

ISBN: 3-937716-03-3